







Dîwan





MELAYÊ CIZÎRÎ
Dîwan

Transkrîpsiyon
ARIF ZÊREVAN

Aras
Hewlêr
2007

Melayê Cizîrî: Dîwan

Weşanxane: Aras
Şeqamî Gulan
Hewlêr – Kurdistan

Çapxane: Aras

www.nefel.com
info@nefel.com

© Arif Zêrevan

Çapa yekê: 2007

Çapa dijîtal: 2004




Grafika pirtûkê: Nefel




Ev çapa »Dîwana« Melayê Cizîrî
bi hevkarîya Nefelê û Arasê hatiye amade kirin.

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

*Ji bo hersê milyaketên min
Lara, Lava û Bînahiya çehvan*
Arif Zêrevan





Nêverok

Pêşgotin13

Bab A (elîf)

1. Newaya muṭrib û çengê25
2. Ismê te ye mektûb-i di dîwanê qîdem da28
3. Meşşateyê ḥusna ezel29
4. Muḫbeçeyên meyfiroş31
5. Çîn çîn kirin zulfên siya33
6. Dilber şikêna şekerek35
7. Bi narê firqetê şohtim36
8. Serê zulfa te bi kullabê du'a43

Bab B (bê)

9. Destê qudret ko hilavêt ji bejna te niqab44
10. Li-Ilahi l-ḥemd ji yarê me di dest cam e lebaleb46
11. Şah bi qeşda kuştina min rim hejandin bêsebeb47
12. Min di dil kovan hezar in daḫ û keyber bêḥisab49

Bab P (pê)

13. Lew seḫer cewlan didit bayê şebayê rast û çep52

Bab T (tê)

14. Nêrgizên şeng-i di mest in çep û rast54
15. Ger ji wê ḥorîsiriştê îşweyek îzhar-i bit55
16. Qelbê me şubih zêr e ji feyda te cela girt57
17. Meḫbûbê bi dil bit me bi evraz-i çi ḥacet59
18. Kes bi dada me nepirsit gilleh û dad-i çi kit61
19. Ewwel ko yarê da me yek zerreyek îinayet63
20. Er'erxerama bi qedd û qamet65

Bab Ş (şê)

21. ‘Umrê dayî‘ bû me bê dilber ‘ebeş66
 22. Namê ‘enberşikenê bêti ji ‘enber meke beş67
 23. Tu sehergeh bi temaşa were bazarê hudûş69

Bab C (cîm)

24. Şimşad-i xeram û serw-i xennac72
 25. Dil ji ‘ilacê ko bi der ket mizac74
 26. Dîsa ji nû bêhal e dil75

Bab H (hê)

27. Pir meke israfê di qetlê mubaş77
 28. Heyf di qeyda xak û gil bit ‘arifê çalakê rûş79
 29. ‘îşqê ko bidin bi yek du erwaş81

Bab X (xê)

30. Ahê ji derd-i dil dîkî83
 31. Dilberê îro seher86
 32. Heyheya reqş û semaya te çi xweş bestiyê çerx88

Bab D (dal)

33. Sîrrê wehdet ji ezel girtiye hetta bi ebed89
 34. ‘îd e û herkes ji dîdara te lê pîroz e ‘îd91
 35. Neyşekera gerden ji ‘ac93

Bab R (rê)

36. Ah-i ji destê wê sirê dil ji meyê hewale kir95
 37. Derê meyxaneya ‘îşqê seher ‘arif ziyaret kir96
 38. Xelqo li min kin şîretê97

Bab Z (zeyn)

39. Cana ji cemala te muqeddes qebes im ez99
 40. Tor im bi dil û peyrewê Mûsa yim ez101
 41. ‘Aşiq er carek ji bala lê bidit berqa mecaz103
 42. Ji re‘na nêgizên tey mest û xwînîz105
 43. Tu dizanî bi Xudê min tu xiyal îşeb û roz107

Bab S (sîn)

44. Şahidê cilwenuma qudsiyê feyrûzelibas108
 45. Dil yek e dê 'îşq-i yek bit 'aşiqan yek yar-i bes110

Bab Ş (şîn)

46. Îro Mela serapa lew tîk-i bû me ateş112
 47. Şebê qedrê li me rewşen ke tu rûhî were xweş114

Bab Ş (sad)

48. Selwa sehîqed xemmilî115

Bab D (dağ)

49. Şêweyê dilberê bizan sunnet e şêwe 'îşwe ferq117
 50. Me ji bil hûsn û cemalê çî xereq118

Bab T (tê)

51. Dîsa li bedrê katibî119
 52. Xwîn ko ji dil bi mewc-i bêt121
 53. Mey nenoşî şeyxê Şen'anî xelet122

Bab Z (zê)

54. Bê lebê le'lê Mela min ji meya al-i çî hez125

Bab F (fê)

55. Ser didit ab-i kewşerê126
 56. Îro ji şehkasa surê128

Bab Q (qaf)

57. Nazika min di semayê bi ser enguşt-i 'eqîq130
 58. Min dî ji xef -let cam di kef şahê Necef dil kir hedef132

Bab K (kaf)

59. Dilbera min seherê hat-i bi tûx û bi yedek134
 60. Te'ale l-lah zehê hûsna mubarek136
 61. Nazikek min seherê dî bi cemala xwe ne wek137

Bab G (ge)

62. Ko îşaret bi bişaret bidirit nexmeya çeng139

Bab L (lam)

63. Ger bidiya ew şenema surcemîl141
 64. Şahidê qudsînişan husn e ji remza ezel143
 65. Îro ji remza dêmdurê144

Bab M (mîm)

66. Şerbeta lam û beyan ez bi heyatê nadim146
 67. Îd e û da ʿalemê bang-i şefayê xaş û ʿam148
 68. Daneyên ʿenber li nîsrînan reşandin xalê xam149

Bab N (nûn)

69. Ya reb în guldeste-i ya nergisê reʿna esti îb150
 70. Remzên te di canan ne bi endaze dirazin152
 71. Mela me li gerdena dilber ji nû şed bûse mayin deyn154
 72. Min di ber qalû bela başin vi wê ra bû evîn155
 73. Şenemê ji qewsê ebrû du hilalê new numandin156
 74. Xeşmê li feqîran meke zû padişehê min157
 75. Ez nizanim sebebê yarê çira dûr-i kirîn158
 76. Îro ji husna dilberê159
 77. Were canim ko çî nazikweres îb163
 78. Peyweste du ebrû li me mehbûbê kişandin165
 79. Şox û şengê zuhrerengê166

Bab H (hê)

80. Ji remza dilberê dîsa169
 81. Dilberê serdarê xwiban ez nizam agah heye173
 82. Feleka eţlesê sergeşte di cama me hebab e176
 83. Muĥbetê miĥnet di zor in179
 84. Dilberê serdarê xûban188
 85. Turreya tabidarê ʿenber ke196
 86. Gerçî bilbil cewherê zâtê gul e198
 87. Yar-i me pir nîşan û sir sîma ji dur dêm kewkeb e200

Bab W (waw)

88. Me lew fincan li ser dest e ko mehtaba hilal ebrû201
 89. Min dî seher şahê Mecer lebsê di ber mexmûr-i bû203
 90. Di dest da yengiyek nûbar-i min dî ew keman ebrû205
 91. Wey spêde j' Bircê qews ebrû numandin mah-i new206
 92. Hê di ber qalûbelayê belko ev ʿalem nebû207
 93. Kes ned'ye sehergeh ko çi nazikweres î tu209

Bab L (lamelif/eliflam)




94. Îro ji derba xencerê212

Bab Y (yê)

95. Ey şahidê qudsî veke bendê ji niqabê215
 96. Ey şehinşahê muʿezzem heq nighedarê te bî217
 97. Xanê xanan lamiʿê necma te her pîrnûr-i bî220
 98. Remzek ji nesîmê li çemin da û xwişî223
 99. Hêvî û tewqe dikim ez ji xwidana heşemê225
 100. Xema ʿîşqê perêhtim ez227
 101. Bi husna ehşeni t-teqwîm û zahir şoretê zât î231
 102. Ey nesîmê seherê ma di mecala şibehê234
 103. Ey nesîmê şibehê ma di mecala seherê236
 104. Îro ji nû pir ateş im238
 105. Latê husn î û şehê xuban î243
 106. Vê firqetê ebter kirîn245
 107. Der heq me bi şîrê xwe meke teqşîrê249
 108. Mizgîn ji me ra bêt ji surşêrînê251
 109. Ji mabeyna du ebrûyan dibînim qabê qewseynî253
 110. Şebaşu l-xeyri xanê min254
 111. Şenema sur ji şemed şewqê ji heq daye wucûdê258
 112. Şenema sur ji şemed neyşekera leb ji nebat261
 113. Îro mi dî weqtê seher264
 114. Me bi dil nêrgizên xaşşe divên271

Servehî

- Ferhengok277



»Dîwana« Melayê Cizîrî

Mîrê kirmanciya modern mîr Celadet Alî Bedir-Xan ji bo Ehmedê Xanî dibêje ew ne tenê pêxember e, lê belê ew xudankîtêb e jî. Pêxemberê ola kurdan ya nijadî û neteweyî, û xudanê kitêba »Memozînê«. Ev pesnekê payebilind e û kurd »Memozînê« wekî qur'aneka kurdewariyê datînin ber serê xwe.

»Dîwana« Melayê Cizîrî (1570–1640) qur'aneka dî ya kurdan e ko berî »Memozînê« hatiye nivîsandin. Wekî mîrasê edebî yê kurdî heger ko em »Dîwana« Melayê Cizîrî ji nêv lîteratûra kurdî rakin em dê yekser bibînin ko lingên me li hewa dimînin û em dê valahiyeka bêhempa his bikin.

Lewra jî bi rehetî em dikarin bibêjin ko Melayê Cizîrî jî pêxember e, pêxemberê edeb û hinera kurdî û di heman demê de xudankîtêb e jî. »Dîwana« wî qur'aneka edebî û hinerî ye.

Melayê Cizîrî bi nasnavê »Melayê Cizîrî« tête nas kirin. Navê wî yê eslî Ehmed e û wekî Şêx Ehmedê Cizîrî jî têt bi nav kirin. Paşnavê »Cizîrî« li gor devoka xelkê bajarê Cizîrê wekî »Cizerî« têt bi lêv kirin û xelkê Botan jê re dibêjin »Melayê Cizerî«. Celadet Alî Bedir-Xanî jî di kovara xwe »Hawarê« de paşnavê wî wekî »Cizerî« nivîsandiye. Rayeka bêjeyê »cizîr« e û ji ber hindê ez jî navê wî wekî Melayê Cizîrî dinivîsînim.

Melayê Cizîrî di helbestên xwe de nasnavê »Mela« bi tewangên wê yên cida û nasnavê »Nişanî« bi kar aniye. Di hinek helbestan de jî navê xwe yê eslî »Ehmed« bi kar aniye.

Berhema naskirî ya Melayê Cizîrî »Dîwan« e ko bingehê wê ji 114 helbestan pêk têt. Ji bilî »Dîwanê« hinek helbestên Melayê Cizîrî bi »Dîwanê« re hatine belav kirin. Hevdubêja wî digel Feqeyê Teyran û digel mîrê Cizîrê du helbestên dirêj in. Helbesteka dî ya dirêj ko bi rêza »Ellah sehergaha ezel« dest pê dike û çend helbestên dî bi »Dîwanê« re hatine belav kirin û wekî berhemên Melayê Cizîrî têne qebûl kirin.

Transkrîpsiyona nû

Celadet Alî Bedir-Xanî di »Hawarê« de (hjm. 35) bi amadekirina Qedrî Cemîl Paşayî hinek ji »Dîwana« Melayê Cizîrî bi alfabeya latînî belav kir

lê belê ew karê wî nivçe ma. Em dikarin bibêjin heta niho tenê carekê »Dîwana« Melayê Cizîrî hatiye transkrîbe kirin bo alfabeya kurdî ya latînî û ew jî bi amadekirina Mihemed Emîn Narozî û Zeynelabidîn Kayayî sala 1987-ê li Stockholmê derket.

Bi vê transkrîpsiyona nû min xwest, heta ko ji min bêt, bi hevkarîya melayên botî û kesên erebîzan, transkrîpsiyoneka serast bi alfabeya latînî amade bikim da xwendevan gava ko helbestên Melayê Cizîrî dixwînin wan rast fêm bikin yan jî bi kêmayî wan rast bixwînin.

Ji bo rastxwendina »Dîwana« Melayê Cizîrî jî qenaetek bi min re çêbûye ko alfabeyên kurdî yên ko îro hene têra rastnivîsandina »Dîwanê« nakin. Lewra jî min ji bilî herfên normal yên alfabeya kurdî-latînî hinek herfên transkrîpsiyona erebî bi kar anîn. Di bin sernivîseka xweser de ez dê hinekê berfirehtir behsa problemên alfabeyên kurdî bikim.

Min metnê vê transkrîpsiyona nû ya »Dîwanê« li ser bingehe metnê şerha Mele Ehmedê Zivingî yê miftiyê Qamişloyê ava kir. Mele Ehmedê Zivingî sala 1959-ê şerha »Dîwanê« wekî du cildan amade kir û weşand. Xebata Mele Ehmedê Zivingî jî li ser bingehe xebateka berê ya Mele Evdilselamê (Nacî) ji Cizîra Botan ava bûye. Heta hinek kes jî dibêjin es-lê şerhê ya Mele Evdilselamî ye û paşê Mele Ehmedê Zivingî ew bi hinek guhortin û lêzêdekirinan li ser navê xwe çap kiriye.

Celadet Alî Bedir-Xan sala 1941-ê di kovara »Hawarê« de (hjm. 35) behsa destnivîsên Mele Evdilselamî dike û dibêje:

»Nivîsta ko bi min re ye Mele Evdiselam ew di sala 1322ê hicrî de nivîsandiye. Mele Evdiselam cizerî û alimekî zor e. Mele Evdiselam gelek bi dîwana Melê mijûl bûye û zehf nivîst li ber nivîsandine. Ê dibêjin ko Evdiselam qenc jî zane Melê mane bike. Ji lewra nivîstên ko ewî nivîsandine gelek biqîmet û mihteber in.«

Seyda Mele Evdilkerîmê cizîrî, ko niho 76-salî ye û li Cizîrê dimîne, ji min re got di dema xwe de li Cizîrê du kes hebûn ko baş »Dîwana« Melayê Cizîrî fêm dikirin û ew şerh dikirin: Yek ji wan Mele Evdilselam bû û yê dî jî Mele Mehmûdê miftiyê Cizîrê (Mehmûd Bilge) bû. Mele Evdilselamî ji Cizîrê bar kir û çû binxetê û paşê li Qamişloyê bû melayê mizgefta mezin.

Mele Evdilselamê kurê Mele Miradî, ko bi eslê xwe ji gundê Emara yê Midyadê ye, li Cizîrê binecih bû û li Medreseya Sor jî ders dida. Mele Evdilselamî nasnava »Nacî« bi kar dianî û wekî Mele Evdilselamê Nacî jî

dihat nas kirin. Piştî çûna xwe ya binxetê wî çend nisxeyên »Dîwanê« nivîsandine û »Dîwan« hemî şerh jî kiriye.

Kurê Mele Evdilselamî Zeynelabidîn û neviyê wî Izedîn dibêjin Mele Ehmedê Zivingî destnivîsa şerha »Dîwanê« ya ko Mele Evdilselamî nivîsandibû piştî mirina wî (1952) dor 7–8 mehan bir nik xwe da wê amade bike û li ser navê wî bide çap kirin. Zivingî niyet hebû ko sala 1958-ê şerha »Dîwanê« li ser navê xwe belav bike û behsa Mele Evdilselamî jî nedikir. Piştî midaxeleya Zeynelabidînî, Zivingî salekê belavkirina şerhê rawestand lê belê cardî jî sala 1959-ê şerha »Dîwanê« li ser navê xwe belav kir. Zivingî di pêşgotina xwe de jî qet behsa Mele Evdilselamî nake, lê belê di dawiya kitêbê de dibêje ko wî gelekê zehmetî bi vê şerhê ve dîtiye û ti kesê berî wî ev kar nekiriye. Herwiha Zivingî dibêje Mele Evdilselamî di destpêka karê wî de ji bo rastfêmkirina bêjeyên devera Botan arîkariya wî kiriye lê mixabin berî ko Zivingî şerhê tamam bike Mele Evdilselamî mir. Ti delîlên ko Mele Ehmedê Zivingî berî mirina Mele Evdilselamî dest bi şerha »Dîwanê« kiribe nînin. Destnivîsa Mele Evdilselamî ko eslê wê niho li cem neviyê wî Izedînî ye izbat dike ko wî şerhê tamam kiriye. Wisa diyar e ko haya Zivingî ji têbîniya Celadet Alî Bedir-Xanî ya 18 salan berê jî nebû yan jî xwe nebi-hîstî kiriye.

Min jî destnivîsa Mele Evdilselamî ya şerha »Dîwana« Melayê Cizîrî dîtiye. Destnivîsa şerha Mele Evdilselamî û ya ko Mele Ehmedê Zivingî çap kiriye ne tam wekî hev in. Zivingî farisî nedizanî. Wî di ravekên erebî de guhotin û lêzêdekirin çêkiriye û ji aliyê form û niqteşaniyê ve ew edilandiyê. Zivingî bi sernivîsa »Tefşîl ul-me'na« menayên hinek beytan bi erebî nivîsîne. Herçend şerha ko Zivingî amade kiriye li ser ya Mele Evdilselamî hatibe ava kirin mirov cardî jî dikare bibêje ya Zivingî heta dereceyekê berhemeka cida ye ji ber ko guhortinên wî, şerha wî ji ya Mele Evdilselamî bi dûr xistiye û xweseriyeka nû daye wê.

Vêca metnê şerha Mele Ehmedê Zivingî yan jî ya Mele Evdilselamî wekî metnê herî serast yê »Dîwanê« tête hesabandin û Mele Ehmedê Zivingî behsa »çapa Cizîrê« dike ko di eslê xwe de ji 114 helbestan û qesîdeyeka lêzêdekirî »Ya ramiye qelbî« pêk têt. Wisa diyar e ko »Dîwan« wekî kitêb ji 114 helbestan pêk têt lê belê paşê hinek helbestên di jî digel »Dîwanê« wekî servehî hatine belav kirin.

Min pêşiyê metnê »Dîwanê« ji alfabeya erebî transkrîbe kir bo alfabeya

latînî. Paşê jî ez û Selam Niman, mamostayê zimanê erebî, bi hev re careka dî bi ser de çûn û me ew serast kir. Sala 1998-ê jî ez çûm Kurdistanê û min pirsî ka kîjan mela heye ko »Dîwanê« baş fêm bike û bizane serast bixwîne.

Piştî gelek lêpirsînan min Mele Evdilkerîmê cizîrî peyda kir. Wî hem farisî dizanî û hem jî erebî û osmanî dizanî. Mele Evdilkerîm niho 72-salî ye û şêxên mala Şêx Seydayî jî got ti kes ji Mele Evdilkerîmî baştir nizane »Dîwanê« serast fêm bike û bixwîne.

Min û Mele Evdilkerîmî me li hev kir û min gotê divêt tu »Dîwanê« hemiyê bi dengê bilind ji min re bixwînî da ez kontrol bikim ka min ew serast kiriye latînî yan ne. Mele Evdilkerîm ji çavekê xwe nexweş bû û nû ji cem doktorî hatibû. Min hinek ji »Dîwanê« bi alfabeya latînî jê re xwend û pirsî ka fikra wî çî ye. Wî jî, ji qenciya xwe, got tu wê pir serast dixwînî û gelek melayên kurd hene ko nikarin »Dîwanê« serast bixwînin.

Min dest ji xwendina xwe berda û gotê ji niho û pê ve ez dê tenê guhê xwe bidime wî û divêt ko ew bixwîne û ez dê hem dengê wî qeyd bikim û hem jî di ber re teksta xwe kontrol bikim. Mele Evdilkerîmî »Dîwanê« xwend û min qeyd kir, heta ko me hemî xelas kir.

Seyda Mele Evdilkerîmê cizîrî bi xwe jî feqeyê Mele Mehmûdê miftiyê berê yê Cizîrê (Mehmûd Bilge) ye. Mele Evdilkerîmî jî ji min re got ko eslê »Dîwanê« ji 114 helbestan pêk têt û jixwe »Dîwanê« li gor herfên alfabeya erebî hatiye vebijartin (tesnîf kirin) û bi »yayê« xelas dibe.

Mele Evdilkerîmê cizîrî sirra vê vebijartinê û hejmara 114 helbestan jî bi »Qur'anê« ve girê dide û dibêje Melayê Cizîrî xwestiye ko hejmara helbestên »Dîwana« wî bi qasî hejmara sûreyên »Qur'anê« be. »Qur'an« jî 114 sûreyan pêk têt û »Dîwanê« jî ji 114 helbestan pêk têt. Di vê çapa »Dîwanê« de ez jî tenê 114 helbestan belav dikim.

Di »Dîwanê« de helbest bêsernivîs in û hemî jî yan bi »*We lehu eyden quddise sirruhu*« yan jî bi »*We qale eyden quddise sirruhu*« dest pê dikin. Min rêza yekê ji her helbestekê bijart û jê re kir sernivîs.

Ravekirina îzafeyê

Di »Dîwanê« de Melayê Cizîrî ji bo weznê »îzafe« bi kar aniye û ew jî di alfabeya erebî de nayêt nivîsandin. »Îzafe« li gor zimanê kurdî hinek caran di cihê veqetandekê de û hinek caran jî di cihê tewangê de hatiye bi kar anîn. Melayên kurdan gava ko »Dîwanê« dixwînin »îzafeyê« li gor zi-

manê kurdî serast dixwînin û wê dema ko veqetandek be dikin »a« yan »ê« û gava ko tewang jî be dikin »î« yan »ê«.

Rasttranskrîbekirina »îzafeyê« belayeka mezin e û ji ber ko Melayê Cizîrî jî ne sax e mirov ti caran nikare ji sedê sed piştrast be ka mirov dê wê çawa transkrîbe bike. Heger zayenda navdêrekê mê be divêt »îzafeya« wê bibe »a« û heger zayenda navdêrekê nêr be divêt îzafeya wê bibe »ê«. Vêca hinek navdêr hene ko kurd zayendên jihevçida bo wan bi kar tînin. Melayê Cizîrî botî bû û min jî zayenda navdêran li gor devoka botiyan hesiband û veqetandek û tewangên wan jî wisa nivîsîn.

Li cihên ko »îzafe« tenê ji bo weznê hatibe bi kar anîn û ew ne cihgira veqetandek yan tewangê be min »îzafe« bi »i«-yê nivîsiye û bendikek (-) daniye pêşiya wê, ji ber ko »îzafe« cihê dengê »i«-yê digire. Bo nimûne:
Ismê te ye mektûb-i di dîwanê qidem da yan jî: Lew selb-i kir jê ixtiyar

Peydakirina qesîdebêjan

Piştî serastkirina metnê »Dîwanê« karê herî zehmet peydakirina melayên qesîdebêj û dengxweş bû. Medrese hema hema bibêje li Kurdistanê nemanê û koçk û dîwanên melayan jî hêdî zû-zû bi qesîdegotinê nayên germ kirin. Ew melayên ko berê qesîde digotin jî niho yan nabêjin yan jî pîr bûne û dengê wan têra gotinê nake.

Li bajarê Cizîrê melayek tenê jî ko qesîdeyan bibêje min peyda nekir. Melayek hebû ko digotin dengê wî xweş e. Min du-sê rojan li ber wî da ko bibêje û wî xwe neda ber gotinê.

Seyîd Beşîr qesîdebêjekê naskirî bû li Botan û li gundekî Silopyayê di-ma. Di zarokîtiya min de ew û Mele Mihemedê Tajdîn, Mele Salihê Dihî û hinek melayên di li nik babê min kom dibûn û qesîde digotin û yekî yê di li gotinê germtir dikir. Dema ko ez çûm Kurdistanê Seyîd Beşîrî wefat kiribû.

Min li Şirnexê Mele Mihemedê Tajdîn û Mele Mehmûdê Biligî peyda kirin û qesîde li wan dan gotin. Mele Salihê Dihî jî bar kiribû û çûbû Wanê. Ez ji bo xatira wî çûm Wanê û ew hê jî li ser siheta xwe bû û dengê wî jî neketibû. Min gelek qesîde li Mele Salihê dan gotin û wî ji hemiyan xweştir »Sebahu l-xeyrî xanê min« xwend ko bi serê xwe şaheserek e.

Li Wanê, Bayezîdê, Sêrtê, Diyarbekirê û Mêrdînê min gelekê pirsra melayên qesîdebêj kir lê belê ewên ko min peyda kirin yan dengê wan nexweş bû yan jî teksta »Dîwanê« serast nedixwend.

Li Stenbolê jî min Mele Silêmanê Kercewsî dît ko »Dîwan« pir serast dixwend. Wî sê qesîde gotin û bi deng û awayê xwe yê nerm wî gêrevêre ji hersê qesîdeyan jî berdaye. Li Stenbolê min du-sê melayên serhedî jî peyda kirin lê belê wan bilêvkirina botiyan nedizanî û ji ber hindê herçend min dengê wan jî qeyd kir min ew neêxistin cd-ya »Dîwanê«.

Xwendevan dê ferq bikin ko di vê cd-yê de hinek caran dengê melayên qesîdebêj û teskta »Dîwanê« tam li hev nake. Sebeba wê jî ew e ko melayan ew ji ber dixwend yan jî ji teksta bi alfabeya erebî dixwend. Divêt xwendevan bihesibîne ko teksta trankrîbekirî ya rast e û ew nûansên biçûk yê di dangan de bi qesîdebêjî ve girêdayî ne.

Alfabeya transkrîpsiyonê

Alfabeya kurdî-latînî ji 31 herfan pêk têt û di tabela li jêrê de mi'adilên wan bi alfabeya kurdî-erebî hatine nivîsandin. Ew herfên erebî ko di alfabeya latînî de nînin jî bi herfên transkrîpsiyonê hatine nivîsandin.

kurdî	erebî		kurdî	erebî		kurdî	erebî
a	ا		î	ى		s	س
b	ب		j	ژ		ş	ش
c	ج		k	ک		t	ت
ç	چ		l	ل		u	و
d	د		m	م		û	و
e	ه		n	ن		v	ف
ê	ئ		o	ۆ		w	و
f	ف		p	پ		x	خ
g	گ		q	ق		y	ى
h	ه		r	ر		z	ز
i	-						
Ekstra							
ء	ء						
ş	ث		ş	ص		z	ظ
ħ	ح		đ	ض		ç	ع
z	ذ		ţ	ط		x	غ

»Dîwana« Melayê Cizîrî heta niho bi alfabe û vekîteka serast nehatiye nivîsandin û alfabeyên ko kurd bi kar jî tînin têra rastnivîsandina »Dîwanê« nakin.

Alfabeya erebî problemên mezin di vekîte de derdixe û ti caran rê nade ko mirov kurdî li gor hêmanên gramera kurdî serast binivîsîne. Bi alfabeya erebî lêker, rengdêr û daçekên kurdî serast nayên nivîsandin û ew jî seqetiyeka pir mezin e. Gelek dengên cida yên kurdî di alfabeya erebî de nînin yan jî du-sê deng bi yek herfê tînin nivîsandin.

Nebûna girdek û hûrekan jî wisa dike ko bi alfabeya erebî yan kurdî-erebî mirov nikare navên xweser û navên cih û welatan ji bêjeyên normal cida bike ji ber herdu jî wekî hev tînin nivîsandin. Bo nimûne heger em binivîsînin »ew azad e« gelo em dê çawa bizanin ka mebesta me kesek e ko navê wî Azad e yan jî mebesta me kesek e ko ew bi xwe »azad« e, yanî serbest e.

Ji bo diyarkirina problema vekîte ez dê li vê derê tenê hinek nimûneyan bidim. Ez dê pêşiyê li gor vekîta latînî ya serast binivîsînim û paşê jî her cardî bi alfabeya latînî lê belê li gor vekîta erebî binivîsînim.

Nimûne 1

Vekîta rast li gor alfabeya latînî:

Ûor im bi dil û peyrewê Mûsa yim ez
Ateşperes û nûra tecella yim ez

Vekîta xelet li gor alfabeya erebî:

ûorim bidil û peyrewê mûsayim ez
ateş peres û nûra tecellayim ez

Nimûne 2

Vekîta rast li gor alfabeya latînî:

Êd e û herkes ji dîdara te lê pîroz e Êd
Ez tinê mehrûmê dîdar im bi şed menzil be Êd

Vekîta xelet li gor alfabeya erebî:

Êde û herkes jidîdarate lê pîroze Êd
eztinê mehrûmê dîdarim bişed menzil be Êd

Di zimanê kurdî de bêjeyên »torim«, »bidil« û »mûsayim« nînin û vekîta li gor alfabeya erebî van bêjeyan di kurdiyê de çêdike ko ti bingehê gramerê jê re nîne. Bêjeya »ateşperes« rengdêr e û divêt pêk ve bêt nivîsandin lê belê alfabeya erebî ew kiriye navdêrek û rengdêrek, yanî du parçe, û li vê derê ne li gor menaya xwe ye.

Di nimûneya didoyê de »ji dîdara te« li gor vekîta bi zimanê erebî bûye »jidîdarate« û hêdî mirov nizane ka daçek çi ye, lêker çi ye û pronav çi ye. Hersê bi hev re bûne yek bêje ko ti menaya wê nîne.

Di alfabeya erebî de 12 herfên kurdî (ç, e, ê, g, î, î, j, o, p, u, û, v) nînin. Yanî ji sedê sihê dengên kurdî bi alfabeya erebî ya normal nikarin bêt nivîsandin. Farisan ji bo zimanê xwe hinek herf li alfabeya erebî zêde kirine û ew jî têra kurdiyê nakin.

Li başûr û rojhilatê Kurdistanê kurdan alfabeyeka erebî ya modîfîyekirî amade kiriye lê belê di alfabeya kurdî-erebî de jî vêca şeş herfên erebî (ث, ذ, ص, ض, ط, ظ) nînin û ji ber hindê mirov nikare »Dîwanê« bi alfabeya kurdî-erebî tenê jî binivîsîne. Problemeka pir mezin ya alfabeya kurdî-erebî jî ew e ko herfa »i« di wê de nîne û herwiha di alfabeya kurdî-erebî de sê herfên kurdî (u, û, w) bi yek herfa erebî, yanî bi »wawê, (و)« têne nivîsandin û du herfên dî jî (î, y) bi yek herfa erebî, yanî bi »yayê, (ی)« têne nivîsandin. Mirov nikare kurdî bi vekîteka serast bi alfabeya kurdî-erebî binivîsîne ji ber ko alfabeya erebî yan kurdî-erebî rê nade ko mirov bêjeyan li gor hêmanên gramera kurdî vebikîte.

Di destê me de ma alfabeya kurdî-latînî ko alfabeya herî kamil e bo zimanê kurdî. Lê belê ji ber ko di »Dîwanê« de gelek bêjeyên erebî hatine bi kar anîn û ew bêje divêt li gor denganiya zimanê erebî bêne nivîsandin hingê pêwistiya me bi hinek herfên erebiyê jî çêdibe û em dikarin wan herfan bi herfên latînî yê transkrîpsiyonê binivîsin. Herfên transkrîpsiyonê jî bi danîna hinek nîşanan li binê hinek herfên latînî yê normal çêdibe.

Vêca heger em »Dîwanê« bi alfabeya kurdî-latînî û bi arîkariya van herfên transkrîpsiyonê binivîsin, hingê em hem dikarin hemî dengên alfabeya kurdî û hemî dengên alfabeya erebî serast binivîsin û hem jî em dikarin vekîteka serast bi kar bînin û bêjeyan serast ji hev cida yan bi hev ve binivîsin.

Li vê derê armanca min ne ew e ko em hinek herfên nû li alfabeya kurdî ya latînî zêde bikin û wê bikin standardek. Ez vê bikaranînê tenê ji bo

rastfêmkirina klasîkên kurdî pêwîst dibînim û lewra jî min »Dîwan« bi du versiyonên cida amade kiriye: versiyonek bi alfabeya transkrîpsiyonê û versiyona dî bi alfabeya kurdî-latînî. Ez versiyona bi alfabeya transkrîpsiyonê wekî kitêb çap dikim û herdu versiyonan di cd-yê de wekî ePirtûk çap dikim û kesê ko bixwaze dikare ya normal ji cd-yê bixwîne.

CD-ya »Dîwanê«

Kitêb û cd-ya »Dîwanê« berhema xebateka sê salan û mesrefeka zêde ye. Ji bo min bextewariyeka mezin e ko amadekirina »Dîwana« Melayê Cizîrî bi teknîka multîmedyayê bû pişka min. Produksiyona »Dîwanê« wekî cd-rom ne tenê mesref lêdîçe, ked û sexbîriyeka zêde jî dixwaze û min xwest ez »Dîwanê« bi teknîk û awayekê wisa amade bikim ko ne ji hempayên xwe yên ewropî kêmtir be û heta heger ko ji min bêt ji wan gelekê profesyoneltir jî be. Bi rehetî ez dikarim bibêjim li welatekê wekî Swêdê jî heta niho ti şirketên multîmedyayê ji bo senkronîzekirina (hemahengî) deng û tekstê teknîkeka wekî ya me di cd-romên xwe de bi kar neanîne.

Ji bo her rêza ko qesîdebêjek dixwîne bête nîşan kirin min di fayla dengî bi xwe de ji bo her rêzekê û dubarekirinê rêzan kodên xweser nivîsîn. Her qesîdeyek ji yek fayla dengî pêk têt û tu li ser kîjan rêzê bitikînî deng ji wê rêzê dest pê dike û heger dubarekirin hebin program bi xwe paş ve li rêzên dubarebûyî vedigere.

Di cd-yê de »Dîwan« bi sê alfabeyên cida heye: 1) alfabeya kurdî-latînî ya normal, 2) alfabeya transkrîpsiyonê û 3) alfabeya erebî.

Spasî

Heger ez behsa hemî serhatî û xebata xwe ya li ser amadekirina »Dîwana« Melayê Cizîrî wekî cd-rom û kitêb bikim divêt ez kitêbeka temam binivîsînim û mebesta min qet ne ew e. Lewra jî berî ko ez vê pêşgotinê xelas bikim divêt ez spasiya hemî wan kesan bikim ko arîkariya min kirin, dema xwe dan min û nêrînên xwe ji min re gotin.

Pir spas ji bo seyda Mele Evdilkerîmê Cizîrî, Mele Salihê Dihî, Mele Mihemedê Tajdînî, Mele Mehmûdê Biligî, Mele Silêmanê Kercewsî, Selam Nimanî, Newzadê Hirorî, Ferhad Şakelî û hemî wan kesên ko min navên wan li vê derê nenivîsîne.




Sala 2004-ê weşanxaneyê Nefelê versiyoneka dijîtal ya »Dîwanê« di

cd-romê de derxist. Ev cara pêşiyê ye ko ev transkrîpsiyona »Dîwanê« wekî kitêb li ser kaxezê çapkirî derdikeve. Ji çapa dijîtal ya berê aşkera bû ko »Dîwan« divêt li ser kaxezê çapkirî hebe ji ber hem tama wê cida ye û hem jî heta niho gelek kesan kompûter nînin û fêrî xwendina di kompûteran de nebûne.




Ev transkrîpsiyona nû û cd-roma »Dîwanê« berhema min e û ji hemî kêmasiyên wê ez berpîrs im û ne ti kesên dî.

Stockholm, 15-ê gulana 2007-ê

Arif Zêrevan



Dîwan



Bab A (elîf)

Bab A (elîf) 1. Newaya muṭrib û çengê

Newaya muṭrib û çengê
Fiṭan avête xerçengê
Were saqî ḥeta kengê
Neşûyîn dil ji vê jengê

Heyata dil meya baqî
Binoşîn da bi muştaqî
»Ela ya eyyuhe s-saqî
Edir ke³sen we-nawilha«

Ko katib dêmî cedwel kit
Şikeste xeṭ muselsel kit
Ji yek ḥerfan mufeşşel kit
Kî ye yê muşkilê ḥel kit

Dizanî rûd û ^ˆûd ewwel
Çi tavêtin surûd ewwel
»Ki ^ˆişq asan numûd ewwel
Welê uftad-i muşkilha«

Ji mihra wê şefeqse^ˆdê
Şirînle^ˆlê şekerwe^ˆdê
Dinalim şubhetê re^ˆdê
^ˆEcîb im lê ji vê ce^ˆdê

Ki dil ra tab-i her çîneş
Bi kufrê mîbered dîneş
»Zi tabi ce^cdi muşkîneş
Çi xûn uftad-i der dilha«

Di vê taqê di vê xanê
Me ^ceyş û êminî kanê
Kesê dest dit ji dewranê
Nihalik vê gulistanê

Der axûşeş çu mîared
Ki ez dil canêş buspared
»Ceres firyad-i mîdared
Ki ber bendîd-i meħmilha«

Bi Qur³anê bi ayatê
Eger pîrê xerabatê
Bebêjit secde bin Latê
Murîdên wî dibin qatê

Murîd er bêbeşer nebwed
Zi fermaneş bider nebwed
»Ki salik bêxeber nebwed
Zi resm û rah-i menzilha«

Şevê zulmat û deryayê
Ji mewcan qeṭ xeber nayê
Şikestî keştiya bayê
^cEcacê wê şefeq dayê

Ji herfan mah û sal-i ma
Nehat der şikli fal-i ma

»Kuca danend-i ھاal-i ma
Sibikbaran-i saھilھا«

Me ra ji ewwel ھا bir xamı
Kıřand axir bi bednamı
Ji rengê Se^cdı û Camı
Ji řuhret pê ھاřın ^camı

Bi deng û bang û awazê
Dibêjit neřmeya sazê
»Nihan key manedan razê
K^zez û sazend-i meھfilھا«

Ji ھاfiz quřbê řırazı
Mela fehm er bikı razı
Bi awazê ney û sazı
Bibı ber ھاerxê perwazı

Tuzed min ھاubbihe ř-řefwa
Bihi ehlu l-hewa neřwa
»Meta ma řelqe men tehwa
De^ci d-dunya we-ehmilھا«

Bab A (Elîf) 2. Ismê te ye mektûb-i di dîwanê qidem da

Ismê te ye mektûb-i di dîwanê qidem da
Herfek qelemê °ilm-i bi teqwîmê reqem da

Eşkal û xeşên da °ireya nuqteyê °ilm in
Ev neqş û mişalên di xeyalatê °edem da

Mîm meçle°ê şemsa ehed ayîne şifet kir
Lami° ji °ereb berqê li fexxarê °ecem da

Da şahidê esma bi hemî wechî binasîn
Yek mestê Şemed kir bi yekê neqşê şenem da

Yek girtiye zulfê we yekê xalê nima°î
Ayîne bi Eskenderî û cam-i bi Cem da

Erwahê muqeddes şebê qedran te dixwazin
Nûra te ye mişbah-i di qendîlê Herem da

Da weqtê liqayê bi te hey bin di beqayê
Min neqdê dil û can di fenayê bi selem da

Yaqûtifiroşan di kef elmas-i şikestin
Ev şefheya elmas-i ko neqqaşî reqem da

Ya reb ji çi rû leb bi şenaya te kuşayem
Subhaneke len uşkiye fî şe°nike hemda

Minnet ji Xudayî ko bi °ebdê xwe Melayî
Iksîra xema °işqê, ne dînar û direm da

Bab A (elif) **3. Meşşateyê husna ezel**

Meşşateyê husna ezel
Çengalê zulfan tab-i da
Da îşq-i hil bit pêl-i-pêl
Qelbê me bê cellab-i da

Husna hebîb û luţfa yar
Avête dil îşqa xedar
Lew selb-i kir jê ixtiyar
Wê husnê ev îcab-i da

Min dî seher zulfên di mest
Hatin sema ihram-i best
Çûn secdeya xalê bi qest
Lew haciban mihrab-i da

Rûh û rewanê min hebîb
Dîsa bi telbîsa reqîb
Rencîde kir miskên xerîb
Terka dilê ehab-i da

Mehebûb û reyhan pir gulav
Ker kir li min cerg û hinav
Zehra helahil bû di nav
Lew saqî ew cullab-i da

Wan dest û zend û saîdan
Mey dane şeyx û zahidan
Mestî be çeşmê şahidan
Ew nêrgiza sîrab-i da

Miskê reşandî ez dibêm
Wan nuqteyan hin bûne kê
Lê xetxetê reyhanî li dêm
Katib ji nû i^crab-i da

Nazikqeda nûrînbeşer
Ew bû li min neqşê beşer
Dîna xiyalê her seher
Nav dîde'ê bêxwab-i da

Ew tilliyên nazik reqîq
Pir da me fincana ^ceqîq
Ew badeya nûrîn rehîq
Minnet bi min wehhab-i da

Da xef nebit bejna ferê
Mey hate şehkasa sirê
Minnet ko îro dêmdure
Dîsa şeraba nab-i da

Mey hate fincana şedef
Kes dê vexwit îro bixef
Saqî bi çeng û nay û def
Ferfûriya mehtab-i da

Îd e w hebîbê nezre lê
Yan dê bi qurban bî Melê
Ya reb bibînim roj hilê
Sikkîn di dest qeşşab-i da

Bab A (elif) 4. Muxbeçeyên meyfiroş

Muxbeçeyên meyfiroş
Her seherê tên sema
Badexwiran noşi-noş
Mane li dorê cema

Hin gulê bo^cenber in
Hin di şîrîn esmer in
Hin guherî-dane yin
Mişlê Suheylê sema

Hin zerî ne pirsir in
Ser bi per in dêmdur in
Min ko di çerxê we dî
Şebr û qerarim nema

Şebr û qerarim ko bir
Can û ceger hûr dikir
Zulmê we reng kê dikir
Can dibir û dil teba

Can û dilê min ew e
Horiweşê min ew e
Padişehê min ew e
Ez li derê wî geda

Yarê ko dî em geda
Dest-i bi destê me da
Em bi semayê birîn
Reş û sema jê we ma

Gote me durdane yî
Em ji te û tu ji me yî
Lew bi heqîqet yek in
Mes'ele bêşubhe ma

Dame bi destê sirê
Cama ji rengê durê
Cezbe giha can û dil
Pir şewişandin hema

Bade mi noşî ji dest
Çûme ji xwe mame mest
Qeṭre bi beḥrê giha
Beḥr-i bi 'eynê xwe ma

Gûş-i bi 'amê mede
Terka medamê mede
Ekşeruhum fî ḫuma
Eḫlebuhum fî 'ema

Ḥerf-i ji yek bûne feşl
Ger bibirî wan bi eşl
Ḥerf-i dibit yek xetêk
Xet ko nema nuqte ma

Weḥdet-i muṭleq Mela
Nûr e di qelban cela
Zor-i di vê mes'elê
Ehlê dilan şubhe ma

Bab A (elîf) **5. Çîn çîn kirin zulfên siya**

Çîn çîn kirin zulfên siya
Keskeleşa dîba qeba
Êdî nişan nabin xwiya
Têkil kirin lazim şeba

Min dî şeba dayê seher
Madarê bedrê kir du ker
Qews û qezeş jê hate der
Dîsa bi zulfan ra teba

Îro ji me l'bedra tamam
Enberfeşan bin şed selam
Ey hudhudê şîrînkalam
Ehlen we-sehlen merheba

Min dilberek wek dur heye
Meşbûbê şîrînsir heye
Husn û cemalek pir heye
Belqîşşifet mesken Seba

Şox û şepala meyperest
Ew zalima hişyar û mest
Vê nameyê xef dê vi dest
Fî teyyiha neşru n-neba

Bêj^o ew şîrîna surperî
Durdaneyê ez muşterî
Kan^o ehd û peymanê berî
Bêfayde çûn şubhê heba

Me divê periya dilberê
Lê hê li uslûba berê
Lê kifş bibîte ji pencerê
Bê û biçit teşbîhê ba

Dilber mecala name dî
Nasî ko nîşana me dî
Nûnek muxalif tê nedî
Hel qelbuha nehwê şeba

Neyşekera spî dest û zend
Zanim mecala name xwend
Lêvan tebessum kir ji qend
Maset ke-banin fî ruba

Qaşid bi meqşûda me hat
Ba mujde û emr û berat
Nîşan hinarin hem xelat
Şehzadeya gulgûn qeba

Îro mecal lê hat û wext
Dîsa ciwan bû min di rext
Ew lami^c a dayî ji text
Ma kane berqen xulleba

Selwa rewan zerrînwereq
Çîçek Melê dîn şed neseq
Yaqûtuha yeḫki ş-şefeq
Yeḫkî^c uqûden kewkeba

Bab A (elîf) 6. Dilber şikêna şekerek

Dilber şikêna şekerek
Fequltu ya rûhî meta?
Go min heta xaîr hebit
Min go çi kim ez ba heta

Zulfan tu bes çîn çîn bike
Biskên muqabil dîn bike
Pêşkêşî yek zulfek te bin
Mulkê xeten textê xeta

Dil bendê dava zulfekê
Keftî kemenda ulfekê
Hel fî yedi l-meftûni şey?
Ew keyfe eşne^c ya feta?

Zulfên but û şîrînleban
Jehrî ne şubhet^c eqreban
Lê min ji biska pirgirê
Îro tinê girtin du ta

Nisbet perî zîba ye ew
Wek nêrgiza yekta ye ew
Ya men re^a xillî fe-hel
Yuşbî bi-şeyⁱⁿ qameta

Me ji buxçeya yar zeyyinî
Bêpîrs-i yek sêvek çinî
We-bima ceneytu cenyetî
Elqet^c eleyye cinayeta

Bab A (elif) 7. Bi narê firqetê şohtim

Bi narê firqetê şohtim
Ji ferqê ser heta pê da
Xedenga xefletê nuhtim
Ji berqa lami^ç a tê da

Xedenga firqetê re^ç d e
Dilê ew xefletê lê dit
Dibêjim wer cebel bit ew
Bi ker bit wê di gavê da

Heçî firqet nedî hicran
Nebê min daḫ û key lê ne
Ji bil derbê di hicranê
Firaqa rûḫ û can kê da

Ji her bêdaḫ û bêderdî
Mepirsin miḫneta^ç işqê
Çi zanin bê xeber jana
Dilê daḫ û keser tê da

Kesê miḫnet dî û firqet
Vexwarî cer^çeya hicrê
Girî wan tê bi ḫalê min
Di vê hicran û zecrê da

Bi dama muḫbetê bend im
Xedenga firqetê dil nuht
Bi şubhê murḫê nîmbismil
Di hev wertêm di xwîne da

Birûska bañinî da dil
Di pêtê sîne wê werbû
Ko dê bêtin tebêta dil
Di nav wê nar û pêtê da

Ji ulfê şubhetê zulfê
Medam lew bêqerar im ez
Ko canê min ^{ezîz} îro
Çû û dil wê di ulfê da

Ji mehbûb dûr kirim çerxê
Felek wê pir hilavêtim
Nizanim dê li kû dit min
Di vê dewran û çerxê da

Hebîbê bêxeta kuştim
Bi derba firqetê axir
Ji wê rojê dizanî min
Ko yar ew tîr li cergê da

Gelo dîsa bibînim ez
Çiraya weşletê hil bit
Bişojim şubhê perwanê
Di ber wê nûr û şewqê da

Bi derba kewkeba şubhê
Li meşriq Zuhre talî bit
Zuhel dûr bit bi şeş bircan
Û winda bit di xerbê da

Ji qundus Zuhre peyda bit
Ji hindis Muşterî bêt der

Spêdê dit Şureyyayê
Şefeq dit qametê pê da

Ji şewqa ebrûyan binmêt
Hilal dîsa di qewseynan
Ji xawer bête xwirşîdê
Zelam werbit di nûrê da

Bi werdan zeyyinîn gulşen
Çimen da lale bişkiftin
Binefş û çiçekan vêk ra
Şefeq da yek di rewqê da

Sehergeh endelîb mest in
Ji bihna werd û bişkojan
Şubih tûtak û goyînan
Dinalin em di firqê da

Li kelbê asitanê xwe
Nepirsî qeṭ hebîb carek
Gelo nayêne bîrê em
Di vê nêçîr û ravê da

Dizanim şehsiwarê min
Xezalek wê di fitrakê
Bi cayî şeydê ez bûma
Di wê fitrak û bendê da

Çi heddê şed hezar can bin
Di fitraka hebîbê min
Ko şed Cimşîd û Keyxwisro
Xulam in ser devê rê da

Di deh salan mulazim mam
We yarê rû neda carek
We ger ne yar eger rû dit
Heye carek di salê da

Dilo mizgîn e min şa be
Ko sulţanê me dê bêtin
Ji min bawer ke peyşamê
Seher mizgîn bi min pê da

Şukur bînahiya min hat
Û Ye^cqûb dîde rewşen bû
Bi boya Yûsifê Mişrî
Li Ken^canî beşer peyda

Nesîmê sinbil û sêvan
Seher da hebs û zindanê
Vebû qufla me bêmifte
Ziringînî ji quflê da

Firaqê, şev bi axir çû
Spêde kifş-i bû dîsa
Merîxa neşê ava bû
Xwiya bû roj di şerqê da

Di çerxê wek nucûm dêmdur
Sema hatin qirana yek
Heyîva bedrê bû ew
Surperî min dî di reqşê da

Ji Wadiyê-eymenê dilber
Nizam enguştek îzhar kir

Ko xweş enwarê berq in ew
Tecella bûn di Torê da

Qirana Zuhreyê min dî
Di ber 'iqda Şureyyayê
Ji perwînan dibêjim 'ek-
s e hêj keptî di camê da

Hebîbê 'ezmê şuhbet kir
Di caman lew şerab anî
Dilê min dî du şeyyadan
Ji biryan ra berî wê da

Bi tolên asitanî ra
Vexwendim mîr bi dergahê
Bi vî çavî hebîb dîtîm
Şukur ev şefqe Mewlê da

Ji şeklê ebrûyên saqî
Hilatin şed hilal îro
We bedrek min muqabil dî
Işaret min ji 'eksê da

Bi zehrê xwey şerîf xwendim
Ko xidmetkarê dêrîn î
Te pir cewr û cefa dî ne
Di sulûk û se'y û cehdê da

Biçîn werdan ji gulzaran
Ko exyaran bi dest xar in
Ji mexşûşanê dergahê
Du 'am in ew di hecrê da

Bi teşrîfa xwe ez xwendim
Ji luţfê bende nîşan kir
Xelat û şefqe û dildan
Şukurxwaz în ko Baxwey da

Mi hadir secdeya şukrê
Li wê  erda muqeddes bir
Bi mujganên xwe dur suftin
Enî malî li  erdê da

Heya bînahiya çehvan
But û  Uzza û Latê min
Tu yî pêşber sucûda min
Sehergahan di xelwê da

Li bal  ilmê te me lûm e
Ji jînê min tu meqşûd î
Fidayê can me dê can bit
Di qesta weşl û dînê da

Bi  usna xwe ilahî kî
Bi sehm û heybeta dînê
Nucûm û kewkebê lami 
Ji bala t n bi bejnê da

Bi xal n werd û nesr nan
Ji qudret xe  kişand  l 
Bi ter a n rgiza  el 
Sehergahan nes m l  da

Ko tol  asitan  d r
Nek  ed  ji dergah 

Ji Baxwey vê rucû nakîn
Di babê luft û rehîmê da

Tu narê firqetê zanî
Dikarim ez tehemmul kim
Diyarê kohê Qendîl im
Meger fîl im di îşqê da

Zehê derdê mezin firqet
Ceger şot ateşî da dil
Cihê şebrê nema çendan
Ferec min dî di şebrê da

Mela bê qameta yekta
Qiyamet min bi çehvan dî
Firaqê rûsiya bin te
Ji min canê şîrîn cê da

Bab A (elîf) **8. Serê zulfa te bi kullabê du^{ca}**

Serê zulfa te bi kullabê du^{ca}
Hate destê mi bi cellabê du^{ca}

Şofiyê xelwenişîn bêne sucûd
Herdu birhên te ne mihrabê du^{ca}

Erde kê dê bikirim sûretê hal
Ko tu yî qibleya erbabê du^{ca}

Ji du^{ca} ayê qedehek derdest e
Her seher mestê meya nabê du^{ca}

Gulê iqbalê ji gulzarê qebûl
Mi çinî bû di şekerxwabê du^{ca}

Ber du birhên te ji ixlaş û yeqîn
Mi dibir secde bi adabê du^{ca}

Ji dilek şafî tu mihrabê bibîn
Secdeyek lazim e der babê du^{ca}

Mi di dil^{ca} urwet-i wuşqa ye bi dest
Ji şenaya te ser elqabê du^{ca}

Ji ezel yek cihetî daye Melê
Her me ixlaş e ji esbabê du^{ca}

Bab B (bê)

Bab B (bê) 9. Destê qudret ko hilavêt ji bejna te niqab

Destê qudret ko hilavêt ji bejna te niqab
Bi cemala ceberûtî me neman perde û hicab

Li gulên tey ter û nazik ko seher girtî xwinav
Di ebarîqê qinînan ji hesed şohtî gulab

‘Eynê kafûrî ye meşreb me ji husna te ye şaf
Lew ji ‘îşqa te di dil da me vebû ‘ilmê ‘ubab

Me ji ser çeşmeyê heywan qedehek şafî vexwar
Nagihî lezzet û zewqa me bi şed cildê kitab

Lew di çengê me dixwînî ko di ‘îşqa te bi saz
Me bi bejna te dixwînî ney û qanûn û rebab

Qehweya telxê digel zehra helahil biderî
Me ji destê te mubarek şekeramêz e gulab

Qulzemê ‘îşqê ji bayê xwe muxalif demekê
Di hemamatê ‘ecacê me li ser destê xirab

Seherê Xudrê ‘inayet ko birîn çeşmeyê dil
Bi cehanê me nezer da ko cehan ‘eyn-i serab

Bi hebabê mebe mexrûr wihe sergeşte Mela
Ba vi ber keftiye wê beyhude sergeşte hebab

We ye hudhud ji Seba bêt û bizanîn çi ye hal
Ko li halê me xerîban ne su²al û ne cewab

Herdu birhên te ne mihrab-i çi îman û çi kufr
Bûd û nabûd ko yek in ev çi şewab û çi 'iqab

Were nîşanê Nişanî de xwe bêperde seher
Lê ji xwînê bike perhîz ko şehîdan çi hisab

Bab B (bê) 10. Li-llahi l-hemd ji yarê me di dest cam e lebaleb

Li-llahi l-hemd ji yarê me di dest cam e lebaleb
Ji lebê noşê peyapey di dil ilham e lebaleb

Di riya wan xet û xalan ko ne herfên qelemê ne
Me ji feyda te ye mestane rewan ça me lebaleb

Mestê şehkasê meya cezibeyên rûhî didîn
Rûh dizanit ko ji ber lezzetê îşq mame lebaleb

Nêrgiza mest-i ji bala çimena sinbil û gul tê
Qedehe taze bi destê xwe meşî da me lebaleb

Wehetê şîrf e me meşreb te çi iksîrê wucûd
Em lebaleb çi lebaleb bi xwe hem came lebaleb

Şem û perwane bi zate xwe ji halê me di dûr in
Ateşek şîrf e ji îşqa te vewesta me lebaleb

Qedehek taze ji îşqê di ezel da me hekîmî
Jê dinoşîn hey û hey hê bi xwe cama me lebaleb

Carekê goht-i Nişanî ne Mela yî were banî
Ev dixwast me ji dil û can dehen û kame lebaleb

Te dizanim te dibînim ko tu yî nûra wucûd
Ellah ellah ji çi nûr e di seraya me lebaleb

Ji inayet nezerê xaşşe ko her meşre û beytek
Qedehe abaya heyatê ne di şîra me lebaleb

Bab B (bê) 11. Şah bi qeşda kuştina min rim hejandin bêsebeb

Şah bi qeşda kuştina min rim hejandin bêsebeb
Da me çeşmê qehr û xeşmê rim li dil da go edeb

Kuştîyên dîdar û dîne bêxeşa her deh şed in
Her seher dîsa ji nû wên tene kêrê şed celeb

Dê ji çerxê pencumîn bêtin tenezzul kit Merîx
Mişlê Şemsê ger kişînitin li wan tîxên xedeb

Her mecala ew di cengê bêt û ret her carekê
Rast û çep dê bêxistin şed şed bi mizraq û qeşeb

Ristem û Cimşîd û Xalid, Hemze yan şerê 'Elî
Aferîn ya şehsiwarê tirk û rimbazê 'ereb

Lê li tolê asitanê çix bi wan le'lan kirin
Dergehê fethe vebû îro li mehcûran 'eceb

Bendeyê şadiq seher amancê reştûzên xwe kir
Min bi qewlê dijminan dit ber xedengan bêsebeb

Leşkerê qehr û xeman wê çûn hişara dil bikin
Ke'be û Beytu l-heram e lê bi nûr bêtin receb

Suftiyên pir le'l û mircanan bi mujganan heta
Dîde rewşen bûn bi dîna demdurê sîmînxebeb

Ê vi Xuđrî ra divêt ava heyatê bit neşîb
Dê bi se'y û cehdê yeksan bin li bal wî roj û şeb

Xidmeta pîrê muᵡan dê kit kesê meqşûd e mey
Şîşe û cama zucacê ê divêt dê ret Haleb

Cewrê hindî dê kişînit her kesê  awûs divêt
Gewher û durra yetîm bê terk-i ser têtin  eleb

 efletî ew keşşifi şîr dest bi dest hatin ceger
Go  ebînet'ya Mela miskîn me lê ker kir kezeb

Bab B (bê) 12. Min di dil kovan hezar in daḡ û keyber bêhisab

Min di dil kovan hezar in daḡ û keyber bêhisab
Miḡneta werdên bixar in wên di dil da şed nişab

Şed nişab in min di dil îro ji xarên şorgulan
Yek bi yek peykan çevî bûn çûne cergê da kulab

Pir bi wan curhan xwe têt in lew ko dî derman dikir
Şerbet û ava heyatê şeker û qend û gulab

Ger duşed peykan di nêva dil biwan dê xweş biwan
Her dema kewkeb bidîna necm û Perwîn bêhicab

Zehre û ʿiqda Şureyya keşşifî bûn ew di şerq
Sayeya bextê me dayê ma li ser perde w niqab

Wajigûn dewrê numa min çerx û bayê lewleban
Kewkeban seyra muxalif girt û têtîl kir hisab

Vêk ketin Şems û Zuḡel îro di birca ʿEqrebê
Seyf-i çû destê Merîxê mulkê dil lew bû xerab

Lew tenezzul kir Merîxê nobe çû dora Zuḡel
Çû teref mihra sipihre nezzilî ʿerdan ʿezab

Lew bi şeş bircan ʿEtarid ji afitabê dûr-i bû
Lê Zuḡel bû Muşterî avête çerxê inqilab

Şewwişî neẓma nucûman heyʿeta çerx û burûc
Lew li weḡek dernetetin Mah û Zuhr û Afitab

Munqelib min dî menazil vajî ew seyrê dîkin
Yek bi yek xwîn jê dibarin ateş û lem^ç û şîhab

Zuhreçengê ev suwaj dî ew ji çeng avête çeng
Xweş li pê qanûnê wê guh de tu qanûn û rebab

Ez dibêm axirzeman e dê qiyamet rabbitin
Lew şeva tarî kişandî yû nehişt eswed xurab

Xweş li min^ç alem siyah ma stêr û kewkeb qeş neman
Ez ji vê rojê ditirsam axirî zû kir şîtab

Ev ne ew iqlîm e ya şems û kewakib tê bi seyr
Ez ne wê^ç erdê dibînim ya ko lê ew mahitab

Cinn û teyyarek mi dî werbû di min winda kirim
Dame ber pence w kulaban hilfirandim wek^ç uqab

Suflewî înam û avêhtim zemîna zulmetê
Lê ko hişyar im gelo yan xewn e min dîtî bi xwab

Dêwê mel^ç ûn û munafiq ê Xudê rûreş kirî
Ma bi bala hilkişetin^ç aqibet çî bit şelab

Ehremî te^ç lîm-i da bû Ebyedî dest tê hebû
Pir bi vê te^ç lîm û rayê hatibû çûbû xişab

Surperî illet nizanî siħreya Ebyedî dîkit
Pir xeleş erzana me dî derheq xwe ew^ç alîcenab

Ah-i eyyamên wişalê weko xweş borîn û çûn
Ew şeraba^ç eş û noşê ma li pêşber min serab

Şerbeta şîrînleban zehra helahil bû di nav
Lew bi narê firqetê axir li min dil kir kebab

Hudhudek xweşteb^c-i min îro divê herwek nesîm
Da bi bal dilber hinara b'aniya dîsa cewab

Erq-i halê min bigota yê bi inwanê edeb
Asitan bikra ziyaret çetr û seywan û tunab

Da di çeşman min werîna xak-i herwek tûtiya
Ya hebîb pê lê nihaî b'aniya wî ew turab

Her kesê rabî di beşê carekê mehder bikit
Xeyr-i heftî hec didêrit belko bihtir ew şewab

We^cde dabû dê şehîd kim wî bi şîrê xwey şerîf
Ma nebî îro peşîman ew ji tedbîra şewab

Şerh-i halê min Mela narit beyaqê hê tamam
Vê sewadê gerçi herdem jê birin şed intixab

Bab P (pê)

Bab P (pê) 13. Lew seher cewlan didit bayê şebayê rast û çep

Lew seher cewlan didit bayê şebayê rast û çep
Sosin û sinbil bi mestî bèn semayê rast û çep

Da ji mihraba du nûnan secde bit Eswed-hecere
Dil bi mîzan mahê new ebrû numayê rast û çep

Dil ji biska filfilîn bû fir dida xala siyah
Şehperê zulfa şepalê dalê dayê rast û çep

°Alemek wêranê zulfên te ji rengê °enberê
Çerx û perwazê didin carek li bayê rast û çep

Xencer û tîr û teber barîn şubih berq û birûsk
Mişriyan lami° ji elmasan didayê rast û çep

Ṭeyrik û °iqd û şerab û netrik û berg û wereq
Her bi lerz û cezbeyên yaqûtê tayê rast û çep

Bişkoyên benda girîbanê ji rengê kewkeban
Berq û tîr û jîn ji Xwirşîdê vedayê rast û çep

Kewkeb û qewsê qezeh lû°lû°ê benda heyderî
Tên tewafa zulf û xalên dilrubayê rast û çep

Dil dixwînit zulf û xalan dêm û balayên ji nûr
Her bi qanûn mujdeya xeybê ji nayê rast û çep

Zengiyan cewşen vebestin pêşberê coqa hebeş
Daberistin yek bi yek çûn ber liwayê rast û çep

Çingaçinga bişkowan awaz û dengê zergowan
Şed melayik guh didin ber wê newayê rast û çep

Lew ji îşqa wê dinalin bazin û berg û wereq
Cezbeya dil min ji remza wan gihayê rast û çep

Zuhre û îqda Şureyyayê di şerqê keşşifin
Leyletu l-qedrê ji mexrib perde dayê rast û çep

Zuhrerengê Mah û Xwirşîdê ji bala wê numa
Lew du kewkeb çûne vê ra istîwayê rast û çep

Bête eywanê ji xelwê horiya qudsî-sirişt
Şed hezaran hor-i qudsî tèn liqayê rast û çep

Ma Melayî ez lebê le' ab-i heywan bit neşîb
Qudsiyan ragirtiyin destê du' ayê rast û çep

Bab T (tê)

Bab T (tê) 14. Nêrgizên şeng-i di mest in çep û rast

Nêrgizên şeng-i di mest in çep û rast
Saqiyan cam-i di dest in çep û rast

Rast û çep tèn ceger û sîne kulab
Êrêrên şeng-i di mest in çep û rast

Tûx û ʿala ko xwiya bûn ji ʿecem
Êreban tîp-i şikestin çep û rast

Ber vi şerqê di seher westayî yin
Hindûyên roji-perest in çep û rast

Qeyserê Romê li serheddê firing
Top û zincîr-i vebest in çep û rast

Herdu destên xwe hemail şevêkê
Me ji bo yarê dixwest in çep û rast

Ve Melê surperiya horîşifet
Şed melek dest-i bi dest in çep û rast

Bab T (tê) 15. Ger ji wê ھorîsirîştê ʿîşweyek îzhar-i bit

Ger ji wê ھorîsirîştê ʿîşweyek îzhar-i bit
Dê bibit narê Xelîli l-lah û dojeھ sar-i bit

Wer ji ber perdê yedê beyda bi muʿciz bête der
Şems û kewkeb dê hilên ʿalem teji enwar-i bit

Wer ji ʿeksa xemriyan qewsê qezeھ dit yasemîn
Dê gul û reyھan bibarin têk û têk gulzar-i bit

Şemʿ-i dê can dit ji şewqê bête ber şubھê nefes
Narî axir ger bi mûyek beھşê zulfa yar-i bit

Silsila beھşê ji xwîna dilber an zulfa biçîn
Dê xeٲa bit navê misk er nafeʿê tatar-i bit

ٲoqê gerden ھelqeyê zunnarê zulfa yarê min
Dê kilîta kelbê ʿîşqê ھelqeya zunnar-i bit

ʿEqdê îھramê di ʿîşqê da ko pîrê ʿîşqê best
Dê çî xem ger xerqe rehnê xaneʿê xemmar-i bit

Gezmeyek qewsê şevên ʿaşiq bi nîva dil kevit
Dê ji can destan bişût xasma kevan nûbar-i bit

Wer ji qewseynan bi mîzan bêne der cotek xedeng
Dê ceger bit pare pare sîne tar û mar-i bit

Xwîn ji mîlakê bi derba xencerê ger bête der
Bo şehîdê ʿîşqê êdî dê ji kû hişyar-i bit

Dê ji wan leʿlan şifayê dil bi qanûn ʿelbe kit
Da îşaret xweş bikin herçî kesê bîmar-i bit

Bilbilê mecrûhê ʿîşqê ʿaqeta xaran nihin
Dê kulafa rîşê sîne bişkowek bêxar-i bit

Her dilê bazîşifet dê şeydê teyʿûnek we bê
Firr û perwazê humayî penceyê şûnqar-i bit

Yar-i dê hakim bitin qewlê reqîban guh nekit
Şahê mulkê dilberî dê faʿilek muxtar-i bit

Dil bi zulmê naşojî, ʿenc û xet û xal in di dil
Xeyrixwahên dewletê mîrî ji wan guhdar-i bit

ʿeyrê dil bê temʿekê nayête dest şehzadeyan
Qûşçiyê şahîn di destê wî di bêazar-i bit

Bendeʿê Baxwey bivêt dê meylê sîm û zer nekit
Da ʿetaya padişahan bê hed û ijmar-i bit

Sar dibit dil ma bi şed cewr û cefayan ʿerreyek
ʿîşq-i ʿetnar e hingî dê biçit dijwar-i bit

Leşkerê ʿalem meger yekser te dijmin bin Mela
Xem bi mûyek nakişînî ger te dilber yar-i bit

Bab T (tê) 16. Qelbê me şubih zêr e ji feyda te cela girt

Qelbê me şubih zêr e ji feyda te cela girt
Ma rûsiyeh û şifri-şifet reng-i şefa girt

Teşbîhê bi cedwel me di nêv ateşê îşqê
Dil qelbê heqîqet bit û iksîr-i hema girt

Salik kî ye hatî ji mecazê bi heqîqet
Şûret ne şinasî yû bi me^cna ne fena girt

Tenha ne li min lami^cê husna te şefeq da
Alem bi xwe wê husn û cemalê di xwe da girt

Teyxûn-i di destê te zehê dewlet û iqbal
Herçî te birî dam-i di tora xwe huma girt

Canê xwe me kir dane^oê dava ko vedayî
Ahûşifet ew pê hissiya rahê xeça girt

Enqa ne şigara kes e davan tu biçîn ver
Dava ko li enqa tu vedî bad-i hewa girt

Herkes seherê talibê tişteki bi çimen hat
Hin sosin û hin sinbil û hin zulfê duta girt

Destê me seher girt û birîn seyrê hebîbê
Fi l-hali reqîbî ji hesed lerze û ta girt

Ew kebkê xeraman ko di kozê li qebo hat
Şahîne qeđayê bi teẓaful ji xwe ra girt

Zinhar-i kesê dest-i bibit erqemê serwê
Bê işweyê lelan ne bi teslîm-i jiha girt

Şebrê berê şîrîn e we ustad-i xeber da
Lew dil me bi tehlî yû xeman xurrem û şa girt

Her neşter û şewkên ko hebîbê me li dil da
Min yek bi yek û têk-i li derdê xwe şifa girt

Âşiq ji xemê saye wê camê teleb kir
Pir eql-i didêrit me ji qismê hukema girt

Şef şef ne tinê gezme dibarin ji kevanan
Dil kagul û zulfan di kemendê bi teba girt

Dîwane²-i her tête di vê silsile û bendê
Ko mustehiq e Xwisrowê xoban bi ceza girt

Peyweste du fêris ji me ra daberizîn dil
Zulfan bi çep û rast-i li oxilme cema girt

Qewsê du hilalan ko li ser Bircê-esed bit
Bû şuhre di amê emel enguşt-i numa girt

Şi^cra te Mela sihr-i şekerrîz e bi mu^ciz
Zanim ji lebê le^lê te ev lefz û eda girt

Bab T (tê) 17. Mehbûbê bi dil bit me bi evraz-i çi hacet

Mehebûbê bi dil bit me bi evraz-i çi hacet
Enqa bi xwe bêtin firr û perwaz-i çi hacet

Ney dûr e hebîbê me çi firyad û fişan kîn
Wê guh li demîra dil e awaz-i çi hacet

Go suxte murada xwe ji min telbe ke îro
Min go ji kerîm telbe û daxwaz-i çi hacet

Min nale refîq in xem û tehlî ne muşahîb
Firyad-i enîsê min e demsaz-i çi hacet

Dildan û newaziş çi ne duşnam-i bes in min
Pir derd û cefa hürmet û i'zaz-i çi hacet

Şuħbet bi mey û çeng-i hebîbê me bivêtin
Firyad û fişan mi ne bes saz-i çi hacet

Razên me çi hacet weko xemmazî bizanin
Eşkên me bes in dîde³ê xemmaz-i çi hacet




Herleħze çi hacet ko bi nazan bikujî min
Cana ji xwe qurbana te me naz-i çi hacet

Ta çend-i bi hecra xwe tu min tecrîbe îni
Zêrê ji xwe xaliş meħek û gaz-i çi hacet

Ḥacet niye cana yedê beyda bi deranîn
Inkara di dîn da nebit i^ccaz-i çi ḥacet

Esrarê ezel dê di ebed bêne zuhûrê
Encamê serencam-i ji aḫaz-i çi ḥacet

Ger lû³lû³-i menşûr-i ji nezmê tu dixwazî
Wer şî^crê Melê bîn te bi Şîraz-i çi ḥacet



Bab T (tê) 18. Kes bi dada me nepirsit gilleh û dad-i çi kit

Kes bi dada me nepirsit gilleh û dad-i çi kit
Te nebit dadiresek beyhûde firyad-i çi kit

Bi Şîrînê negehit dest-i eger Ristem-i bit
Dê bi bazo û milan şubhetê Ferhad-i çi kit

Fa'ilek lazim e da fi'l û eşer peydae bit
Ger tu heddad-i nebit kûre^ê heddad-i çi kit

Mumkinêk dê hebitin da ko teheb haşil bibit
Şeyd û nêçîr ko nebit tole^ê şeyyad-i çi kit

Her gil û seng dibitin zêr-i bi tedbîr-i hekîm
Qabiliyyet ko nebit hikmeta ustad-i çi kit

Kan bi gewher çi bikit gewher eger pak-i nebit
Tu beşîret te nebit sîreta ecdad-i çi kit

Zêr û zêwer dikirin celb-i qulûban haşa
Husn û sur zâtî nebit qameta meyyad-i çi kit




‘Aşiqê mest-i bi ‘işqê niye hacet bi meye
Waridê warid û ehwâl-i bi ewrad-i çi kit

Te xereq vêkketina yek weliyek murşid-i bit
Salik û talibê irşad-i bi Bexdad-i çi kit

Cehde û se^cy û teleb bê eşerek şafi nehin
Tu ne bêperdenişîn çaker û qewwad-i çi kit

Çi eşer dê li berê xare bikit qe^re³ê ab
Qelemê me bi du sê qe^rey³ê zuhha dê çi kit

Dê ji heq cazibeyek dil bigirit wer ne Mela
Ji ezel ger tu hidayet nebit irşad-i çi kit



Bab T (tê) 19. Ewwel ko yarê da me yek zerreyek ʿinayet

Ewwel ko yarê da me yek zerreyek ʿinayet
Qismet me xemr û cam e di deftera hidayet

Husn û cemala canan nadêritin tu payan
Herçi nebit bidayet eşla nehin nihayet

Feyda ʿulûmê hikmet cama şedef ko gêra
Me ji destê muxbeçan dît bi mişhef û bi ayet

ʿArif heta nenoşî ji destê meyfiroşî
Xaib nebû ji hişî peyda nekir wilayet

Gunah û zuhd û tamat hîlnagirit xerabat
Kesê bi vî derî ret divê bikir ri ʿayet

Îşqê ji herdu çeşman ewwel di dil eşer kir
Lê zerre zerre axir şotin kir û sirayet




Şaki s-silaî herdem bi kuştina Melê bit
Gazindeyan ji kê kim ji kê bikim şikayet

Cama di destê şahid jengê ji dil dişûtin
Pîrê muxan ji rendan weh-weh dikir riwayet

Eṭwarê ʿişq û mestî esrar-i butperestî
Teqrîr-i şed riwayet nakit li bo kifayet

Li-yeṭme²inne qelbî ^çeynu l-yeqîn dibexşit
^çEynu l-^çiyân divêtin kafî nehin dirayet

Mîrî yû padişahî mûyek li nik Melayî
Nadim bi mulkê ^çalem yek zerreyek ^çinayet



Bab T (tê) 20. Er^cerxerama bi qedd û qamet

Er^cerxerama bi qedd û qamet
Yek bûse da me bi şed qiyamet

Yek bûse bexşî ewwel bi ihsan
Axir li min kir curm û xeramet

Ji jeng û zerqê dil da bişûtin
Cama şedef bên rend û keramet

Ji herdu çeşmên tey mest û xwînîz
Nûra du çeşman kê dî selamet

Li derd û êşan peykan û nîşan
Me ji herdu çeşman kifş in elamet

Riswayê işqê تنها ne ez bûm
Kes dî zemanan hub bê melamet

Du secde ferq in fi l-hal bibîn ber
Dema xwiya bin ew qedd û qamet

Da eybê rendan nekî bi badê
Nufûsu qewmin biha tesamet

Mela li umrê bêfeyde borî
Kêşa bi zor an qehr û nedamet

Bab Ş (şê)

Bab Ş (şê) 21. 'Umrê dayî' bû me bê dilber 'ebeş

'Umrê dayî' bû me bê dilber 'ebeş
Wey tevê 'umrê me borî ber 'ebeş

Dil emanet da bi naehlan nedî
Lê bi naehlan me da gewher 'ebeş

Da di seyra 'îşqê bê dilber neçî
Lê dibit seyra te bê dilber 'ebeş

Pir di pê weşlê me se'y û cehde da
Cehde û se'ya me hatin der 'ebeş

Ah-i wê kuştim bi derba xencerê
Ma di mîlakê diret xencer 'ebeş

Dil ji derba kaşowan bû parepar
Goy di meydanê dibit şed ker 'ebeş

Mehdera vî suxte'î îro bikin
Ez dibêjim nabit ev mehder 'ebeş

Kifş e me'na kî li lewî-sîm-i dî
Nuqte'ê misk û xeşê 'enber 'ebeş

Da Mela hişyar-i bî lê pir kesan
Sîne pir lê dane seng û ber 'ebeş

Bab Ş (şê) 22. Namê 'enberşikenê bêt ji 'enber meke beşş

Namê 'enberşikenê bêt ji 'enber meke beşş
Bil ji wê silsile û zulfê mu'enber meke beşş

Veke lêvê we ji nêvê biwerîn qend û nebat
Ji lebê le'leşeker bêj û ji şekker meke beşş

Bi ser enguştê 'eqîqê bide fincana rehîq
Abê heywan te çi yin nav-i ji kewşer meke beşş

Zeriyên şehla û durdane bibin şahidê bezm
Ji genimreng û siyehçerde û esmer meke beşş

Dê bişaret bi işaret ji neyê bête sema'
Tu ji nayê di sema'ê bike bawer meke beşş

Bi wê nihâlê bi deraxûş û bidê canê şirîn
Şaxê 'umrê bixwe ber jê we ji Qeyşer meke beşş

Ayeta husnê mufeşşel ke ji keşşafê cemal
'İlmê 'işqê bike tefsîr û ji defter meke beşş

Razê dehrê ji sipihre tû nizanî bi cedel
Hikmeta dawer e tu j' hikmeta dawer meke beşş

Ab-i heywan te divêtin tu bibe hemrehê Xuđr
Cama Cem bîn û ji Dara û Sikender meke beşş

Ji ezel^c aqibeta karê ko me^clûm-i nebit
Cama mey noş û ji teqdîra muqedder meke beşş

Dil yarê me nebû nerm-i bi şed ab-i girî
Ji dilê dilbera ma û berê mermer meke beşş

Tîr-i şed têne ceger sîne li ber maye çeper
Ji dil û cergê kul û sîneyê kerker meke beşş

Şîrê elmasî kişînit tu ji lami^c de xeber
Vekirit hûqqe^e yaqût-i ji gewher meke beşş

Ji şefeq Zuhre xwiya bit tu binê perwînan
Cebhetê ew binumêt tu ji meh û xawer meke beşş

Li rûyê yarê du meh new me qeran dîne di mest
Tu ji seyra qemerê tali^c û exter meke beşş

Pir ji dêm û xet û xalan te xeber daye Mela
Nezerê wer bide bejnê ji mufesser meke beşş

Bab Ş (şê) 23. Tu sehergeh bi temaşa were bazarê hudûş

Tu sehergeh bi temaşa were bazarê hudûş
Lê te bêfa³ide azar-i nedit xarê hudûş

Da ji dil xunçelebek nazik û terdane bijîrî
Bi tebessum bi te ra bête ji gulzarê hudûş

Şed girih min di dil in lew ko çep û rast-i dikir
Şahê husnê qidemê zulfê girihdarê hudûş

Bil ji sulţanê qidem min bi tu iqrar-i nehin
Ger li kaba me nehin metqeb û bizmarê hudûş

Dil di deryayê qidem qaf e bi şabit qedem î
Gerçi da³im li serê ferqe me minşarê hudûş

Belko dîwar-i bi guh bin bi Xudê kî bi Xudê
Bi tu rengî nekirî eşkere esrarê hudûş

Lem^ceyek ger ji kinarê qidemê pertewê dit
Dê ji ber wê se^cetê mehw-i bin enwarê hudûş

Wê bi şed pencereyan daye şî^ca^ca qidemî
Gunbedê îşqê li ser kursiyê dewwarê hudûş

Tu hudûşê we mebîn qenc-i nezer dê carekê
Li esasê qidemê daniye dîwarê hudûş

Here eşlê xwe we tertîba qiyasê jê ke
Ger nizanî çî ye yekcarê berê darê hudûş

Ateşê îşqê wucûdê hel dîkî şubhetê zêr
Heye mumkin nefîrî zîbeqê ferrarê hudûş

Ellah Ellah ko di umrê xwe tu carek nebihî
Çî şeda têtê jî vê gunbedê dewwarê hudûş

Tu jî ber perdeya wehmê were der da bibihî
Çî newa têtê bî şed nexme jî ewtarê hudûş

Hal û musteqbel û maqî di xwe da têk-i yek in
Şubhê mewcûd e bî eynê xwe di êvarê hudûş

Rast û çep gav û se'et her li me ew datînit
Zu l-feqarê qidemê heyderê kerrarê hudûş

Rast û evraz û nişûvî me biwarin yek û yek
Lê tinê wê li me bû da'îre berwarê hudûş

Dê li qelbê me çî dit lami'eya islamê
Ko li canê xwe me xef bestîye zunnarê hudûş

Reng û jengê hedeşê neqşê hudûşê me di dil
Bide ber rendeşê îşqê ew e qeşşarê hudûş




Can li ser destê nihayî di riya canan-i da
Rûhê şef şef ko vewestane di bazarê hudûş

Dê jî xeflet biretin saya zewalê ey dil
Rûnenî da tu emanet li siha darê hudûş

Tu ji feşlê here eşlê ko di vê dêra xerab
Da nebî merkebê cehlê tu di bin barê hudûş

Da nigarê xwe bi şed rengî bibînî îro
Were carek bike seyrê tu di eţwarê hudûş

Tu bi  alê me dizanî  i ye herle ze Mela
Me di dil têt û diret xencerê  eddarê hudûş



Bab C (cîm)

Bab C (cîm) 24. Şimşad-i xeram û serw-i xennac

Şimşad-i xeram û serw-i xennac
Canan dibirit bi işwe tarac

Min dî seherê di xewab-i mestî
Bê deng tezeru û lal-i durrac

Bişkiftî ji xunçe nêrgiza mest
Bû ferq-i ji ser qedîfe dîbac

Cebhet keşifi ji şubh-i şadiq
Nûrê ko veda li ser şebê dac

Elmasî numane şubhê mişrî
Danîn cegerê me dil kir amac

Nesrîn û binefşe tewwizandin
Mawerd direşand-i şûşe^ê ac

Cohtê hebeşan bi-terfeti l^ceyn
Anî qederek ji Espehan bac

Sîma ko numa nema li hiş sîm
Sîmab-i ji xecle ma ji ixrac

Mir'atê sikenderî li pêş e
Behrun we-lehe l-^cukûsu emwac

Dora qemerê ji ber şefeq da
Ko spêde li ferqê ser niha tac

Çerxefelek û melek dibazin
Şemsun we-kewakibun we-ebrac

Zuhre bi qeranê qab-i qewseyn
We- n-necmu îza hewa bi-midrac

Dengê melekan zimêhne zimzim
Erwaḥ-i ji ^cişqê tene mi^crac

Dil beḥr e we şed hezar-i mewc in
Zahid çi xeber ji beḥra mewwac

Borî we bi xencekê Mela kuşt
Ew xunçeleba delal û xennac

Bab C (cîm) **25. Dil ji °ilacê ko bi der ket mizac**

Dil ji °ilacê ko bi der ket mizac
Dê ji lebê noş-i °eşa bit °ilac

Ayîne°ê camê cehanbînê Cem
Bade°ê le°lî ne di cama zucac

Ji ava heyatê bi me da şerbetek
Zinde kirîn ma ji °edû ra neşac

Bend-i kirim gerçi şubih fîl-i bûm
Sîmiberê sa°id û bazo ji °ac

Exterê iqbal û meha birca bext
Mihra sipihre kemer û text û tac

Kos-i ko hingaft-i bi şahî li text
Padişahan neqdê rewan dan xerac

Xwistrûyê Şîrîn-i li derbendê husn
Sîmiberan lazim e lê mehr û bac

Sikkeyê şî°ra me bi navê te hat
Lew bi °iyarê di cehan da rewac

Abê rewan min diye şî°ra Mela
Yunkiru li-lma°i li-sû°i l-mizac

Bab C (cîm) 26. Dîsa ji nû bêhal e dil

Dîsa ji nû bêhal e dil
Saqî werîn cama zucac
Muştaqê xemra al e dil
Lê xweş-i anîbit mizac

Saqî ko dêm mehweş bitin
Kagul ji şêva reş bitin
Qerqef bila ateş bitin
Em dê bi wê dil kîn îlac

Da em bi wê dil hey bikîn
Pê sîne daş û key bikîn
Şed menzilan pê tey bikîn
Ew dê di seyrê kit rewac

Bê nûr û narê muhbetê
Bê neqş û şunê qudretê
Naçîn meqamê weşletê
Nûrun lena we- l-leylu dac

Ev narê sîqala dil e
Da'im li wê qala dil e
Newroz û sersala dil e
Weqtê hilêtin ew sirac

Hetta bi nûra badeyê
Rengîn nekî seccadeyê

Dûr î ji wê şehzadeyê
Durdaneya gerden ji °ac

Durdaneya gerden bilor
Reyhan ji ser werdên di Cor
Hey hey bi mestî tene dor
Xala li nik ferqê bi tac

Mihra te pir ebter kirîn
Xalan ji ber biskan derîn
Zulfa muselsel °enberîn
Çîn çîn ji Çînê tete bac

Tenha ne Kurdistan didin
Şîraz û Yeng û Wan didin
Her yek li ser çehvan didin
Ji Espehan têtin xerac

Çehvên belek qewsên helek
Çerx û felek xalib melek
Fî hubbiha °umrî delek
We-l-ħubbu yecrî fî °ucac

Şahid hezar reng xemmilîn
Reş û sema pê kemmilîn
Îro Mela em şed dil î
Saqî werîn cama zucac

Bab H (hê)

Bab H (hê) 27. Pir meke israfê di qetlê mubaḥ

Pir meke israfê di qetlê mubaḥ
Sefku demi l-^caşiqi ma la yubaḥ

Sîne bi destê xwe mubarek veke
Te^crife kem fî kebidî min ciraḥ

Dil ji hewayaya te di fikrên di hûr
Fî lucecin beyne ḥubûbi r-riyaḥ

Îşq ko giha kê we li ^ceqlê xwe ma
Yeftiku bi-l^caşiqi ḥusnu l-milaḥ

Dê du siyeh sirmeyê çehvên xwe kit
Xakê rehê yarê şeba her şebaḥ




Toz û xubara seherê ber çimen
Qed neşere t-tîbe we-bi-l-miski faḥ

Fêris û rimbaz-i gihan yek bi tîr
Eḥmedu fi l-beyni qetîlu r-rimaḥ

Bûsezenan her ki ber an asitan
Mekkene min cebhetihi la beraḥ

Ḥelle lehu l-qetlu bi-şer^çi l-hewa
Men keşefe s-sirre we-bi-s-sirri baḥ

Ḥusna edaya te Mela her ki dî
Şeḥe lehu enneke ^çeynu l-fişah



Bab H (hê) 28. Heyf di qeyda xak û gil bit ʿarifê çalakê rûh

Heyf di qeyda xak û gil bit ʿarifê çalakê rûh
Dê mucerred bit ko pertew dit ji new ew pakirûh

Qeyd-i xak û gil nebit da bêhicab û perde bî
Mişlê bedrê carinan têxit xusûfê xak-i rûh

Şem ʿ-i ser nûr nadirit ger ew nekit perhîza dil
Zewqa cama ʿiştqê nakit ger nekit imsak-i rûh

Dil bi tayek nêrgizan de, nazikek terwende de
Gul dikin teşbîhê xaran her xes û xaşak-i rûh

Cama ʿiştqê pakê rûhanî tûhûra baṭin e
Ê nenoşî her we ma ḥetta ebed napak-i rûh

Heyʿeta keyf û kemê bêkeyf e keyfa ʿarif e
Dê bimînit ger nebit naçar-i bê tiryak-i rûh

Dê bi gulzara cemala sebzipûşan wê çî kit
Ê di mihrê da nebit dil pare pare çak-i rûh

Ber ji can derrakeyek rewşenter û wala divêt
Şûretê ḥusna muqeddes da bikit idrak-i rûh

Ger xeberdar î ji sirra »kuntu kenzen« guh bidêr
Da bi şed torê beyan kit me ʿneyê »lewlaki« rûh

Lami^cê sirra tecellê ser li Torê dil didit
Debt-i nakit wê mecalê şed hezar eflak-i rûh

Herdu îlanên te dî min toqa gerden kir medam
Da mi her bêtin tebessum wek gula dehhak-i rûh

Cewherê husnê eda تنها dibit meqbûl-i teb^c
Ger ne şeyqel dit bi nûra işqê wek hekkak-i rûh

Dê bi vê endaz û terzê key dibit sihrê helal
Ger ne balateb^c-i bit wek pehlewani çalak-i rûh

Dil bi rim aviht û wî lê bar-i kir qewsê şevîn
Dê bidit ber gezmeyan bêsûc-i ew seffak-i rûh

Şehsiwar îro kemend avêhtine qelbê Melê
Bend-i nakit xeyr-i firtaka te şed fitrak-i rûh

Bab H (hê) 29. 'Işqê ko bidin bi yek du erwaḥ

'Işqê ko bidin bi yek du erwaḥ
Peyweste divê bi hev bin eşbaḥ

Can û cesedan ko ittiḥad in
We-l-ma^u lehu l-mizacu bi-r-raḥ

Weşla te li can û dil heyat e
Men z̄aqe merarete n-newa ṭaḥ

Tenha ne di sîne min xedeng in
Min leh̄zike fi l-qulûbi ermaḥ

Perwîn ji şefeq seḥer xwiya bûn
La bid^e we-fihi minke mişbaḥ

Lew mistu mine l-hewa ke-banin
La bid^e we-qed temîdu erwaḥ

Her şam û seḥer bi destê xoban
Min xemretina tedûru eqdaḥ




Suyyaḥ-i me dîn di xelwe îro
Ellah ko çî xelwe û çî suyyaḥ

Ifteḥ bi-liqake qufle qelbî
Fe-l-qelbu lehu liqake miftaḥ

Berqê ko veda ji ber niqabê
Fe-l-lami^c u min senahu qed laḥ

Qews û qezeḥan numan ji bala
We-l^c-enberu min şezahu qed faḥ

Ayîne dilê Mela cela da
Min tel^c-etihî fe-qed şefa r-raḥ



Bab X (xê)

Bab X (xê) 30. Ahê ji derd-i dil dikit

Ahê ji derd-i dil dikit
Herçî nedî azarê çerx
Derbê li nêva dil didit
Lami^ç şifet nûbarê çerx

Tên sîneyan peykan nihîn
Amanca wan tîran em î
Dama belayê der kemîn
Her guşê dor madarê çerx

Bîra xwe tînin xenceyan
Aşiq di nêv işkenceyan
Tavête dil ber penceyan
Herdem ji nû şunqarê çerx

Kû van leîfan gul^ç îzar
Şona gulan restîne xar
Lew tên ji bilbil ah û zar
Nêva cihê gulzarê çerx

Şed baziyan ev huqqebaz
Tînit bi hîle kar-i saz
Geh geh ko naz e û geh niyaz
Sehhar û pir mekkarê çerx

Herçî bixwînit şuhbetê
Axir di cama şerbetê
Zehra helahil dê detê
Da dil nedin azarê çerx

Ev erreya jehrîdidan
Min jê di dil danin sinan
Ma l'behrê ferqê duşmenan
Bêt û biret minşarê çerx

Dijmin ji can talan bitin
Ew xwe hero nalan bitin
Mîlak û dil kalan bitin
Lê bêt û ret xeddarê çerx

D'ev kuhnexanê mişlê deyr
Çendîn kewakib têne seyr
Peykan bi davê şubhê teyr
Her jê dibarin narê çerx

Şemsê bi şemsê cam bi cam
Hetta dikin dewrê tamam
Ateş dirêjit her medam
Ev gunbeda dewwarê çerx

Agir di ab û gil dikit
Qelban ji qelban hildikit
Metqeb di can û dil dikit
Da'im evistin karê çerx

Çendî ko xoban bên rezim
Min jê di dil da nin gezim

Amanca wan remzan ez im
Ser^ceskerê seyyarê çerx

Min pir şevan hetta seher
Danîne rê sem^c û beşer
Ew mahirû ma bête der
Ta bême newbetdarê çerx

Kes dî li lewhê sîne qeş
Neqşek vematî bêxelet
Herdem ji nû yek tazexet
Tavête der pergarê çerx

Ma j'hesreta şîrînleban
Xew tete çehvan qeş şeban
Firyad-i der ber kewkeban
Pirsê bike j' bîdarê çerx

Van rehrewên himmetbelend
Berdane meydanê semend
Sergeşte yîn hetta bi çend
Ev rekbê meş^celdarê çerx

Gavek ji dengê zengilan
Êmin çi rûnîn menzilan
Hey hey dibînin mehmilan
Firyad e her qentarê çerx

Pir min ji vê çerxê Mela
Kêşane afat û bela
Ebleh dibînim wî hela
Herçî ji dil bit yarê çerx

Bab X (xê) 31. Dilberê îro seher

Dilberê îro seher
Avête cergê min du dox
Yek li sîne yek li dil da
Lew ji min tên ax û ox

Ah û oxên min ji dil tên
Lê ji ber tîra qizil tên
Yan ji kovanên di kul tên
Jê dizêt her xwîn û zox

Xwîn ji dil co co rewan tê
Wek [°]eqîq û erxewan tê
Lê ji dest selwa ciwan tê
Ew şepala şeng û şox

Ew şepala şox û şeng e
Kafira rom û fireng e
Dame ber cotek xedeng e
Zalimê kuştim bi dox

Zalimê kuştim şepalê
Nazikê qencê delalê
Bûn hicaba zulf û xalê
Îdek û [°]ala û tox

Netrik û tayên bi rîşî
Ê di zêr in pê ve wîşî
Min du fêris dîn di pêşî
Murwe û inşafi yox

Lew heriftim ez ji meylê
Şubhetê sehlê we seylê
Muḥbet û ʿiṣqa di Leylê
Ez kirim yekser pilox

Dest nehêlim ez ji dînê
Şubhê Ferhad û Şirînê
Wer ji ber ʿiṣq û evînê
Min di rê çit ev kilox

Şuḥbeta çerx û sema tê
Wek Melê şed mubtela tê
Zemzem û ava ḥeyatê
Muşterî şed şeyx û şox

Bab X (xê) 32. Heyheya reqş û semaya te çî xweş bestiyê çerx

Heyheya reqş û semaya te çî xweş bestiyê çerx
Ko di bircê bi sema têt li ser destê xwe berx

Şofiyên her di tewafê Heceri l-eswed e qeşd
Gul û sinbil bi sema têt hemiyan zimzim û çerx

Neqşê elmasî li elmas-i binê girtiye herf
Xeşşê yaqûtî li yaqût-i şikênandiye nerx

Kerixîn em di qiyamê me ji dil perde dirand
Arifê weqt im û Me'rûf-i bila bête ji Kerx

Da binasî xeterên rê tu nebî xafil-i jê
Dicle ye lê di pir in bir birê pêl û ber û merx

Pîrê şe'ar e di şîrê we Melê şalifiroş
Tu nişan min mede Ferxî ko li nik min bûye ferx

Bab D (dal)

Bab D (dal) 33. Sirrê wehdet ji ezel girtiye hetta bi ebed

Sirrê wehdet ji ezel girtiye hetta bi ebed
Waħid û ferd e bi z̤atê xwe wî nînin çu  eded

Di qidem da ezel û  eynê ebed herdu yek in
Sermediyyet we dixwazit ne ezel bit ne ebed

Ferq e waħid ji ehed lê di meqamê şemedî
Bi heqîqet ko yek in herdu çî waħid çî ehed

Yek e derya tu bizan qenc-i çî mewc û çî hebab
Di eşil da ko hemî av e çî av û çî cemed

Afitabê ehediyet di xwe da girtiye kewn
Ne ko  ewrek heye lê girtiye çehvên me remed

Ĥusna z̤atê but û latan ji cemala şemed e
Ji mişala şenemê we ko tecella ye şemed

Ĥeyrê derya niye şehra bi heqîqet emma
Ji rûyê keyf e ko ev ave bûyî şubhê zebed

Kulle yewmin huwe fî şe³nin nebî xafil-i jê
Her peyapey ji şu³ûnan dikirit feyḍ û meded

Ger di Adem bidiya sirrê ʿilim Iblîsî
Hînema ebşerehu kebbere hînen we-seced

Çi zeman û çi mekan û çi cihat û çi hudûd
Çi meqadîr û tefaşîl û hisab in çi ʿeded

Çi munafat û luzûm in çi qiyas û çi mişal
Ev çi tewlîd û çi terkîb e çi rûh in çi cesed

Ser bi ʿiczê didirit quwwetê derrakeê ma
Rece l-ʿeqlu kelîlen we-meta qame qeʿed

Hîret û ʿicz e serencam-i di babê nezerê
Key bi xaliq nezerê qaşirê mexlûqê resed

Guftûgoyê meʿrifet çendî Mela peyda bikî
Gewhera meʿrifetê nagihetê kes bi xired

Bab D (dal) 34. Êd e û herkes ji dîdara te lê pîroz e Êd

Êd e û herkes ji dîdara te lê pîroz e Êd
Ez tinê mehrûmê dîdar im bi şed menzil be Êd

Her seher dihnêrim ez cana bi ahan ra ji dil
Bareke l-barî bi-is'adin 'eleyha yewme Êd

Dergehê lufta te xanim ma li mehrûman vebî
Inne kelben başîten dehren zîra'en bi-l-weşîd

Pîremerd im 'aşîq im îro murada min bibexş
Ya hebîbî ya muradî ya muna qelbi l-murîd

Ferre 'eqlî min lehîbî mişle bazin ew 'uqab
Zabe rûhî mişlema inhelle fî narin celîd

Dem 'u 'eynî min buka'in mişlu nehrin fî sukûb
Naru qelbî min xeramin fî dîramin fi l-weqîd

Dil ji ber narê mecazê bi-l-heqîqet bû pereng
Naru qelbî fî hewahu mişlu narin fi l-hedîd

Key xilaş ez dozexê hecrê tu ya bim ey ciwan
Her nefes dared şela û ne'reê hel min mezîd

Kî dizanit min ji rimbazan dema oxilme tèn
Têne di şed rim ji wan û sîne têne şed cerîd

Min ji şeffeynan ji nêva meqtelê rim têne dil
Lê li wan destan nihin xwîna xezaya ez şehîd

Mişhefa husn û cemalê sûreta xal û xeşan
Ma telewna xeyre herfi la we-Qur'anin mecîd

Gerçi her da'im ji mihrê neynika dilbedre min
Wek hilalê şubhê têm ez carinan bim napedîd

Ma bi le'lên canfeza navê me bînit carekê
Bi-d-du'a bellix teheyatî li Selma ya berîd

Tu j' Melayî her bipirs esrarê 'îşqê hel dikit
Vê mu'emmayê çi zanin şed mela û muste'îd

Er bi kuştin wer bi hiştin emr û fermana te bit
Ehmedu 'ebdun reqîqun waqifun beyne l-'ebîd

Bab D (dal) 35. Neyşekera gerden ji ʿac

Neyşekera gerden ji ʿac
Dîsa ji reştûzên şemed
Qewsên li bala ferq û tac
Keyber reşandin bê ʿeded

Keyber reşandin bêhisab
Mişrî ko dan sîqal û tab
Şed Ristem û Efrasiyab
Kuştin li wan ker kir cesed

Şed padişah û Xwisrûyan
Can dan ji ʿişqê we rewan
Nisrîn û lebsê erşewan
Min dîn li bejna serwiqed

Min dîn li bejna ʿer ʿerîn
Tayên zabad û ʿenberîn
Bayê şeba da çenberîn
Zulf çûne ser nûra şemed

Zulf çûne ser nûra zelal
Carek were bayê şemal
Biskan ji ser dêmê vemaal
Zulfan ji ber cotê esed

Sehharê cohtê cadûyan
Îro ji remza ebrûyan
Dil girt û da ber kaşoyan
Ker kir li miskînan kebed

Dil girt û da ber xenceran
Kuştim nigar û dilberan
Me j' destê zulma esmeran
Dad û meded dad û meded

Dilber ji le^lên xwey şefaf
Da min meya gulgûn û şaf
Deryayê 'îşqê qaf û qaf
Peyweste têtin cezr û med

Husna munezzeh bê mişal
Ser de libasê xetî û xal
Sergeşte heyran ma û lal
Ehmed ko dî nûra şemed

Ellah ji nûra sermedî
Yek qetreyek da Ehmedî
Şîrînî yû remzek we dî
Medhûş-i ma hetta ebed

Bab R (rê)

Bab R (rê) 36. Ah-i ji destê wê sirê dil ji meyê hewale kir

Ah-i ji destê wê sirê dil ji meyê hewale kir
Herçi li min kirî Mela cama meya duşale kir

Şengê bi naz-i meşsiha misk û zûbad-i weşsiha
Rûy ma dibin piyane hêj zêde li min delale kir

Çîçek û gul sehergehan nesterenên di xergehan
Têk-i ji misk û mawerê mahê xwinav û jale kir

Dêm-i di bisk û xemriyan ta û lefên di şetriyan
Mane tamam-i kesik û şor bedre li dorê hale kir

Dûr-i kirîn ji sinbilan çîçek û bişko û gulan
Dil me ji rengê bilbilan şubhetê daş-i lale kir

Pîrê muşan ji şîşeyê da me sefînekê meyê
Şukrê Xwidê ko qulzemek min ji xwe ra qubale kir

Xuđrê bi remz û mu^ccizê mest-i me dî di dengizê
Hat-i peyaleyek di dest eşkere şed peyale kir

Ûnçebeba ji reng gulê dêmê bi sir numa Melê
Şubhetê bilbilan seher lew me fişan û nale kir

Bab R (rê) 37. Derê meyxaneya 'îşqê seher 'arif ziyaret kir

Derê meyxaneya 'îşqê seher 'arif ziyaret kir
Bi ab-i çeşm û xwîna dil wuđû best û tehareet kir

Werîn cama hilalê da ji 'eksê mah-i new bînî
Ko xanê mihr û cergê çerx û xewanê roze xaret kir

Bi mîzan qewsê mahê new li wechê dilberê min dî
Ji çeşm û guşê ebrû bi dor camê îşaret kir

Bi ebşaran nezer min çû ji çerxê qewsê ebrûyan
Şukurxaz în ko çehvan karê ber 'eyn-i beşaret kir

Ji ber dêmê niqab avêt û destûra tewafê da
Di se'yê Beyt û îhramê we min eswed ziyaret kir

Di dîdarê hezaran can nişarê meqdemê yar in
Kesê canan bi can bînit di 'îşqê wî ticaret kir

Bi dînarê dinê zinhar da yarê xwe tu nefroşî
Kesê Yûsif firotî wî di 'alem da xesaret kir

Tinê ew secdeya şukrê te bir mihrabê qewseynan
Ko delq û şeml û seccade bi vê avê qesaret kir

Di beşşê le'l-i leb her xam-i narit teb'ê elmasê
Welê te'şîr û feyde mihrê tedbîrê heraret kir

Di i'cazê beyanê da suxen ger bête inşafê
Dizanit muxteşer her kes Melê sihre'ibaret kir

Bab R (rê) 38. Xelqo li min kin şîretê

Xelqo li min kin şîretê
Ew dilbera zerrînkemer
Min dî di halê xefletê
Hat der ji bircê wek qemer

Hat der ji birc û penceran
Dil girt û da ber xenceran
Ev reng e halê dilberan
Lew aşiqan xwîn bûn ceger

Qelb û ceger min bûne xwîn
Lewra ko nû der bûn birîn
Ey can were halim bibîn
Wer rûh ji qalib bête der

Canê min er bê ser cesed
Mizgîn bi afaqan resed
Alem hemî pê bin hesed
Insan û cinn û caniwêr

Alem hemî têk bûne şef
Seyrîn li şahê min bi xef
Hatin temaşa çar teref
Şatir xumar tayên di ber

Hat padişahê pir sipah
Qamet elif dêm şubhê mah
Dad û meded şed ah û ah
Zulf û eqarib tene ser

Gestî me xelqo  eqreb 
Mest im ji  ewqa  eb eb 
Tali   tin  mi d'kewkeb 
 ro  eqarib t ne der

 ro  eqarib hate xwar
 u n v-i bax  gul  izar
Ew bu  eya her l  bihar
Lew bilbilan l  qal    er

B  hed ji dil nal    keyb
Di ew bu  eya ri wan   eyb
Van naliyan n nin  u  eyb
 oht ne em dil b  seqr

 otin li min cerg   hinav
Werd n di h r girt  xwinav
Zulf hate ser l  kir bilav
Bay  nes m weqt  se er

Tirsim muxalif ba det 
Zulf n di dora cebhet 
Rakit qiyam w  sa  et ,
Alem bibit z r   zeber

Zahir dib jim pendig r
Da dil ned  zulfa  er r
 ubh  Mel  dim n  es r
Guh d re qewl  mu  teber

Bab Z (zeyn)

Bab Z (zeyn) 39. Cana ji cemala te muqeddes qebes im ez

Cana ji cemala te muqeddes qebes im ez
Ger xob û perîzade nezer kî te bes im ez

Mişlê mehê new ger te divêtin me bibînî
Mêze bike camê tu dizanî çi kes im ez

Yeşma ji me can kir ko tecellayê li dil da
Min rûhê di qalib tu yî تنها qefes im ez

Hubba te ye min radihejinî ko binalim
Şeb ta bi seher nale ji rengê ceres im ez

Min go mehê new çarşitiyê ebrûyê yarê
Go min çi hed e şubhetê ne'le feres im ez




Saqî ji ezel yek du qedeş bade bi min da
Hetta bi ebed mest û xumar û teles im ez

Cana tu yî min can gulê bêxar-i gerem bî
Minnet ko ne wek bilbilê mişnet ebes im ez

Şed cewr û cefa dî bi me naçîn ji derê te
Yekser tu nebat î we li tebê meges im ez

Ger we te divêtin bibirî ser bike ferman
Da vê se^cetê ser bibirim xweş meqes im ez

Ser ta bi qedem ez bişojim şubhê Melayî
Perwaneşifet şohtim û bê şewt û his im ez



Bab Z (zeyn) 40. Tor im bi dil û peyrewê Mûsa yim ez

Tor im bi dil û peyrewê Mûsa yim ez
Ateşperes û nûra tecella yim ez

Barî ji »we-[°]ellem« ko xeberdar-i kirîn
Îro tu bizan ademê esma yim ez

Inşa[°]ê [°]ulûmê ledunî çunke mi zanî
Zanî bi heqîqet ko çi inşa yim ez

Herfên reqemê lewşa wucûda mi bixwan
Da qenc-i bibînî ko çi imla yim ez

Zahir tu perîşaniya halê mi nebîn
Mecmu[°]ê di zâtê xwe we tuxra yim ez

[°]Alem çi ye i[°]rab û hurûf û kelîmat in
Ew nuqte di nefsa xwe û me[°]na yim ez

Şed Nîl-i we tèn û diderin qelbê me
Pê naşisihîn qulzem û derya yim ez




Tu ji nusxeya tewhîdê mexwîn ayeta nefyê
Bê aleta işbatê ko illa yim ez

Şed neql û riwayet di meya şaf-i mûyek
Îro ko ji pîrê xwe bi fetwa yim ez

Peyweste tu her bang-i mekî şubhetê ney
Bê yar û mey û saz-i mi go nayim ez

Herçî te bivêtin ji me wer can bi xwe bit
Cana bike ferwar-i vewesta yim ez

Şed şîş-i li dil dane ji mihrê me Mela
Lew her bi fişan mişlê ney û nay im ez



Bab Z (zeyn) 41. °Aşiq er carek ji bala lê bidit berqa mecaz

°Aşiq er carek ji bala lê bidit berqa mecaz
Dê li nik şahibdilan hetta ebed bit serferaz

Keşfa esrarê şifatan bêmehebbet nabitin
Şûretê esma divêtin da bikîn jê fehim raz

Lami°a husn û cemalê dê ji °ilmî bête °eyn
°İşq-i da jê hilbitin kê dî heqîqet bêmecaz

Husn û hub bê yek du nabin dê bikin şah û geda
Nûr-i nadit şu°leya Mehmûd-i bê şem°a Eyaz

Me°neya °işqê dizanî ayeta husnê bixwîn
Da tu herfên muhbetê yek yek ji hev kî imtiyaz

°Aşiqan bêgav-i lew kalîn ji dil tîn şubhê re°d
Wan ji bala lê dibarin wek birûskan remz û naz

Kê xeber dabit ji °işqê key ji ber westa girit
Gerçi rah ez zerre zerre sînesûz û cangudaz

Aferîn şed aferîn hê min ji wan ra aferîn
Ê ji tîrên dilberan da°im di dil peykan û gaz

Guh de awazê neyê weqtê sema tîn muşbeçe
Fehm-i razê ger dikî çawa dinalin çeng û saz

Ew dil-i min wek kebûter nabitin kes lewme kit
Lew di vê torê we da keftî me dîn şed şahibaz

Wer dilo da çîn temaşaya ciwananên çimen
Wê hilanî ser bi naz û sayeban dayê niyaz

Zulf û sinbil muşk-i bûy û bisk û sosin sirşirîn
Serwibala sebzipûş û kil nişan û xunçebaz

Nêrgizên qamet zumurrud sergiran hatin xiram
Çar-i eṭrafan bi ref ref lê bi meş tîn siy û qaz

Dil bi kê dim ez ji wan heryek bi xencan dil dibin
Dilrubayên canfezayên dilberên aşiq gudaz

Eqd-i ihramê dema dilber xwiya bê ferq-i eyn
Secdeyek ber wan du birhan nagirit cih şed nimaz

Îd e û mîrê me îro dergehê luṭfê vekir
Go Mela hingî bixwazî dê bidim bes tu bixwaz

Bab Z (zeyn) 42. Ji re'na nêgizên tey mest û xwînîz

Ji re'na nêgizên tey mest û xwînîz
Zeman bû 'ehdê ceng engîzê Cengîz

Te canê min divêt ey canê 'alem
Ji min bistîn bi le'lên xwey şekerrîz

Du 'enber bû li şimşadê bi mestî
Vebestin lew hewa bû 'enberamîz

Ji axa asitanê mistekê bîn
Li daşan da bibînim xweş şeba tîz

Tinê Ferhad dizanî lezzeta 'îşq
Ko wî can daye Şîrînê ne Perwîz

Teb û tabê hezar îşkence da dil
Ji şîrazî negahî mestê Tebrîz

Ilahî nêrgîza mey mest û nazîk
Ji destê xwar û bedxwahan biparîz

Ko lê têt ew qebayê asimanî
Le'îfa şeng û nazîk wek belazîz

Sewaşek rêhte dîsa 'alema dil
Bi cadoyê du çêşim fitne engîz

Xebaiş teb^c e ji ehlê seksirişt e
Yeqîn ew ker ji canan lew dikit bîz

Mela canê te çawan pehlewan kir
Li tayê xemriyan zulfa dilawîz

Ji husna bênişan nadî nişanek
Nişanî ger ji dil nek^ora te perhîz

Mebîn ev ger bi şûret ademî ne
Hemî dar in ji êgir ra kirî rîz

Bab Z (zeyn) 43. Tu dizanî bi Xudê min tu xiyal î şeb û roz

Tu dizanî bi Xudê min tu xiyal î şeb û roz
Bi xiyala xwe medam min tu li bal î şeb û roz

Her bi mîzan direşînî cegerê tîr û xedeng
Ji neseq şa'iqe me j'qewsê hilalê şeb û roz

Mişlê goyîn te rewan nal ji dilê miskîn-i tîn
Em nizanîn tu çira her we dinalî şeb û roz

Te bi firyad û fişanan bi xwe bilbil ker-i kir
Ellah Ellah ji çi derdî we dikalî şeb û roz

Da ko dilber qedemê lê binihed rewşen-i kit
Lew tu xwînê we ji çehvan vedimalî şeb û roz

Te tinê zewq û şefa kir bi şeyên dilberê ra
Sernixwîn geh şubê nûn geh weko dal î şeb û roz

Fetweya pîrî Mela yan tu bi ilhamê nebî
Vê meyê herwe dinoşî bi helalî şeb û roz

Bab S (sîn)

Bab S (sîn) 44. Şahidê cilwenuma qudsiyê feyrûzelibas

Şahidê cilwenuma qudsiyê feyrûzelibas
Heçî rengê te nişan dit tu nişanê xwe binas

Ĥusnê bê ayîne^ê eşqê tecellî nadit
İşqa Mehmûdî di me^ê na nemekê ĥusna Eyas

Herçî rengê te bivêtin xwe bibînî li-l-lah
Nezerê wer bide kasê çi xweş ayîne ye kas

Tew şerabê bi xerabê bi nehingan de demê
Dê kifayet bi çi rengî me bikin kûze û taş

Remz û razên ney û nayê ko sema^î ne hemî
Ji meħala te bi eşqlê xwe bizanî ji qiyas




Wê dikit meħlete herdem li ĥerîfan bi cedel
Bi du caman vedixwin sîretê Ebyed-weswas

Destigîrê te nebit Xuḍrê inayet li qidem
Nagihî ab-i ĥeyatê bi du eşker Ilyas

Tu binê mah-i new û destê qedayê heyihey
Ne li zerê felekê belkî li umrê me ye das

Tirkê xwînîz û xumarê me bi yek xemzeyekê
Zuhda çilsale li min zîr û zeber kir ji esas

Ji lebê le'le şeker yar qe nekir pirsê Melê
Mişriyan gezme reşandin ko kişandin elmas



Bab S (sîn) 45. Dil yek e dê 'îşq-i yek bit 'aşiqan yek yar-i bes

Dil yek e dê 'îşq-i yek bit 'aşiqan yek yar-i bes
Qible dê yek bit qulûban dilberek dildar-i bes

Min di benda zulfekê dil da bi destê pîrê 'îşq
Lew di 'îşqê da ko best ihram û yek zunnar-i bes

Terh û terzê bûne zunnar û çelîpa yek bi yek
Lew mi zunnar û çelîpa yek tinê yekcar-i bes

Hin ji nik dêrê ve tèn qesta kenîştê hin dikin
Ney ji van im ney ji wan im min derê xemmar-i bes

Gerçi tèn reqş û semayê her seher şed neyşeker
Min di bezma sirşirînan ew şirînrefar-i bes

Weh çi wala gewher in hatin libasê cism û can
Min ji wan hîrîsiriştan ew perî rûxsar-i bes

Hewce sihrê Samirî nîn in ko zulfa reş bikit
Çeşmê benda dilrubayan kagula 'eyyar-i bes

Bilbilan şed gul di çav in çav li şed gul dî dikin
Min di baxê gul'îzaran yek gul û gulnar-i bes

Min di baxê gulfiroşan dî 'eceb resmek xerîb
Xariţeb'an gul di dest in gulperistan xar-i bes

Ew cefa çû der ji hed zulma te bir hetta bi Çîn
Rehmkê carek nekî hey zalim ev azar-i bes

Ûerqê deryayê gunah î n teşneyê lufta heq î n
Rehmeta amirzigar û şefqê³ a xeffar-i bes

Ehlê dunyayê seraser dijminên min bin Mela
Piştemêrê min 'Elî bi, heyderê kerrar-i bes

Bab Ş (şîn)

Bab Ş (şîn) 46. Îro Mela serapa lew têk-i bû me ateş

Îro Mela serapa lew têk-i bû me ateş
Min dî seher xeraman neyşekera şîrînmeş

Ya reb çî turfe mêwe evrenge mey dibexşet
Şî^c ra me tê perîşan neşma me tê muşewweş

Dilgeşte min ji dêrê naçim kenîşteyê qet
Mihrabê wê bi min ra wer da biçîne Laleş

Meşbûb-i wek stêr e govend û îşqibazî
Têkil biçîn semayê hişyar û mest û serxweş

Heywan li kû dimînit em muftiyê zeman în
Bêtin ji destê saqî cama zelal-i bê xêş

Wer guh de çeng û nayê şîrîn ko bèn semayê
Camê binoşe vêran çî sade û çî zerkeş

Ṭali^c ko têt û furşet muhlet li nik heram e
Min umrê Nûh-i nîne wer saqiyo bi lez xweş

Neyşekkera şîrînqed me ji dest te mey divêtin
Da sîne pê cela dîn rewşen bikîn dilê reş

Camid çî kin bi husnê ko wan nezer li xwar e
Xerzeb^c etên di ebleh çî nêrgiz û çî kerbeş

Kore xwe nasipêrit carek bi dest delîlan
Ebleh çî kit tewafê nabînitin Berê reş

Bêzê dîkit ji qencan ji remz û naz û xencan
Qedrê gulan çî zanit kerbeş divêt kerê reş

Feyda me şubhê Nîl e em Dicle û Fîrat in
Ger şeyx û wer imam e vê ra ye min keşakeş

Şoxa ko ez di bendê dil girtiye kemendê
Leţîf e zuhresîma ebrûhilal û mehweş

Birhên ji qewsê qudret nîşane kir Nişanî
Lami^c ji ber dibarin çî yengiyek we perweş

Ellah li min hubba te çî şekker û nebat e
Ji nû ve dê ciwan bim ger bihn bikim gula geş

Bab Ş (şîn) 47. Şebê qedrê li me rewşen ke tu rûhî were xweş

Şebê qedrê li me rewşen ke tu rûhî were xweş
Me ji nû xweş ke li ser çehvê şehîd bin xwe bi meş

Ma li min kê nezerê luftê ji dil xemze ye yan
Bireşînî cegerê rîşê ji qewsên xwe bi weş

Seherê cumle şehîdên te bi rim avêhtî
Êjmarîne yeka yek me hemî şeş sed û şeş

Lê şehîdên te bi ijmarê bi xencer kuştî
Hê neçûn xwîn ji birînan şed û heftad û du leş

Ceng-i hindî dikirin fêris û rimbazê °ereb
Tûx û °ala di firingî ne kemandarê hebeş

Tu binê rom û °ecem kuştine zengî di kemîn
Hane her tête peyapey ji teref Rom xweş û xweş

Da me şehzade bi destê xwe mubarek qedehek
Ne xubarek ji xumarî û ne tundî û ne xêş

Du qedeş mey bi Nişanî diderit reng-i bi reng
Nêrgiza nazik û re°na we gula taze ye geş

Xaliba ehlê zemanê ma Mela ademî yin
Venumayin ji kerê mey reş û gayê te yê beş

°Arifên ehlê beşaret ji neseq merdumê çêşm
Surmepoş in di beyadê we qebayê xwe yê reş

Bab Ş (sad)

Bab Ş (şad) 48. Selwa sehîqed xemmilî

Selwa sehîqed xemmilî
Lew kemmilî mestane reqş
Wer şuhbetê ger qabil î
Dê bêt û ret şahane reqş

Mestane mestan noşanoş
Qerqef di caman hate coş
Ma dê bimînit kes li hoş
Weqtê ko bèn durdane reqş

Şuhbet bi sazan hate saz
Pê mewwicî deryayê raz
Da dil ji nû bayê mecaz
Wê keştiyê sukkane reqş

Meħbûb bi °eynê kewkeb in
Reqşa ko tê dilber hebin
Şed cangiramî min hebin
Bavême rê erzan e reqş

Girişme û raza berî
°Arif venabin lê derî

Hetta di nêva agirî
Ew xef nebit perwane reqş

Perwaneya şem^ca geş î
Zulfên we nazik raweşîn
Şewkên di dil da pê xweş î
Me ji penceyên şêran e reqş

Ala we tayên qurmizîn
Eşlan di ber daberizîn
Nêrgiz di başan tewwizîn
Neyşekeran nîşan e reqş

Weqtê ko ba bin erşewan
Gulçîçek û terhên ciwan
Vê ra ne bê selwa rewan
Arif li ferqa can e reqş

Îro şekerxendê birîn
Destê spîzendê birîn
Dîsa bi govendê birîn
Derdê Melê derman e reqş

Bab D (dağ)

Bab D (dağ) 49. Şêweyê dilberê bizan sunnet e şêwe 'işwe ferđ

Şêweyê dilberê bizan sunnet e şêwe 'işwe ferđ
Herdu nezer ko bin qeran wacib e yek girişme ferđ

Herdu qeran ko qible bin herçi dema xwiya bin ew
Wê se'etê di dînê 'ışq lazim e yek du secde ferđ

Xirqeyê zerq û jengê zuhd min bi meya muşane şûst
Şûst û şûyek di meykedê ewwelê kar-i ferđ e ferđ

Neyşekerên şîrînzaban mest-i bi cam û bade bîn
Ferđ e dibit ji tewbeyê salikê 'ışqê tewbe ferđ

Saqiyê sîmisaq-i ma zehra helahilî bi dest
Canê me şukr û minnet e tîzirewan e reqş e ferđ

Xal-i eger bi weçekê bête qeranê ebrûyan
Şubhetê Beyt-i meqdes û Ke'be dibin du qible ferđ

Ez ko di de'wa 'aşiqî kifşe dikit zeban derew
Ketmê şehadetê dibit wê se'etê bi şehde ferđ

Cebhet û dêm û gerdenê perde dema ji ber bîret
Ferđ e Mela li hacîyan se'y û tewaf û 'umre ferđ

Bab D (dađ) 50. Me ji bil husn û cemalê çî xeređ

Me ji bil husn û cemalê çî xeređ
Bê cemalê ji peyalê çî xeređ

Ger ne teşbîhê du birhên te bitin
Me di îdan bi hilalê çî xeređ

Ger ne qesta dil û canê me dikit
Me ji wê şox û şepalê çî xeređ

Ger ne rûhê me di pê dil biretin
Me ji wê qenc û delalê çî xeređ

Ger ne bi-'smê te mu'emma bin hurûf
Me bi şiklê xeç û xalê çî xeređ

Neko şermende ji rûyê te biwa
Afitabê bi zewalê çî xeređ

Qestê wehdet dikirit rûh-i bi rûh
Wer ne aşiq ji wişalê çî xeređ

Di şebê qedrê tecella tu bikî
Me li pê mûm û şemalê çî xeređ

Ne cemala te tecellî bikirit
Me ji xoban bi cemalê çî xeređ

Ne ji le'len te Mela beşşê bikit
Me ji vê beşş û su'alê çî xeređ

Bab Ṭ (ṭê)

Bab Ṭ (ṭê) 51. Dîsa li bedrê katibî

Dîsa li bedrê katibî
Kêşa ji nû jengarê xeṭ
Nûr e reşandî wahibî
Dergerdişê pergarê xeṭ

Herfên ji qudret nuqte pur
Madarê hewḡa le'î û dur
Evreng-i kê dî we bi sur
Qudret numûn zengarê xeṭ

Ew çîçekên şetrî şîbêht
Ef' aşîfet qelbê me mêht
Selwa ji balayê we rêht
Ev perdeya gulnarê xeṭ

Neqş û nigarên dilberan
Dercên ji remzên esmeran
Her tîn ji dest neyşekkeran
Me j' gulşena ferxar-i xeṭ

Mi j' destxeta terḡên şelal
Xal û xeṭên nûra zelal
Danî di şendoqan li bal
Malê me şed qentar-i xeṭ

Bergên gula reyhanîyê
Katib numûçek daniyê
Kes dî bi vê şîraniyê
Der şen^cetê cebbar-i xet

Reyhan û sinbil tê hene
Şed çiçek û gul tê hene
Zerbav û bilbil tê hene
Ew beşceya gulzar-i xet

Gulçiçek û neqşên xerîb
Nesrîn û reyhanê^cecîb
Lê rast û çep bûyîn şelîb
Cedwelkeşên zunnar-i xet

Îro seher tuxra nişan
I^crab û herfên zerfişan
Hatin digel bayê şeban
Me j^ccanibê dildar-i xet

Îro berata Ehedî
Tuxra nişan zerkeş me dî
Xetê Humayûn kê we dî
Şîrîn û me^cnadar-i xet

Ellah di ber qal û belê
Da yexme kit qelbê Melê
Avêhte çerxê cedwelê
Evrenge^cenberbar-i xet

Bab Ṭ (ṭê) 52. Xwîn ko ji dil bi mewc-i bê

Xwîn ko ji dil bi mewc-i bê
Eşkê rewan me têne xeṭ
Nîl-i ji dîdeyan dizêṭ
Keftime navê şubhê beṭ

Katibê neqşê qudretê
Zêr-i reşandî ser xetê
Erzen û dêm û cebhetê
Pê neqqişand û kir nuqet

Cebhet û dêm-i neqqişand
Misk û zûbad-i lê feşand
Nûrê ji zulmetê reşand
Taze kişandî xeṭ bi xeṭ

Ḥor û fireşte kê we dîn
Nazik û xob û sirşirîn
Dêmê numûne ber bikîn
Şoretê Çîn numa xelet

Şi^c rê Melê ko wek rowan
Daye te canê merivan
Pir me li bergê erxewan
Dîne xezel li nik şeṭeṭ

Bab ̤ (tê) 53. Mey nenoşî şeyxê Şen'anî xeleţ

Mey nenoşî şeyxê Şen'anî xeleţ
Ew neçû nêv Ermenistanê xeleţ

Mişlê Mûsa wî tecellaya te dî
Ê tu dî kanî xeţa hanî xeleţ

Wî nedî bejna te û dayê qiyas
Hikmetê lew çûye burhanê xeleţ

Seţweta Leylê yeqîn Mecnûn tepand
Wer ne qeys naket beyabanê xeleţ

Wek Nişanî neqş û nişanek te dî
Ê ko nişanek te dî kanî xeleţ

Ez giham ava heyatê xef ji dil
Xudr-i vajî çûye heywanê xeleţ

Şahnişînên nazikan dayi^c mekun
Da nebînî dil bi vê xanê xeleţ

Ellah Ellah çerx û dolabê dinê
Nuqte qeţ nakit di dewranê xeleţ

Roz û şeb her seyrê dîdara te tîn
Nakirin ew dewr û seyranê xeleţ

Hon nebên meşşateyê xef daniye
Hemqeran kir xal û nîşanê xeleṭ

Dê bi ser canê me murwet da me êx
Bişkowên benda girîbanê xeleṭ

Ser nebî ber kufrê zulfê °aqibet
Ez ditirsim lê ji îmanê xeleṭ

Pehniya vê çerx û dolabê dinê
Nisbeta erbabê °urfanê xeleṭ

Nusxe°ê °alem hemî °unwanek e
Nuqṭeyek nabit di °unwanê xeleṭ

Qulzum û bayên muxalif tê pir in
Da nekelşên darê sukkanê xeleṭ

Da bizanî pehlewaniê mûyekê
Dest nedî li-l-lahi mîzanê xeleṭ

Wî di destê min gula geş pir xwinav
Heyf-i bilbil çû gulistanê xeleṭ

Hêj-i sehwa xame°ê bû werne min
Ev xeleṭ nakir di dîwanê xeleṭ

Wî li ser bejna te ev seywan veda
Wer ne nada roj-i seywanê xeleṭ

Geh dil û geh can dibin tirkên te tèn
Nakirin yexma û talanê xeleṭ

Meşrebê tirkan Firat û Nîl-i kir
Teşneleb çû terfê Ummanê xelet

Pîrê hikmetbîn li wifqa meşreban
Kes nedî mey rêhte fincanê xelet

Rast e yek qanûn seraser nîne tê
Xwehrî û pêçên perîşanî xelet

Pakişebê û quwwetek mewzûn divêt
Da nedit şenê et bi idmanê xelet

Merdimên çehvên Melê eksa xwe dî
Wek Nişanî ma li nişanê xelet

Bab Z (zê)

Bab Z (zê) 54. Bê lebê le'le Mela min ji meya al-i çi hez

Bê lebê le'le Mela min ji meya al-i çi hez
Şuhbeta tê nebitin yar-i bi herhal-i çi hez

Qedehek bade bi destê xwe li qelbê me birêj
Aşiqê sûxite bê ateşê seyyal-i çi hez

Neko wek teyr ji mijên te bibarin peykan
Ji birînên di dilî şubhetê xirbal-i çi hez

Hez û lezzet me bi umrê xwe di işqa te nedî
Hem bi van derd û xeman zêde tu îsal-i çi hez

Husn û sur zat-i nebit cezbe li dil dit mehbûb
Me ji zulf û xet û xal û qedê meyyal-i çi hez

İlmê işqa but û latan bi riwayet nabitin
Qedrek hal ko nebit şubhetê her qal-i çi hez

Bedewî pak-i çi kit feshetê meydan ko nebit
Mustemî guh nedirit muṭrib û qewwal-i çi hez

Durrê nasufte dibêjim ji lebê le'le Mela
Ger Rewanbexş-i nebit nezma ker û lal-i çi hez

Bab F (fê)

Bab F (fê) 55. Ser didit ab-i kewşerê

Ser didit ab-i kewşerê
Zemzeme û semayê zulf
Saye numayê xawerê
Sidre³ê muntehayê zulf

Saye numayê cebhetê
Neqş û xeşê ji qudretê
Nuqte û herf û cezme tê
Bal û perên humayê zulf

Bal û perên şifethuma
Saye li cebhetê numa
Xemrî û lef çûne sema
Yek bi yek ew li bayê zulf

Netrik û berg û şitriyan
Reqş e ji rengê xemriyan
Baz û çuqab û qumriyan
Seyr e seher tebayê zulf

Her me ji birca sinbil e
Pence di sîne û dil e
Dûr û diraz û muşkil e
Qişşe³ê macerayê zulf

Bestine zulf-i der kemîn
Helqe bi helqe çîn bi çîn
Yeşma dikin dilan nihîn
Têne yeqîn xeşayê zulf

Rom û ecem ji her teref
Ceng û suwaş e wan bi xef
Hindî û zengî şef bi şef
Hatine ber liwayê zulf

Herdem û herşet ji nû
Pêt e di sîne nar û dû
Şebr û qerar-i min ji kû
Aşiq û mubtelayê zulf

Zulfê siyahê bêwefa
Qeş me nedî ji wê şefa
Kuştine ez bi şed cefa
Ah-i ji dest cefayê zulf

Zor û feqîr û mubtela
Zahid û şofî û Mela
Kuştine ew bi şed bela
Kes nekevit belayê zulf

Bab F (fê) 56. Îro ji şehkasa surê

Îro ji şehkasa surê
Mey hate fincana şedef
Minnet ko îro dêmdurê
Da min meya husna xwe xef

Xef da me cama kewşerê
Şêrînged û lebşekerê
Bayê şeba da çenberê
Hatin sema şetrî û lef

Şetrî û zulf û belg û per
Hemiyan li dêm de^çwa û şer
Êlan li selwa bûne ger
^çEqreb xwiyan ez her teref

^çEqreb nehin ew sinbil in
Bo ^çenber in dava dil in
Nîşan ji misk û filfil in
Wan sîneya min kir hedef

Da sîne cohtê tîrxweş e
Qewsê hilalî tozreş e
Yek tîr-i pir kuştin leş e
Xwînê di cerhan daye kef

Min xwîn bi co têtin ji dil
Ew baziye bê tor û sil
Dakefte nêv tora qizil
Qumrî nehiştin ref bi ref

Ref ref nehiştin zaḫ-i zaḫ
Danîn li dil min daḫ-i daḫ
Dê kî bimînit saḫ-i saḫ
Westane leşker şef bi şef

Şef şef mi dîn hindî û zeng
Cengîz-i hat Teymûrileng
Xef wan reşandin dil xedeng
Teşbîhê tîrên Xan-Şeref

Tîrek ji qewsê malzirav
Tê dil qewî tavêje nav
Xwîn tê pirê teşbîhê av
Firyad û efḫan şed esef

Can dê nedit ew malxerab
Her sîne^ê cotek ḫurab
Tê da birin penc û kulab
Wî can di dest wî rûḫ di kef

Canê Melê rûḫa Melê
Nûra ji qudret nuqte lê
Remzek nihîn da min welê
Nalî ji ber wek nay û def

Bab Q (qaf)

Bab Q (qaf) 57. Nazika min di semayê bi ser enguşt-i ʿeqîq

Nazika min di semayê bi ser enguşt-i ʿeqîq
Da mi îro di serayê qedehek taze rehîq

Mi ji dest û yedê beyda qedehek şafi vexwar
»Şe ʿaniyyin ke-necmin bi-senahu we-berîq«

Sirrê leʿlê lebê canbexş-i nizanî tu bi beşş
»E ʿidi n-nezrete ya nazîru fe-s-sirru deqîq«

Bi lebê leʿlê şekerxende şikêna şekerek
»Ena bi-l-we ʿdi le-waşişiq fe-lehe l-we ʿdu weşîq«

Di riya durrê muradê mi serî daniye rê
»Xuđtu fi l-behri we-la zewreqe we-l-behru ʿemîq«




Mi ji xeflet seherê dî we du remzan kuştim
Xweş bi heqqê xwe gehiştim »ena bi-l-qetli heqîq«

Qeş neko qetle dikim bê guneh û mezlûm e
»Reşqetnî bi-nibalin we-remetnî bi-remîq«

Tîr û rim herdu li dil dan li ceger çespan-i kir
Ew ji xwîna min e riştî tiliyên şohr-i ʿeqîq

Sosinên tey ter û nazik li gulan tē^cne didin
»Fe-bihe l-^cenberu fa^oiḥ we-bihe l-misku ^cebîq«

Çi bi kuştin çi bi hiştin tu ko ferman bikirî
Ez bi ḥukmê te xweş im »Eḥmedu ^cebdun we-reqîq«



Bab Q (qaf) **58. Min dî ji xef -let cam di keşahê Necef dil kir hedef**

Min dî ji xef *-let cam di keşahê Necef dil kir hedef*
Roj hat Şeref *stêr bûne xef herçar teref nûra yeqeq*

Zulmet nema *şubhet we ma nûra sema -lan çû sema*
Lê ew dema *zulf bûn cema hatin sema -yê yek neseq*

Werdan gulav *girtin xwinav lê min di tav şohtin hinav*
Min dî bi çav *zulfên bilav lê bûne dav bend kir bi nav*

Nûra beşer *guft û xeber qend û şeker zulfan ji ser*
Xalên di qer *bavê seher da bête der şubha bi heq*

Mi ji bihriyan *pir naliyan şev tariyan ceng bû meyan*
Wer kuştîyan *ji wan yengîyan bi wan tiliyan xweş ke giyan*

Kir şefqe mîr *anîme bîr berdan mi tîr kirme esîr*
Neg'ha feqîr *zulfa herîr avêhte şîr da pê meheq*

Ê muşterî *dêmê zerî nebir serî ney can berî*
Avêt serî *gava berî lazim herî wê ev perî*

Kelbê di rê *nîşan berê tîrawirê mijgînperê*
Behr û berê *işq û surê avêhte rê ser ma qeşq*

Min dî di new *-bê yarê tew sundus e ew bêm bêderew*
Min bû di qew *-sê boyî ew şevan mi lew nayême xew*

Hêstir rewan *tên wek coyan tîr dan ewan reşebriwan*
Dil wek goyan *ber kaşowan ser lu'lu'an bergên wereq*

Bejna şepal *dêmê bixal i'rab û dal qewsê hilal*
Neqşê celal *cama zelal xemra helal şuhbet bi hal*

Ez telbeya *ava heyâ tê bûn teya ki j'badeya*
Cama xwiya *bo îşweya yar lew peya -pey tên sebeq*

Canê Melê *ji qal û belê bend im welê der kagulê*
Belgên gulê *rû heykelê ew miske lê carek hilê*

Perde û sutûr *da bêquşûr bêtin zuhûr dêmê bi nûr*
Nûra xefûr *xalên di hûr cama tehûr le lên şefeq*

Yar hat û mest *şubha elest min dest bi dest dî cam di dest*
Kagul dibest *tayek verest vê ra şikest nîşan e qest*

Ew lebşeker *wa hate der rabû ji ber tayên di ber*
Xalên di qer *zulf çûne ser eşlan seher lê bûn fereq*

Bab K (kaf)

Bab K (kaf) 59. Dilbera min seherê hat-i bi tûx û bi yedek

Dilbera min seherê hat-i bi tûx û bi yedek
Şed yedek bûn di berê têk-i bi sincab û weşek

Yar-i bo çûme biwarê bi ziyaret kef-i pa
»Qale ya aşiqu hatîke yedî hati yedek«

Dil û can herdu mi danê ko icazet ji me xwast
»Qultu estewdi^ê uke l-barî ellahu me^êek«

Te divê şafî û zexê jêk-i vedî tecrîbe ke
Da îyarê bi tamamî binumêtin te mehek

Dewrê zulfa te muselsel bi nezer hel ko nebit
Nezerê şafî dilê ser diderit nuqteya şek




Ahûya min neko rencek te bi xatir bigehit
Bi xwidêkî lew ko ew sek bi xwidê hate mesek

Bi evînê melek û çerx û felek tene sema
Rewşen in têk-i bi mihrê ji sema ta bi semek

Neko peyweste bi yek bin ji surê îşqê du rûh
Dê bi eşbağ-i bibin waşil û peyweste bi yek

Ji musemma  eded   ke ret-i esma tu meb n
Zeyd    Emr n me  etta  end-i du n ne yek   yek

 i fe a et bi mela et we did r  tu Mela
Ev edaya te di  i  r  we  ir n   bi nemek



Bab K (kaf) 60. Te'ale l-lah zehê husna mubarek

Te'ale l-lah zehê husna mubarek
Tebarek şed tebarek şed tebarek

Meger Şîrîn bi vê şîraniyê bû
»Ela şemsu l-melaḥeti qed tuşarek«

Ji xunçên buxçeya wê gul'izarê
Ji her xunçe di dil da maye xarek

Li textê dilberê rûnî bi şahî
Li te şahî mubarek bit mubarek

Ji dîdarê murada min bibexşî
Murada min ji te dîdar e carek

Di dil da nî we dîsa dil dişojî
»E-teḥriqu ya melîke l-ḥusni darek?«

Îzarê ger li min dî tu li dil de
»Li-enne l-qelbe qed yehwa îzarek«

Te cergê min ji dil kir pare pare
»Fe-carek ya bedî'e l-ḥusni carek«

Were xanim bikuj biste bi xencer
Melê emma bi destê xwey' mubarek

Bab K (kaf) 61. Nazikek min seherê dî bi cemala xwe ne wek

Nazikek min seherê dî bi cemala xwe ne wek
Hor û wildan û perî bûne beşer bûne melek

Wer temaşayê şehîdên xwe ke carek tu binê
»Ehsene l-lahu we-tebarek« ji du çehvên di belek

Sinbilên ter li gulan pal-i bi mestî diderin
Sosinên taze li nistrînwereqan bûne helek

Nazika min ko bi mestî di çemen hat-i xeram
Ji hesed çûne xusûfê meh û mihr-i di felek

Ê ji xeflet te bibînit ko dimînit heyihat
Te bi çehvên di belek kuştine mezlûm-i gelek

Zerreyek eşqê giha kê we ji eqlê xwe nebir
»Kullu men şadefehu dahiyetu l'îşqi helek«

Xwisroyê eşqê ko rûniştî li ser textê wucûd
»Fetehe l-qelbe ele l-fewri we-li r-rûhi melek«

We çi eşq û çi selamet herdu dûr in ji yekê
»Kullu men yesluku hubben subule n-nari selek«

Ah-i bêgavê ji dil tèn me ji pêta di ceger
Bes tu bêfeyde neşîhet ke me dil bûye pelek

Ma ji ^cumrê me çî mabit were êdî vi me ra
Da di eqtarê wucûdê bikirîn seyr-i melek

Di 'stiwa'ê ko ji husna te veda lami^cekê
»Nezeru ş-şemsi mine ş-şerqi ile l-xerbi delek«

Afitabê ko ne teşwîr-i ji husna te bitin
»Nûruha fî nezerî zulmetu dacin we-helek«

Ji hewa bend te kirim şubhetê bayê di sivik
Çi ji biska te bibêm ah-i ji biska te çek

Ez ji zulfa te veristim mi teşeb kir lebile'l
Lê di çaha zeqenê bê ser û pa çûme helek

Bi umîda te homayî ne Melê tor-i veda
Wer temaşayê cehan bûye hemî tor û şebek

Bab G (ge)

Bab G (ge) 62. Ko îşaret bi bişaret bidirit nexmeya çeng

Ko îşaret bi bişaret bidirit nexmeya çeng
Ji rûyê ayîne^ê dil biretin perdeya zeng

Fehm-i raz er bikirî wer bibehî mujde^ê saz
Çeng-i bêperde dibêjit ne ney û nay-i bi deng

Weh ko bê şahid û mehbûbê te^c umrê xwe biwar
Karikê rabe bike weqt e ko êvar e dereng

Berê meqşûdê ji tobe negirîn me^c lûm e
Me ji destê xwe yê kutah û ji payê xwe yê leng

Dilê yarê me nebû nerm-i bi şed ab-i girî
Eşerê dê çi bikit ab-i bi şed qeçre li seng

Sîne geh têt ko bi ker bit ew ji derbê muhbetê
Me ceger şubhetê barût e we dil maye pereng

Bi çi rengî me di dil xef bibitin gewhera^c îşq
^cAşiqan muhbet û mihra zeriyan kifş e ji reng

Kifş e mecmû^c û perîşaniyê halê me di dil
Ji serê zulfa perîşan û ji biska te ye şeng

Ne tinê gezme dibarin me ji qewsê du hilal
Me ji mijganê siyeh têne ceger tîr û xedeng

Mişlê wê qewsê hilalê ko du nûn reyhanî
Kê nişan dane ji Şîraz û kê anîne ji Yeng

Her li dora Hecerê-eswed hebeşan çerx û tewaf
Tên wuqûfa ʿerefatê bi sema nûbî û zeng

Şef bi şef tirk û muşul doguş û hindî di kemîn
Bi ʿceeb hatine cengê hebeş û rom û fireng

Mîr û kirmanc li holan qederek westa ne
Lê di nêvê bi şef û tîp-i ʿereb hatine ceng

Ji goher xunçe koşa³î digirit durcê ʿeqîq
Bi şeker xende zenî ger bigirît şekkerê teng

Were bêperde Mela vê xezelê bîne meqam
Herdema bêne sema def bi def û çeng-i bi çeng

Bab L (lam)

Bab L (lam) 63. Ger bidiya ew şenema surcemîl

Ger bidiya ew şenema surcemîl
Nazilê erđan nedibû Cebre'îl

Min nezerek li ħusn û cemala te kir
Ayîne yek dî mi ji nûra celîl

Lew ji lebê le'île te can bû xecil
Badeyê engurî kuca selsebîl

Dêl me hezar in te di bendê welê
»Leyse lena 'enke mecalu bedîl«

»Ma ena wehdî bike min muxremîn
Kem leke qebîlî şexefen min qetîl«

Dar û derdê mi tu yî canê min
»Hel bi-siwe l-weşli şifa'u l-'elîl«

Şebr û sukûn çûne me nêv Dicle da
Lew ji du çeşman me dizêt ab-i Nîl

Bes ne mi şed çeşme ji çeşman dizêt
»Mezce demin dem' u 'uyûnî yesîl«

Pir me nezer da te ji ser ta qedem
»Qed rece[°]e t-terfu we-[°]eqlî kelîl«

Mişlê te ma bûne weya ma dibin
Roj ko tecella ye çi hacet delîl

»Qed selebe r-rûhe[°]ela xefletin
Iz heceme l-qelbe bi-terfin kehîl«

Gerçi li ber derb û cefan fil-i bûm
Bê mefer ez mat-i kirim şah û fil

Can didirim guft-i bi yek bûse de
Lê bibitin le[°]lê şekerxa kefil

Gerçi di nêv helqeya şêran im ez
»Leyse[°]eleyna li-[°]idana sebîl«

Zor-i Mela firqetê ebter kirîn
»Inne mine s-sa[°]eti yewme r-rehîl«

Bab L (lam) 64. Şahidê qudsînişan husn e ji remza ezel

Şahidê qudsînişan husn e ji remza ezel
Da me bi destê surê cama meya lemyezel

Mey ko biçit saxerê di destê wê dilberê
Şondê bi xaliq dixwim roj e di Birca-hemel

Dêm-i di camê me dî sur di medamê me dî
Lew me ji meyxaneyê girtiye berder mezel

Her ji kevanê biweş qebdezerê goşereş
Gezme bi coht têne dil kes dimirit bêcel

Ĥusn û sura şûretê kes didirit qudretê
Lew di eşil dûr e jê tene nê »lemma efel«

Zorbe we têtin ereb têt-i çevandin qeşeb
Qenc-i bi çehvan me dî ceng û cidala Cemel

Şîr û rîman vêt-i ran pence birin têt-i ran
Lew me dikin jêt-i ran qîme dikin dil digel

Nazik û qenca şepal dil vegeînit mehal
Lê ji me dê dil bibit dil bi me dit bi muhtemel

Neyşeker û dêmdurê da me bi destê surê
Cam û qedeş şubhê av lew me rewan têt xezel

Gerçi di çehvên »ena« alem Mela kir fena
»Dûne fena babikum innehu ebdun eqel«

Bab L (lam) 65. Îro ji remza dêmdurê

Îro ji remza dêmdurê
Minnet ko min mesrûr e dil
Dilber bi fincana surê
Mey da me û mexmûr e dil

Remzek nihîn avêhte dil
Mihre ji baþin mêhte dil
Þehzadeyê sur rêhte dil
Þehkaseya ferfûr e dil

Hostayê 'iþqê dil hevot
Ser ta qedem hingê diþot
Remza »ene l-þeq« her digot
Bawer bikin menþûr e dil

Dil lê bidit nûra meye
Weqtê suwaþ û heyheyê
Fehm er bikit weþya neyê
Jê dit xeber me' mûr e dil

Nûra ji qudret lê du nûn
Jê ra dinalin erþenûn
Wer ayeta 'iþqê bixûn
Xweþ nusxeyek meþtûr e dil

Tefsîra sirra ayetê
'Arif divêtin guh detê
Raza rumûzên qudretê
Ger deyn bikit me' zûr e dil

Dil ke'be ye mewla ye lê
Narê kelîm îsaye lê
Bangê »ene l-lah« daye lê
Hem Ke'be û hem ˘or e dil

Şed co û şed cobar e tê
Şed gulşen û gulzar e tê
Çendan ji 'îşqê nar e tê
Şafi nezer dî nûr e dil

Şuħbet ko kamil bû bi rê
Carek bi cayê 'enberê
Qelbê biavê micmerê
Xweş'enber û kafûr e dil

Şox û şepala leb ji qend
Ew nazika wê qenc û rend
Wê dil ji dil dilda û xwend
Îro yeqîn fexfûr e dil

Er dil ji te mesrûr bitin
Min ji Melê destûr bitin
Dê kit cehan pir nûr bitin
Lê da'ima rencûr e dil

Bab M (mîm)

Bab M (mîm) 66. Şerbeta lam û beyan ez bi heyatê nadim

Şerbeta lam û beyan ez bi heyatê nadim
Badeya le'le bi ava zulumatê nadim

Hor û wildan û perî cumle cema bin îro
Mûyekê pê ji xeşê wê but û latê nadim

Ger bidit destê tewafa pê û destan bigirim
Wê mecalê bi wuqûfa 'Erefatê nadim

Ez û yar ger şevkê herdu hemaşûş bibîn
Leyletu l-qedr e me ew şev bi beratê nadim

Canê şêrîn ko ji yar ra bi xwidan ez dikirim
Ne bi yarê xwe di weqtê sekeratê nadim

Şerbeta zehra helahil ko hebîbê me bi dest
Bi gulab û şeker û qend û nebatê nadim




Ne bi qanûn ko îşaret bi şifa'ê bikirit
Ez hilakê xwe di 'îşqê bi necatê nadim

Telbe kir weşlê ji dilber mi bi 'unwanê zekat
Go tu 'ebd î we bi 'ebdê xwe zekatê nadim

Wê bi peykê bikirîn mat-i reqîbê dîsa
Bi rex û fil û feres ez şeh û matê nadim

Di semaya seherê dest bi kes dî îro
Xeyr-i şîrînqed û mewzûnherekatê nadim

Hate destê me di reqşê we digo bil ji Melê
Dest bi kes dî di semaya ko Mela tê nadim



Bab M (mîm) 67. Îd e û da  alem  bang-i Őefay  xaŐ û  am

Îd e û da  alem  bang-i Őefay  xaŐ û  am
Mah-i new ebr  numandin  u ji ber  ewr û  emam

XweŐ bi dor cam  iŐaret kir hilal  saqiyan
Mahitab n zuhres ma  aridehsal  tamam

Name  ey kir roze     id  vekir feŐla mey 
L  bi zimzim t n bi awaz  ney  fincan û cam

Őahid n gulreng-i saq  belk  nistr n in beŐer
  di lebs  er ewan  n rgiz n  er erxiram

Ya reb ew r h in mucussem yan miŐal  r h in ew
Lew bi sir caman dibexŐin nazik n Ő r nkalam

Ew  i  al  gewher in hatin libas  cism û can
 Őwey n wan Őubh  iks r  di qelba nin meqam

Wek Mel  gavek tin   a ib ji d dar  nebim
Wer bibim w  sa et  l  bin ji min da Őed selam

Bab M (mîm) 68. Daneyên ʿenber li nîsrînan reşandin xalê xam

Daneyên ʿenber li nîsrînan reşandin xalê xam
Sosinên nazik li ser xalan çevandin dalê dam

Cebhet û dêmê ji qudret lê nivîsî herf û herf
Kagulan ta ta li ser herfan kişandî lam û lam

Leyletu l-qedr û berat in zulf û cebhet şubhê ʿîd
Dêm weko feşla biharê lê qiyamet qedd û qam

Ew perî weqtê di sundus da ji qundus bit xwiya
Bende dê şah û geda bit Xwisrûyê şîrînkêlam

Herkesê carek diye ew zinde ma hetta ebed
Wê nedîtî ew perîrû zindegî lê bit heram

Herkesê camê ji destê wê binoşit noş-i bit
Ê ji wî destî nenoşî zehr-i bit lê ew medam

Wan di reqşê da ko dîm awir peyapey dane min
Berq û tîrêjan li dil dan cezbeya ʿîşqê revam

ʿUmrek e dûr bûm ji canan ketme benda firqetê
Nagehan perde hilanî go Melayêm es-selam

Bab N (nûn)

Bab N (nûn) 69. Ya reb î n guldeste-i ya nergisê re'na esti î n

Ya reb î n guldeste-i ya nergisê re'na esti î n
Serwê gulşen ya elif ya qametê yekta esti î n

Î n melek ya şahidê qudsî esti ya mahê felek
Hor-i ya rûhi l-qudus ya nûr-i çeşmê ma esti î n

Kewkeb-i şubh e esti ya xwirşîd-i ya durr-i yetîm
Ya ten-i sîmînber est ya gewherê wala 'sti î n

'Ariđe est î n ya şu'a'ê şems-i ya bedrê munîr
Lale ya nîsrîn û gul ya badeê hemre 'sti î n

Sunbulê ter ya binefş ya sosin û gulçîçek û
Zulf-i ya muşkê xeten ya şûretê tuxra 'sti î n




Ûemze î n ya gezme î n ya tîr-i ya sihr-i helal
Şahir-i î n ya çeşmê şoxê turkê bêperwa 'sti î n

Mîm-i ya yaqût-i ya ser çeşmeê abê heyat
Huqqeê durdaneê ya le'lê şekker xa 'sti î n

Xeţî-i ya qewsê du nûn mektûb ji muşkê ezferand
Ya hilalu l-îd-i ya ebrûê bêhemta 'sti î n

Koy-i ew û ya ke^{be} ya Beytu l-muqeddes ya bihişt
Xuld e ya firdews-i îⁿ ya cennetu l-me^{wa} esti îⁿ

Hatifê xeyb e esti îⁿ ya tercumanê rûhê quds
Bulbulê şeyda 'sti der gulzar-i ya Mella esti îⁿ



Bab N (nûn) 70. Remzên te di canan ne bi endaze dirazin

Remzên te di canan ne bi endaze dirazin
Heryek bi hezar rengê rewan-i me dixwazin

Wan derbe li canê me wekî berq û birûskan
Tîrê te di canan ne tinê sîne gudaz in

Cana ji cefaya te û zulmê çi xeber dîn
Ko tîrê ji cewra te di dil da me bi gaz in

Perwane û bilbil bi dil in şu'leya îşqê
Lê ger tu nezer dî bi xwe ew gulşen û raz in

Peyweste di weşlê lew dimînim ko seraser
Bişkoj û tîlism û wereq û netrik û baz in

Subbûhî û quddûsî û horên di bihiştê
Peyweste şebê qedrê liqaya te dixwazin

Sinbil bi sema tîn û gulan perde dirandin
Bişkiftine al-al û hişîn bûne terazin

Cobar di rewan in çemenan terhê ciwan in
Mestane bi ref ref li kinaran sî û qaz in

Heryek bi temaşagehê husna te ji herca
Teşbîhê nigaran bi cemala te dinazin

Tîran li me dit dostê me tê sîne hedef kir
Nazan li me kit yarê me zarî û niyaz in

Mihrabê du ebrû ko ji bala ve xwiya bin
Der secdegeha ^çişqê niyazê me nemaz in

Ger husn û mehebbet bi sera perdeê can bin
Geh şah û geda geh bi xwe Mehmûd û Eyaz in

Ev hor û perî çehre but û latê cemalê
Der şûretê tehqîqê, Mela, ^çeynê mecaz in

Bab N (nûn) 71. Mela me li gerdena dilber ji nû şed bûse mayin deyn

Mela me li gerdena dilber ji nû şed bûse mayin deyn
Mecalê dê bixwazim jê dibê deynê te »fewqe l-eyn«

Bi remza qabê qewseyn-i ji wan birhan xeberdar in
»Fe-ati l-qewse barîha ela ya ramîye l-qewseyn«

Ji sirra lamekan wacib tenezzul kir di imkanê
»Fe-eyne l-ilmu eyne l-eyn we-eyne l-eynu iz la-eyn«

Ji mabeyna du ebrûyan peyapey berqê lami^c tèn
Bi^ceynê ger bibî şafe çi nûrek şîrf e ew mabeyn

Bi destûra te, da wî jî ji vê navê verêkim ez
»Fe-şeffi l-eyne nûre l-eyn ela ya zeyne kulle z-zeyn«

Bihayê işweyek le^clan me yekser »ma melek« bexşî
Dil û can jî li ser danî we zalim hêj dibêjit deyn

Mela her wî bibîn her wî eger her wî dinasî tu
»Huwe l-me^cbûd huwe l-meşhûdu bel la xeyre fi d-dareyn«

Bab N (nûn) 72. Min di ber qalû bela bañin vi wê ra bû evîn

Min di ber qalû bela bañin vi wê ra bû evîn
Hêj li ser °ehda elest im ta bi roja axirîn
Min divê lê eşkera kim carekê daşa nihîn
Guftim ew ra ma du °ago yî tu em ey ðor-i °în
»E °reðet °ennî we-qalet ma du °au l-kafirîn«

Ey şehê °alîcenab pir °aciz û perkende em
Ah ji dest cewra evînê çî bikirim min bende em
Şebr û taqet min neman lê bêkes û dermande em
Ger bixwanî wer beranî bende em ta zinde em
»Wacibun lî imtişalu l-emri maşa te °murîn«

Şohtim ez pêta evînê têk bûwem gird û heba
»Inne lî ayati şidqin kane fî haşe n-neba«
Horiya roja liqaê nazika mexmûr qeba
»Hebbeşa rewðatu Necdin zurtuha °ehde ş-şiba«
»Rewðetun yecrî °ela erca °iha ma °un me °în«

Min li ser bedrê munîr mektûb diye neqşê sewad
Ser bi yek anî du nûnan xetîte reyhanî du şad
Hadirî min secde bir lew xerqê xwînê bû fu °ad
Ber derê baxê wişaleş hatifê awaz-i dad
»Hazihî cennatu °ednin fe-dxulûha xalidîn«

Naêtin gohtin bi qal şerh û beyana husnê tu
Dê bi hal û sir binasin dil fesana husnê tu
Xweş Mela amancê tîran kir kemana husnê tu
Qişşê °işqa celal û dasitana husnê tu
»Tilke enba °un yeqûlu n-nasu minna be °de hîn«

Bab N (nûn) 73.Şenemê ji qewsê ebrû du hilalê new numandin

Şenemê ji qewsê ebrû du hilalê new numandin
Du keman li bircê mîzan bi xêdeb li min kişandin

Ne du nûn qelem muqabil bi bedî^cê xet nivîsîn
Du hilalê destê qudret bi qeranê yek kişandin

Çi beratê husn e ya reb bi nişanê padişahî
Bi teref du turre tuxra we bi mawerê reşandin

Elif û du lam û hê dîn me di ayeta cemalê
Ji ceger me kir tesellî we ji sîne dest feşandin

Ne tinê ji qîşt û zulfan me di sîne şed kulab in
Li ceger sîyehkemanan du hezar-i tîr reşandin

Ji ceger Mela pilingan bi kulab û pens-i ker kir
Esedan ji pence vê ran dil û sîne herişandin

Bab N (nûn) 74. Xeşmê li feqîran meke zû padişehê min

Xeşmê li feqîran meke zû padişehê min
Pirsê bike carek li xeşa û gunehê min

Teftîş-i bi mû mû bike er em bi xeşa î
Hinca neke bêtin ti welatî ti cihê min

Cewra te behîtin we cefaya te perîtin
Qurbanê te bim guh bide carek gilehê min

Zanî ko ji ber cewr û cefayan elemên dil
Rehmê bi gedayê xwe ke sulţan û şehê min

Sih sal e ji derd û ji belayê te hilak î
Hetta bi felek her diretî ah û ehê min

Ma yek nefesek min dibitî şebr û qerarek
Qed bê te we bê te dibitî mişlê sihê min

Ger şubhetê perwane di bezmê te çî şed ker
Şed nale hezar reng-i wekî çeng û jihê min

Nûrîncedeha xemr û heyata me bi ser dan
Ger wê bidetî dest-i bi dest muşterihê min

Yek işwe, Melayî, bi biha bête ji lelan
Şed can me hebin hêj ko muqeqşir di behê min

Bab N (nûn) 75. Ez nizanim sebebê yarê çira dûr-i kirîn

Ez nizanim sebebê yarê çira dûr-i kirîn
Şahê şîrîndehevan em ji xwe mehcûr-i kirîn

Mişlê goy bê ser û pa bûme li ber derb û şekan
Lew bi çewganê cefaya xwe ji dil hûr-i kirîn

Da me şed camê firaqê ji xweh xa'ib nebûyîn
Ji wişalê qedehek da me û mexmûr-i kirîn

Nûrê çeşmê me ko  alem me bi çeşmên te didî
Bi cemala xwe te wek dîdeê bènûr-i kirîn

Nefesek bê te me naçî ne dijîn bê te demek
Ji te hat emrê humayûn te weh me' mûr-i kirîn

Me dizanî ko tu dê  aqibeti l-emr-i çi kî
Lebê le'le şekirîn ahi ko mexrûr-i kirîn

Zerreyek bûm di hewayaya te di wêraneyekê
Mişlê rojê bi şu' a xwe te meşhûr-i kirîn

Ji ene l-heq bi lebên le'le xeberdar-i bûyîn
Bi gulaba serê zulfa xwe te Menşûr-i kirîn

Munşerif ma dibûyîn em bi duşed car-i Melê
Lê bi wê kesr û îqafê vi xwe mecrûr-i kirîn

Bab N (nûn) **76. Îro ji husna dilberê**

Îro ji husna dilberê
Dîsa helak û serxweş î
Remzên di wê şîrînsurê
Şohtim bi pêta ateşîn

Şohtim bi berqa lami^c e
Ew necm û bedra tali^c e
Şemsa semayê rabi^c e
Lew pir ji şewqê şewwişîn

Pir şewwişandin wê dil e
Zulfên siyah ser dan mil e
Tora muxalif silsile
Selwa^c eqarib lê meşîn

Selwa^c eqarib lê weşen
Ew nazika nûrînbiden
Qendê dirêjin guft û ken
Biskan di lê kir bawêşîn

Biska siyah re^cna ye mest
Yek dî bi heyran pê ve dest
Hemyan bi mestî helqe best
Derbendê ew zulfa reş î

Êsîr kirim zulfa çelek
Ew horiya şubhet melek

Tîr dan ji reştûzên helek
Mecrûhê qewsê pirweşîn

Tîr dan ji qewsê malzirav
Ew gewhera pir şewq û tav
Şotin li min cerg û hinav
Lew têk ji cergê herişîn

Cerg û cesed têk şohtine
Lew xef xedengan nuhtine
Ji qewsê hilalê jih tine
Heyranê dêma mehweş î

Hem bedr û hem Zuhra ye dêm
Ji wê ʿalema kubra ye dêm
Xweş destxeş û tuxra ye dêm
Herfan ji miskê lê nişîn

Lewhê ji nû sîqal bidin
Herdem ji nû ve xal bidin
Da dil bi yek dî pal bidin
Nuqţan ji zêrabê weşîn

Zulfa siyah ʿenber bike
Xemlê ji zêrê zer bike
Zerbafe û dîba ber bike
Misk û gulavê lê reşîn

Mawer ke terh û bişkoyan
Cîranê berg û lû'ûyan
Ew ʿerʿer û selwa ciwan
Şetrî bi mestî lê xwişîn

Şetrî we tayên şor û zer
Bayê nesîm lê da seher
Li wê cebhetê hijiyan dû per
Lewra sekara bêhiş î

Meşha seher yarê şefîq
Da min bi enguştên [°]eqîq
Ji wê badeya nûrîn rehîq
Mexmûrê xemra bêxiş î

Mexmûrê bê camê ez im
Yeşmakirê ramê ez im
Çavnêrê peyşamê ez im
Perwaneyê şem [°]a geş î

Perwaneyên şotî kebed
Dilber ji ber Birca esed
Tîr dan ji reştûzên şemed
Lew têk ji xwîne neqqişîn




Kuştim bi qewsê [°]enber e
Şoxê ji dil mil dan ber e
Êxiste dil şed pencere
Evrenge em mişnetkeş î

Mişnetkeşên roz û şebê
Der firqeta şêrînlebê
Zulma ji ber destê te bê
Ew [°]edl e em pir pê xweş î

Zulma tu kî pir pê xweş im
Şohtîdilê hicrankeş im

Mişlê perengê atêş im
Rûhek mucerred bêleş î

Min dî sehergaha elest
Camek ji kewşer dost di dest
Jê da Melê lew maye mest
Hetta heyatê serxweş î



Bab N (nûn) 77. Were canim ko çî nazikweres î

Were canim ko çî nazikweres î
Ji gul û nesterînan em te bes î

Tu şehinşahê besî min ji butan
Ne muhib her ne kes û xar û xes î

Ji xweh xanim vedînakî me bi tîx
Tu nebat î we li tebê meges î

Her şevem ne rezenan ta bi seher
Be segê koyê tu ra hemnefes î

Bê tu billah nebûyîn yek nefesek
Me tu yî rûh û mucerred qefes î

Cezbe dil radihejînit ji me lew
Di şevan nale ji rengê ceres î

Me ji zulfên di butan reştir e bext
Seheran tête perî pê nehisîn

Were meyxaneyê şahidperesan
Şemê te er ne biêsîn çî kes î

Me ji narî diye nûra te di dil
Lew ji işqa te her atesperes î

‘Eynê ‘ışq î n û di dil ateşê T or
Ji sena berqê cemalê qebes î n

Te divê dawê birî bit nihe da
Bibirim ser bi du enguşt meqes î n

Gerçi yekser li rexên fil-i şifet
Rast û çep bazî li seyr-i feres î n

Bi meyê şafî bidîn xerqeyê zerq
Bi xerabatê muşan er biresîn

Em qedîm bade dinoşîn ji tûhûr
Lew muqîm mest û xumar û teles î n

Me şevan cam di kef û yarê di ber
Hey hey û şuhbet û mîrê ‘eses î n

Me sera perdeyê horan e meqam
Ji siya zulfê butan er verisîn

Qelbê e‘yan dikirit hub we wucûd
‘Îşqê iksîr e we em sîm û mes î n

Mulhimê xeybê weh imla dikirit
Meded û feydê ji rûhu l-qudus î n

Cewherê ‘alî ye ‘unşur me Mela
Bi-l-ḥeqîqet ne j’ xewar, estuqus î n

Bab N (nûn) 78. Peyweste du ebrû li me mehbûbê kişandin

Peyweste du ebrû li me mehbûbê kişandin
Şed gezme peyapey li ezê xeste reşandin

Tîrek ji kemanê xedebê da cegerê rîş
Mil dane ber û ser ji du goşan veweşandin

Cohtê esedan pence li ser sîne nihandin
Kullab-i gihandin dil û hestî herişandin

Birhên te ji qudret ko numan goşeyê i^c caz
Peyweste kemanan li guhan goşe kişandin

Mihra te di canê xwe ji dil xef kiribû min
Dil çû ceger û sîne li ser canî ve şandin

Nûnên te hilalê bi qeran yek ji sura heq
Bê^c eyb-i li dêmê qelema xeybê kişandin

Neqqaşê ezel ismê cemalê ko nivîsî
Herfên te mucussem ji surê taze reşandin

Reyhanî û dîwanî û hem şulş û muselsel
Yek yek we hezar reng-i ji husnê neqqişandin

Ev ayeta nûrê ji Mela ra ko nivîsî
Katib ji surê nuqte bi zêrabê feşandin

Bab N (nûn) 79. Şox û şengê zuhrerengê

Şox û şengê zuhrerengê
Dil ji min bir dil ji min
Awirên heybetpilingê
Dil ji min bir dil ji min

Wê şepalê miskê xalê
Dêmdurê gerdenşemalê
Cebheta biskan sema lê
Dil ji min bir dil ji min

Zulf û xalan nûn û dalan
Wan ji min dil bir bi talan
Goşeyê qewsê hilalan
Dil ji min bir dil ji min

Dên nedîrê bo ˘ebîrê
Xemrî û gîsû herîrê
Sîne kir amancê tîrê
Dil ji min bir dil ji min

Surşîrînê nazenînê
Kuştîm û nakit yeqînê
Wê bi çengala evînê
Dil ji min bir dil ji min

Fetl û taban da xuraban
Ebleq û cohtê şebaban

Dame ber pence û kulaban
Dil ji min bir dil ji min

Xweşxeramê ez xulamê
Nazikê şîrînkulamê
Tûtiya eywanmeqamê
Dil ji min bir dil ji min

Mahirûyê miskiboyê
Surpilingê şêrixûyê
Wê bi zulfa şubhê goyê
Dil ji min bir dil ji min

Herdu weşman naz û xeşman
Kê ji ber wan °eql û hiş man
Sa°eta min dî bi çeşman
Dil ji min bir dil ji min

Mahitabê afitabê
Dêm ji roj û şeb niqabê
Xweş bi çengal û kulabê
Dil ji min bir dil ji min

Serwinazê serferazê
Şubhê zêr remza mecazê
Dame ber çakûç û gazê
Dil ji min bir dil ji min

Bejn û bala tûx û °ala
Min kirin vêk ra muçala
Çîçeka terhîn-i wala
Dil ji min bir dil ji min

Mîrê xazî şîrê tazî
Vêk-i ran min dî bi bazî
Kir li me j' xeflet ve gazî
Dil ji min bir dil ji min

Şîr û xişt in zulf û qişt in
Hin veşarin hin vehiştin
Pehlewanan dest vemiştin
Dil ji min bir dil ji min

Rohniya çehvên Melayî
Ew tecellaya te dayî
Ya ji Eħmed dil revayî
Dil ji min bir dil ji min

Bab H (hê)

Bab H (hê) 80. Ji remza dilberê dîsa

Ji remza dilberê dîsa
Li min baþin vejîn derde
Di lebsê tariyê min dî
Xwiya bû ew siyahcerde

Di lebsê tarî û nûrê
Perîrengê şifethorê
Ji Wadî eymena Torê
Muqeddes kir li min  erd e

Ji nar û nûrê teqdîsê
Tecella kir li min dîsê
Li ser textê xwe Belqîsê
Hilanîn bêhicab perde

 icab û perde avêhtin
Şeba reyhan hilavêhtin
Ji bircan tîr-i pir rêhtin
Gihan min rast û çep cerde

Kirim amancê mizraqan
Di dil da tîr-i çûn faqan
Bi celladê xwe ew xaqan
Dibêjit hêj tu xencer de

Bi derbên xenceran kuştîn
Bi xwîna şohr-i lê miştîn
Di çîna sinbilên qîşt î
Me dil pir misk û mawerd e

Gulên her misk-i ezfer lê
Ebîr û enberê ter lê
Semaya sosinan her lê
Bi zulfan mat û mawer de

Bi serwê sinbilên tarî
Bi hev ra bazî û yarî
Bicû da xwîn bibit carî
Ji qewsan gezmeyan berde

Ez im amancê wan tîran
Ji peykanan û sertîran
Bûyim polad li ber şîran
Seraser têk-i mam ber de

Ko dilber hate vê yolê
Ji ber pir hin ketin çolê
Ji qencan ko revand holê
Ji mehbûban birin nerde

Ji qedd û bejn û balayê
Ji reng û dêm û sîmayê
Tirengî qeṭ xeber nayê
Di ḥusnê cewherek ferde

Bi xeml û reng û re^cnayê
Bi mehbûbê bi zîbayê

Bi ew ھusna xwidê dayê
Ji gulrengan gula zer de

Nebat û şekkera lêvê
Nesîmê wê gul û sêvê
Hilînit perdeya şêvê
Şifaya hindekê derd e

Ji neqş û şunê cebbarî
Muţerra turreya tarî
Li nûrê miskê tatarî
Li ser wan xemriyan berde

Li ber rojê bibit xêlî
Binêrim qameta êlî
Qedîf û zerkeşê têlî
Zubad û misk û enber de

Bi sîmavê bi zêravê
Tu rojê neqşikê bavê
Ko da Erjeng ji wê navê
Li ber rojê nebit perde

Eger berqek ji wê rojê
Ji ber wê îqd û bişkojê
Bidit qelbî wekî dojê
Li ber dojeh dibit berd e

Di meydanê şirînçencan
Biçerxin mişlê şetrencan
Turaba ber pêvê qencan
Zubad û enberên gird e

Dibit bêjin wî sulţanî
Bi heft ayatê furqanî
Li mehbûban tu xaqan î
Were derbê li qeyşer de

Mela zanim ji meczûban
Tinê najî tu bê xoban
Dema dil dî bi mehbûban
Bi şox û şeng û esmer de

Dema cellad-i bân bazî
Bi şîr û xencerên tazî
Li dergeh da nekî gazî
Delal û naz û perwer de

Emanet da ji bêhoşî
Durên nasufte nefiroşî
Mela zanim ji medhoşî
Te dil bê xwab û bê xwird e

Bab H (hê) 81. Dilberê serdarê xwiban ez nizam agah heye

Dilberê serdarê xwiban ez nizam agah heye
Di hebs û zindanê esîr û girtiyê dermande ye

Girtî yem mayim di hebsê kî gelo mehder bikit
Carekê navê me bînit pir şewabek zêde ye

Miḥnet û ḥalê esîran kî li mîran ʿerḍe kit
Dê bitin pirsê li min lew pir bi reḥm û şefqe ye

Ger bipirsit carekê xatûn li ḥalê suxteyî
Qûfl û zincîr dê vebin bê ism û dest û mifte ye

Bend û zincîr dê vebin curḥên di kul dê xweş bikit
Lew ko navê dilberê dermanê derdê bende ye

Herçi bîvêrê ko navê dilberê bêtin li ser
Xweş dibit ḥadir di gavê bêguman û şubhe ye

Bêguman xaka riya wê tûtiya û dane ye
Ger di çehvên kor ve înin xweş dibin pê dîde ye

Meyyîtê şedsale jî wê rê vi ber qebrê kevit
Dê vejî rûḥ bête ser sata xwe bêtin zinde ye

Meyyitan lew radikit yekser dilan yexma dikit
Ismê ʿzem ma dizanit ya mesîḥa ew bi xwe ye

Ez dibê m Îsa ye ew ya Bû-Elî Sîna ye ew
Lew bi remz û îşweyan pîr mu cizat û şîwe ye

Şîwe û remzên di wê teşbîhê berqê lami^c in
Kohê Qaf bit ger dîkit sata xwiya bit perde ye

Perdeya mehbûb di nêv qelban ko dê ker ker bîkit
Qeṭ di perdê xef dibin Xurşîd û Mah û Zuhre ye

Zuhre û Xurşîd-i min dîtin di qewsê hemqeran
Surrê da dil^c eqreban çerx û sema û hey-hey e

Eqreb û qewsê qezeh vê ra muqabil Muşterî
Roj û şêv û nûr û tîrêj berq û hem ispêde ye

Ew hemî vêk ra mi dîn têkil di çerxê carekê
Hê ji wan bêhal im ez eḫwal û îşq û cezbe ye

Hal ji wê remzê giha min mestê wê remzê me hêj
Serxweş im ḫetta ebed bê cam û neql û bade ye

Serxweş im bê cam û mey remza nihên ebter kirim
Nagihan tîr dane dil lew kuşt e ḫadir suxte ye

Kuştiyan xewn dî liqa^oê lew bi wê dê xweş bibin
Hêviyan qeṭ nabirim meqşûd me dîdara te ye

Hêviyan qeṭ nabirim carek tu bêyî şefqe kî
Eqdê îḫramê dê bînim ḫadirî bim secde ye

Secdeya ber eswedan nadim bi şed ḫecekberan
Sond bi wan zulfan û xalan heçwekî bêjim we ye

Sond bi wê zulfa siyah ez ʿabidê husna te me
Xef dinoşim vê şerabê xweş şerab û qehwe ye

ʿUmrek e d'şojim bi xef çehvnêrê yek pirsek te me
Da beyan kim şerha halê dil bi herf û nukte ye

Şed hezar bar şakir im ez ko ji Belqîsa perî
Hudhudê şîrînzaban îro xeberdarê me ye

Ism û navê tey şerîf hey kir li min qelbê mirî
Lew di medhê te û senayê bûyî me çeng û ney e

Şubhetê çengê dinalim hêj ji dest daşa qedîm
Herwekî meş'el dişojim dost nizam ageh heye

Min divê ser li asitanê herwekî tolan nihim
Belki carek keyl bipirsit ev çi mehrûm tole ye

Ger bi navê toleyan carek vixwînit bendeyî
Bi Melê xweştir ji mal û gewher û gencîne ye

Gewher û gencên Melê husn û cemala dilber e
Şed te ʿale l-lah tebarek ev çi husn û cilwe ye

Bab H (hê) 82. Feleka eþlesê sergeþte di cama me þebab e

Feleka eþlesê sergeþte di cama me þebab e
Mewc didit qulzemê 'iþqê me li serdest e þurabe

Dil kemerbeste^oê 'iþq e me xwe zunnariperest în
Mey û me^cþûqe du^cayê me û seccade qibab e

Ji þicabê were der nazik û mestane bimeþ tu
Te cehan zîr û zeber kir bi Xwidê ev çî þicab e

Destê Cibrîlî hilavêtî ji bejna te niqabê
Bi yeqîn Qaf e li rojê were der sîne niqab e

Me bi iþraqî su^oalek ji lebê þunçe kuþa kir
Go bi ilhamê dizanî di su^oala me cewab e

Tu binê sazê bi awazê çî rengî me dixwazit
Ellah Ellah bi Xwidê qeþ dibihî ev çî xiþab e

Guh de nayê ji lebê le^l-i bi qanûnê þikayet
Dê çî þehde bi defê ra bidirit þehde rebab e

Xweþ perîþansîfet û mecme^ce^oê þûretê hal în
Pîrê 'iþq în û ciwanþeb^c û dilê 'ehdê þebab e

Dûredest în ji xiyalan me divê yek ji Xwidê ra
Xef di beþþa me ji dil bêt û birit^ceyn-i þewab e

Me muşerref ke du çeşmên me bisaşa qedemê ke
Pir li nik min heye mey mêze ke min sîne kebab e

Kesk û şoran tu binê çerx-i li dora du hilalan
Du qeran mane beraber şefeqê perde ʿişab e

ʿErʿeran ta di şepal in wereqan cezbe ye vê ra
Nêrgizan ser di giran in li binefşan xem û tab e

Çîçekên qewsê qezeh reng-i hezar reng-i sema ye
Sinbilan girtî xwinav û li gulan taze gulab e

Mest û hişyar-i heme keckuleh in reqş û sema têt
Ez nizanim çi neseq keyf e nizanim çi şerab e

Xaka payên te di rêza seg û tolan xwe dinasîn
Me ne sûc û ne gunah û ne xeşa ev çi ʿitab e

Ji wişala xwe zekatê bide miskîn û feqîran
Ko cemala te ye kamil di kemala xwe nişab e

ʿAşiqê mesʿelexwahê were em muftiyê ʿişq in
Destekê sunnet e tê da di yekê neşşê kitab e

Dil bişû tu j' vê nifaqê ko bidit sîne beraqê
Bi şefa hemrehê erbabê dil û ehlê şefa be

Nezera ʿeynê ʿinayet bi me da şahê wilayet
Ji ʿinayet nezerê dil me tejî ʿilmê ʿubab e

Lebê leʿlên te dibê her bi yekê nuqteʿê ʿilm in
Bi xeşe herfê elîf cezme şubê helqeʿê bab e

Xeṭ û xalên te bi mû mû ji me ra mes³elego yin
Me ji wan ḥaşıyeyan sîne tejî şerḥê lubab e

Ab-i ḥeywan te divê rast-i binoşî şebê qedrê
Destê ber gerdenê pîr pêc û xem an zulfê duta be

Me ji biskên te girihdar-i ji bextê xwe girê ne
Me ji zulfên bi xem û tab-i di dil da xem û tab e

Te divê berq û birûskan bireşînî tu nezer de
Te divê roj-i xwiya bit ji şibakê tu xwiya be

Te divê zîr û zeber kî me du zulfan bide ber ba
Te divê qenc-i qiyamet li me rabbit bi xwe rabe

Qeşd-i serçeşme³ê ḥeywan-i ḥeqîqet ke Nişanî
Bi cehanê mebe mexrûr ko cehan³eyni serab e

Serkeşî, şîwe³ê erbabê wefa nîne, riḥê min
Te ji dil şohtî Mela bes bi Melê ra bi cefa be

Bab H (hê) 83. Muḥbetê miḥnet di zor in

Muḥbetê miḥnet di zor in
Ḥub dibêm bêşek bela ye
Umr û jî xweş pê diborin
Şotin û derd û cefa ye

Şotin û derdê evînê
İlletê daḫ û birînê
Xweş dibin ma ew bi dînê
Şerbeta lêva mufa ye

Her dilê şotî bi ulfê
Yar ne derman kit bi zulfê
Ta ebed ew bend di qulfê
İşiq derdek bêdewa ye

İşiq derdek bêtebîb e
Lê mufa weşla hebîb e
Kuştîme cewra reqîb e
Pir leînê rûsiya ye

Daḫ û key min lê hezar in
Gul di dest şewkên bixar in
Surperî dêw wê l' kinar in
Ehremen xatem reva ye

Ṭebê dêwan dest gehîştê
Ḥor û wildanên bihiştê
Aşiqê dilbendê qîştê
Can bidit yek car rewa ye

Miḥnet û cewra ḥebîbî
Qehr û azara reqîbî
Heq tinê da min xerîbî
Lê şukur baxwoy we daye

Rohniya wê şewq û tavê
Şerbeta qend û gulavê
Kes nehin meḥrûm ji navê
Lê tinê bo min xela ye

Bêneşîb min dî ji camê
Dûridûr meḥrûm ji ramê
Girtiyê wê qeyd û damê
Ev xerîbê canfida ye

Dûredest im bêneşîb im
Dilberim xanim ḥebîbim
Pir ji dîna te xerîb im
Rûḥ û raḥet min liqa ye

Pir mulazim têm liqayê
Mame ḥetta multeqayê
Min riḥê şîrîn didayê
Hudhud er mizgîn bidaye

Hudhudê riḍwanê xeybê
Şed xeber şîrîn ji ceybê
Da dilê min murde ḥey bê
Guh li rê min wek şeba ye

Çehvenêr im guh li rê me
Lê şeba rê da ye bê me

°Erđihala muħbetê me
Bendeyek şadiq Mela ye

Canfidayê min di rê da
Firqetê derbek we lê da
Qalibek bêrûh e wê da
Kuşt dibêm min lê rewa ye

Dem bi dem ew çehvenêr e
Bête nîşanek me jê re
Da bibit ew zinde vê re
Yarê şadiq bêbiha ye

°Aşiqên şadiq di kê m in
Ma dibê şed can fidê min
Zanim ew najîte bê bin
°Aşiq û pir muhtela ye

°Alim î n em vê dizanîn
Cism e ew em rûh û can î n
Qeţ ji hev baţin xwiya nîn
Gerçi zahir ew cida ye

Hudhudê wê remz û razê
Ba bû ew çû goft bi sazê
Qişşe bir beħşa mecazê
Qaşidek xweştêb^c-i ba ye

Ba demê weqtê mecal da
Çû kû ew yareh bi pal da
Qişşeya ħalî bi ħal da
Guh didêrit yar-i ba ye

Muḥbeta meḥbûb û latan
Pir vekir zîwersifatan
Daye qelb û rûḥ û zatan
Roj di mir'atê xwiya ye

Muḥbeta şorî du qism e
Qufl û miftaḥ û tîlism e
Hin ji rûḥ in hin ji cism e
Nar û nûr e hin hewa ye

Ḥubbê cismanî du roj in
Gerçi dil pir pê dişojin
Xef ceger peykan dinojin
Mişlê neqş-i bêbeqa ye

Gul ḥeta şohr in bi tê ve
Bên tebessum pê ve pê ve
Bilbilê serxweş di nêv e
Nexme û nal û newa ye

Herçi cilwa bû ji navê
Nû gulek dî girt xwinavê
Wî ji dil çû muḥbeta vê
Ew bi ya dî ra teba ye

Herkesê muḥbet ji rûḥ e
Mubtelay nûra subûḥ e
Wî di dil da şed curûḥ e
Cezbe û lertzîn û ta ye

Herdu rûḥ yek nûrê tav in
Çerxek û du stêr di nav in

Herdu dane murxê dav in
Ismê hey dav lê veda ye

Nûr e pir nadir wucûd e
Gerçi ewwel nar û dûd e
Berqê lami^c dê li kû de
Hûb di qelban kîmiya ye

Arif î cewherşinas î
Ê bi vî weşf û libasî
Dê qedir behter binasî
Meq^cedê şidqê ceza ye

Dûr nekî da wî ji derê xwe
Wernegêrî ji wî berê xwe
Boriye ew di serê xwe
Ser di nava rê nihaye

Ma dibit ew dûredest bit
Dê ji fincana te mest bit
Cam ji şehkasê bi dest bit
Ebteran ew mey dewa ye

Yarê pir husnek li bal bû
Dilberek xayet cemal bû
Ew bi hal ageh bi hal bû
Şubhê wê şefqe w^c eîa ye

Mehdera wî xeyrixwazî
Nukteyek j' wê remz û razî
Wê bi dil şeh kir ji sazî
Muxnî û qanûn û nay e

Yûsifê dewr û zemanî
Go nesîm han vî nişanî
Lê ji bo nekhê dehanî
Nexweşan ew lê şifa ye

Mawera belgên gulê bû
Bihn û bûya kagulê bû
Darûwê qelbê Melê bû
Lew bi çehvên min cila ye

Banesîm dê çî lezînî
Sağ û salim ma tu bînî
Vî kumêdî lê gehînî
Da siwar bit lê peya ye

Xefletî, bayê nesîm hat
Xef ji bal yarê kerîm hat
Pir bi ihsanek e'zîm hat
Qaşidê şahê geda ye

Dil nefes dîsa bi ber hat
Lew hekîm Luqman bi ser hat
Nafi'ê derdê ceger hat
Tali'ê kewkeb numa ye

Min ko ew nîşan giheştê
Ev dilê şed daş-i reş tê
Zerreyek xweş lê neheştê
Ismê e'zem pê gihaye

Çûme ser pişta kumeydî
Min jî pir ew jan û key dî

Behr û ber me l' ber xwe t̄ey dî
Deşt û çol û Kerbela ye

Me w nesîm xweş pence t̄ek ra
Wê diçîn wek t̄eyr-i v̄ek ra
Behşê zulfa yarê pêk ra
Borê îşqê pir fira ye

Gunbeda nûrîn xwiya bû
Spêdeya şadiq numa bû
Yek bi yek şewqê veda bû
Qeşr û eywan û sera ye

Qumrî û bilbil dixwînin
Lê eceb ew xweş dimînin
Her seher mehbûb dibînin
Endelîb v̄e ra teba ye

Buxçeya şorgul di geş t̄e
Çîçek û reyhan-i reş t̄e
Dilrubayan tîne geştê
Sinbilan ta-ta sema ye

Sebzeya şebnem gulav lê
Şor eqîqan dur xwinav lê
Dilberan seyran û rav lê
Er eran sîtab-i daye

Bûm şerîf ez b' asitanê
Şahidên wê gulistanê
Saqiyan cam cam didanê
Kewkeban seywan veda ye

Çendekê çemen xurem bû
Lê medam ew şubhedem bû
Min bi hiş baxê Irem bû
Lê şeba go min Seba ye

Şef bi şef wildan perî bûn
Bendê zulfa  enberî bûn
Têk li dêmê muşterî bûn
Reqş û govend û şefa ye

Pir  umir min çû bi suxtî
Lê şukurxwaz im ji bextî
Zuhreyek bû ew li textî
Belko bêm Şemsu  - u a ye

Perdeya xelwê ko hilda
Yengiyek min dî di mil da
Gezmeya jehrî li dil da
Qe  nego qetl û xe a ye

 adirî çûm secde jê ra
Lê niyet ihram ne vê ra
 Aşiqê ev gezme tê ra
Herçi  a et kit rewa ye

Çûm ziyaret pê û destî
Lê nehişt ewwel bi qestî
Da bişojit rû  û hestî
 Aşiqan şotin ceza ye

Şerbeta weşla xwe nadet
Ta hinek  aşiq ceza det

Dilberan ev reng e  adet
Mehr yan kemtir wefa ye

Pi e wan  enc   naz e
 en  et  a iq niyaz e
Yar li ber zazan  icaz e
 erbeta  ir n mufa ye

  m  ewafa p    destan
 ubhet  sekran   mestan
Ehl  hal   xobperestan
Wan ji   umr ev mudde  a ye

Tilliy n nazik  emal n
Min li ser  ehv n xwe mal n
 alib  werd n bixal  n
Dil di v  fikr  teya ye

     umir mi d' v  xiyal 
Ma  evək  dan di sal 
B m ziyaret zulf   xal 
Roj    ev min ev du  a ye

 erx ditirsim kit  itab 
Z  ecel p  det rikab 
Can biret mi d' v   zab 
Ev siyahreng ejdeha ye

 endek   adiq cema bin
Er bib ji can fida bin
Wek Mel  lazim tu nabin
W  ji dil can  xwe daye

Bab H (hê) **84. Dilberê serdarê xûban**

Dilberê serdarê xûban
Ez nizam ageh heye
°Arif e bi halê qulûban
°Alim e bi halê me ye

°Alim e b' daxê fu'adan
Gezmeyên wan nûn û şadan
Çûne dil hetta biradan
Yengiyê reşgoşe ye

Gezmeyên wan şad û nûnan
Awirên eswed°uyûnan
Radikin ew qetl û xwînan
Min diye û dil şehde ye

Lazim e l' sulţan û mîran
Pirskirin l' halê esîran
Em kirîn amancê tîran
Suxtayên dermande ye

Hêj nizanim mîr di bîr î
Zanit em sî sal esîr î
Çehvenêr pirsek emîr î
Lew bi rehîm û şefqe ye

Pir dibêm şefqe li bal e
°Arif e û şahîbkemal e
Carinan bêne xiyal e
Pirs bikit çi lê heye

Şefqe kit carcar nihînî
Toleyê astan vixwînî
Da vekim dağan bibînî
Nar û pêt û şu^{le} ye

Da bizanit pêt û nar im
Kuştîyê cohtê xumar im
Muħbetê şohtim biwarim
Lazim ew zanit we ye

°Alim e b' derd û birînê
Ma dema dîdar û dînê
Xef dibit remza evînê
Vê bizan bêşubhe ye

Herdema dilber diyar bit
Can û dil têk tar û mar bit
Dê çî reng muħbet sitar bit
Xefkirin bêfeyde ye

Herdema meħbûb zuhûr bit
Zêde mezher bêquşûr bit
Dê tecellayek li ˆor bit
Berqê lami^c cezbe ye

Cezbeyê dil ji wucûd bir
Xef ji ber °eynê hesûd bir
Min di miħrabê sucûd bir
Lê hecer nişane ye

Secdeya ber nûn û dalan
Min ˆewafa zulf û xalan

Ev bes e j' şahibcemalan
Da biçîn lê^c umre ye

Ê yekê şadiq hebînî
Bêhicab ger ew bibînî
Ma li hişyarî dimînî
Serxweşê bêbade ye

Îşq e tuxraya nihînî
Herdema mehbûb dibînî
Dê bi dil lazim bixwînî
Ev çi ism û nusxe ye

Lami^c a wê husn û nûrê
Gerçi tê dil şubhê Torê
Başına nayê zuhûrê
Lê hicab û perde ye

Arif in me^c naşunas in
Lê bi şed şûret libas in
Xeyrê mehbûb wan nenas in
Xef ji wan zanî me ye

Ê li min yengî kişandî
Şed xedeng vê ra reşandî
Dil ji derbê herişandî
Ez kirî extirme ye

Lazim ew zanit bi halî
Dilber û yarê muwalî
Gezmeyên qewsên hilalî
Derb li nîva sîne ye

Hêj dibêm mehbûb nizanî
Min ew e rûh û kiyanî
Pirs nekir bîra xwe nanî
Ev çira perkende ye

Pirs nekir şahê cehanî
Yûsifê dewr û zemanî
Ev çi xak e l' asitanî
Bel esîrek j'ên me ye

Bûme xak ez lew ji rê ve
Da dema yar bê ji wê ve
Damenê bigirim ji pê ve
Çendekê min cehde ye

Çendekê taqet didêrim
Bim xubar bedrê veşêrim
Ger ji çehvan ez biwêrim
Min zenexdan telbe ye

Da binoşim mey ji lêvê
Mawera reyhan û sêvê
Lûlûyên şekkir di nêvê
Ab-i heywan çeşme ye

Çeşmeya ava heyatê
Şerbeta qend û nebatê
Min li dağan ew mufa tê
Can ji bo şukrane ye

Lew weko sewda û dîn im
Herdema dêmê dibînim

Dîn dibim heyran dimînîm
Muşterî ya Zuhre ye

Şems di nêv birca şeref da
Şed kewakib çar teref da
Muşterî hatî bi ref da
Istiwa çû qible ye

Afitabê d' istawayê
Ez ji ber derb û cefayê
Canfida tême liqayê
Şubhetê perwane ye

Min tu yî meqşûd ji jînê
Min ji ber mewca evînê
Şed dikem dîdar û dînê
Mezher e bes zêde ye

Rohniya çehvê nebînan
Murşidê mecûb û dînan
Darûwê derd û birînan
Min teleb dîna te ye

Bêne pê nazik mubarek
Deyne ser çehvên me barek
Min curûh xweş bin bi carek
Rohn bibin pê dîde ye

Bên kefa nazik ji nûrê
Tilliyên cama tîhûrê
Bihn ji mawerd û bixûrê
Min ziyaret tewqe ye

Da li ser çehvan bimalim
Bilbilê werdên bixal im
Carekê rehmê ke zalim
Şefqexûy heqqê we ye

Er nekî rehmê tu mîro
Dê çi bit halê me îro
Qeç nebê carek esîro
Girtiyê sîsale ye

Şoncihê peykan û neşlê
J' tiliyên yaqût û feşlê
Er nekî derman bi weşlê
J' derb û tîr û gezme ye

Gezmeyên yarê ko bavê
Ne j' mey û qend û gulavê
Bêt dewa kit wan di gavê
Ma heyatek lê heye

Ne tinê qend û nebat î
Mezherê rûh û heyat î
Hem but û 'Uzza û Lat î
Lew me dil butxane ye

Xwendê latê Azer î tu
Bê çi şîrîndilber î tu
Her cihê lê bêwer î tu
Bêxilaf ew ke'be ye

Ma dibit bêxin xilafê
Ser didit ba vê nişafê

Er bikî bême tewafê
Min bi eswed secde ye

Da ziyaret kim nişanê
Ber Zuhel bêtin qiranê
Tole yim ser l' asitanê
Çehvenêrê mûçe ye

Ma bi zehrê şekkerînê
Mûçe dî da xef bixwînê
Da reqîb mel'ûn nebînê
Pir »^celeyhi l-le^cne« ye

Ger bibexşî dil muradê
J' wê heyat û xemr û badê
Da nekim gille û dadê
Dad me dîsa ber te ye

Guh bide ber gilh û dadan
Hakimê şehr û biladan
Dê tu daxwaz û muradan
Dî kesê bêçare ye

Dê tu dîsa şefqetê kî
B' ew nişana cebhetê kî
Me j' herêmên xidmetê kî
Mehermên bêperde ye

Bê nişanên me nişan kî
Mah û Xurşîdê qiran kî
Bende kelbê asitan kî
Dûr nekî xweş tole ye

Da dema şuhbet bi coş bê
Cam bi xweş le^clan bi noş bê
Me j' hebîb şed deng surûş bê
Dînber û pir^cişwe ye

Şerbeta wê cam û taşê
Yar ko tê bête 'n^cikasê
Bêt me jî feyde^c ji kasê
Ab-i heywan ew bi xwe ye

Ê ji vê zerfê vexwarî
Xwendî ew xet^ctê xubarî
Mestiya çehvên xumarî
Qenc dibê ew zêde ye

Min li dil tîrik muşil dî
Têk ji ber xwînê qizil dî
Lê dibêm derdê ko dil dî
Hêj ji çehvên şehle ye

Rohniya çehvên Melayî
Xaliqê husna te dayî
Hub tinê da min gedayî
Husn û hub yek çeşne ye

Dîtiya nûra yeqeq me
Şed neseq lew tîn sebeq me
Pir nebî erzan li heq me
Lê Mela xweş bende ye

Bab H (hê) **85. Turreya tabidarê °enber ke**

Turreya tabidarê °enber ke
Xemriyên şeng miskê ezfer ke

Li gulan misk û °enberê bireşîn
Ji gulavê cinesriyan ter ke

Kesk û şorên ji rengê qewsê qezeh
Ji serapa gulav û mawer ke

Surmepoşên surê bi ser kil de
°Aqilan lê xerab û ebter ke

Her seher ji nû destikê wergir
°Er°erê têk da seraser ke

Qedd û qama şerîf û nazik û ter
Lê seraser bifeşîlîn û ker ker ke

Nêrgizên sergiran hilîn carek
Du qiran lêk beraber ke

Tu bimeş kok bi ser derê qeşrê
Bi xwe kokî li şah û qeyşer ke

Were wek roj bi ser derê kelhê
°Alemê têk da munewwer ke

Wek gula zer bû serwa te mirim
Me bi qurbana xwe wek gula zer ke

Wek gulek zer di buxçeya te me ez
Tu me têkil xwe wek gula zer ke

Zahidê hişkişeb^c sewda ye
Bi du caman tîbî^c etê ter ke

Veke carek bi xende şekeriteng
Têk mişra me qend û şeker ke

Pê li ser dîdeyên Melê dayîn
Xelweya şofiyan munewwer ke

Xeçç û xalan nişanê Nişanî de
Me ji navê xwe ra bi defter ke

Bab H (hê) 86. Gerçi bilbil cewherê zâtê gul e

Gerçi bilbil cewherê zâtê gul e
Lê gulê rewneq ji îşqa bilbil e

Guh de zîkrê hal û coşa badeyê
Wê bi bilbil ra dixwînit bilbil e

Sosinan şed reng-i avêhtin kemend
Wan nego dil bendê tayek sinbil e

Sinbilan seywan li dêmê taze kir
Afitab îro di Birca sinbil e

Qeş verêkê vê demê haşîr dibit
Qişşeya feşlê ne karê sinbil e

Erêrên rengîn ji tayên şor û zer
Qumriyan şed reng-i şîrîn xulxul e

Remzeya îşqê ji bala hate xwar
Qudsiyan avêhte çerxê xulxul e

Min di dil naşorekê da hestiyan
La cerem hêj neş'eya daşa kul e

Bilbil û perwane ew feşl û dem in
Cinsê îşqa min tinê derdê »kul« e

Nêrgiza nazîkqed û şehlaya mest
Dîn kirim ez bilbilan sewda gul e

Tebe lami weş zi minnet Bu l-Ĥesen
Min di dest da Zû l-fîqar û Duldul e

Eşqerê bedfî l-i çî hî kir eceb
»Bareke l-lah« xewş bezî espê qul e

Zulf û bîskan pîr ji min dil bir belê
Rîşteya canê Melê ew kagul e

Bab H (hê) 87. Yar-i me pir nîşan û sir sîma ji dur dêm kewkeb e

Yar-i me pir *nîşan û sir sîma* ji dur *dêm kewkeb e*
Ew lebşeker *nazikbeşer cebhetşeher kagulşeb e*

Şebkagul e *xalfilfil e çînsinbil e dava dil e*
Min xefletî *dî qibletî* wek mah ditî *-sa xebxeb e*

Min dî bi xef *şuḥbet bi defşahê* Nefef *fincan di kef*
Nûnên ji Yeng *berdan xedeng wê* pir ji teng *şîrînleb e*

D'anî zuhûr *dêmê bi nûr xalên di hûr cama teḥûr*
Saqî werîn *cama zerîn ew surşîrîn cam meşreb e*

Xal û xetê *şoxqametê* me ji vê kitê *-b û destxetê*
Herdem ji new *dil feyde ew ev îşq û sew -da mewheb e*

Min bêqedar *ev sir veşar îşqa xedar şohtî sitar*
Mihra butan *xal û xetan şendûqexan û meqleb e*

Dêmê bixal *ew nûn û dal ismê celal bejna şepal*
Yekta elif *nayê weşif min eqlê tîf -lî mezheb e*

Hetta nemam *salik tamam şîrînkêlam ma da me cam*
Bê cehdê qeṭ *tên emr û xeṭ herçi ko meṭ -leb menşeb e*

Dermande yim *ḥeyran te yim pîrane yim xweş bende yim*
Zaza bi sir *dil j'êm vekir derḥeq me pir erzan mebe*

Bergên gulê *ew misk e lê hûr hûr welê derḥeq Melê*
Bêperde û *xweşme de û yekwe de û pirşefqe be*

Bab W (waw)

Bab W (waw) 88. Me lew fincan li ser dest e ko mehtaba hilal ebrû

Me lew fincan li ser dest e ko mehtaba hilal ebrû
Numayên min di mir³atê meya şafa zelal ebrû

Bi şîrînî bi zîbayî bi reftarî bi balayî
Binê nûnên di tuxrayî li bala herdu xal ebrû

Bila bêt şaimu d-dehrî û bila iftarê carek bit
Kesê zanî ji dilber wê xwiya bin her du sal ebrû

Meşî mestane reyhanî dilê min dî di amancê
Reşandî sîneyê tîran bi qewsê her du mal ebrû

Sehergeh zuhresîma wa diçû gulşen bi seyranê
Bi ser çehvên Nişanî da xiramê ew hilal ebrû

Dibên xawerperest î tu nizanin min di keşfê da
Numayên min di şerqê nazika gerdensermal ebrû

Tinê ma her terazû ne di babê husnê kêşayî
Hilalê xatemê husn in li wê dêmê bixal ebrû

Me cewher^c unşurik xamis numa îro di çali^c da
Di vê teqwîmê insanî li çali^c bûne fal ebrû

Bi zunnara di dêrê da li hindava çilîpayê
Bi mihrabê me bir secde belê emma xeyal ebrû

Di mabeyna du ebrûyan dibînim qabê qewseynê
Didit min terfeti l-eyni cewaba şed su'al ebrû

Di bañin secdegahê min li ber wan herdu ebrû ne
Bi 'eynê taqê mihrab in di 'ilmê ehlê hal ebrû

Eger de'wayê Mûsayî di 'iştê da bikim ca'iz
Mela dayim tecella ye ji wê terha şelal ebrû

Bi şîrînî bi zîbayî çî katib bû we kêşayî
Te'ale l-lah nişan dane we şîrîn ev mişal ebrû

Ne şîrîna li derbendê ne mehbûbê Semerqendê
Ne kêşayîn bi vî rengî li neqşê bêzewal ebrû

Nişana qabê qewseynê ko qews avête ebşaran
Di teqwîma tecellayê bi ser lê bûn hilal ebrû

Bab W (waw) **89. Min dî seher şahê Mecer lebsê di ber mexmûr-i bû**

Min dî seher *şahê Mecer lebsê di ber mexmûr-i bû*
Ew dêmzerî *surmûşterî ya reb perî ya hor-i bû*

Horîweş e *şîrînmeş e kagulreş e xalhebeş e*
Xalên di qer *miska teter nazikbeşer kafûr-i bû*

Nazik leîf *gerdenzerîf lebsê şerîf kêmxê û qedîf*
Min dî bi wext *ew nêk bi xet îro li text fexfûr-i bû*

Fexfûrsur e *sîmadur e heybetpur e pir dil gur e*
Ew hate miş *min çûne hiş dil min di îş -qê fûr-i bû*

Dil bû kerî *zaya berî lazim herî dê ew zerî*
Min dî gelek *ew surmelek wek meş^celek pir nûr-i bû*

Dêm fener e *xal enber e bo mawer e leb şeker e*
Ew meyperest *meşha û mest cama di dest ferfûr-i bû*

Mey ber kefê *meşha şefê soza defê da qerqefê*
Husna li dêm *wesfan neşem herçi dibem jê dûr-i bû*

Da min surûş *wer mey binoş zewq û xwirûş lew çûm ji hoş*
J'wê *işweya yar bû xwiya ew ne j'meya engûr-i bû*

Min dî b' xewab *ew mahitab da dil kulab cohtê xurab*
Dil şewwişand *xwê lê reşand xweş herişand têk hûr-i bû*

Hûr kir cesed *qewsên şemed tîr dan kebed dad û meded*
Cerhan ji new *xwîn daye kew îşqa me lew meşhûr-i bû*

Lew yek neseq *min tîn sebeq nûra yeqeq da dil şefeq*
Şîrînlebê *dêmkewebê lê bende bê destûr-i bû*

Dilber nezer *da min seher xecilîm ji ber lê ew qeder*
Zanim goya *ew mahrûya wek lû'lûya menşûr-i bû*

Paş firqetê *zor muhbetê mi j' tel'etê çûm hedretê*
Weşla hebîb *min bû neşîb mel'ûn reqîb rencûr-i bû*

Cama zelal *xemra helal yarê şepal da min bi hal*
Îşqa xedar *şohtî sitar nêv me û yar şed sûr-i bû*

Şahî cevîn *xem jî revîn marê şevîn îsand evîn*
Derd û bela *wên çûn hela umrek Mela mehcûr-i bû*

Pir min zecir *dîtin hecir ma bû ecir şubh û fecir*
Şem'a me hil *-bû şed emil minnet me dil mesrûr-i bû*

Yar we'de da *b' le lên xwe da wer ba me da çîn perde da*
D' spêdeyê *çûm we'deyê ko j' badeyê mexmûr-i bû*

Ihram mi best *eswed bi qest yar hate mest ez çûme dest*
Cohtê hebeş *tîr dan bi weş hecca mi xweş mebrûr-i bû*

Wê kagulê *çînin dilê qelbê Melê dav dane lê*
Dava dilan *nêv sinbilan ser şorgulan menqûr-i bû*

Bab W (waw) 90. Di dest da yengiyek nûbar-i min dî ew keman ebrû

Di dest da yengiyek nûbar-i min dî ew keman ebrû
Li bala cedwelek cebbarî lê da hemqiran ebrû

Ko heq ev herf û xeş kêşan li talayê me derwêşan
Du qewsan goşe lê badan we ser peyweste man ebrû

Te dîdarî te reftarî te elmasên şekerbarî
Bi eynê rê li ser şadan du nûn reyhan numan ebrû

Bi hemdi l-lah bi feyrûzî li wechê dilberê min dî
Ko mahê nû nişan min dan li taqê asiman ebrû

Te ale l-lah nişan dane bi husnê ev neseq dane
Ji neqş û şen etê heq ev nişan çeşm ev nişan ebrû

Ji re na nêrgizên şehla mecalê hemqeran bînim
Hezar remz û îşarat in ji wan qewsên çevan ebrû

Mela dil tîk te peykan in ji mehbûban me nişan in
Kemandarên di xeddar in di birca esmeran ebrû

Bab W (waw) 91. Wey spêde j' Bircê qews ebrû numandin mah-i new

Wey spêde j' Bircê qews ebrû numandin mah-i new
Xweş ji qewsê ebrûyan vê ra kişandin mah-i new

Goşeyên nûnan bi ser badan ji qewsê bêweter
Mişlê engušta Nebî şed ser beyandin mah-i new

Keşşifti bedra tamam ehsen ji bala tel^cetê
J' istiwa da gezmeyan çerxê reşandin mah-i new

Wê li wechê afitabê gah-i kifş û gah-i xef
Arifên ehlê bişaret heyirandin mah-i new

Mil dizanim dane ber qewsê hilalî goşezê
Lew ji bala goşeyên nûnan livandin mah-i new

Ez dibêjim dê li min dîsa ceger şedpare kin
Wê bi mîzan herdû şîrazî çevandin mah-i new

Daxilê meclis bûyî îşev Nişanî lew ko xef
Cam-i rûhanî li ehlê dil nişandin mah-i new

Bab W (waw) 92. Hê di ber qalûbelayê belko ev ʿalem nebû

Hê di ber qalûbelayê belko ev ʿalem nebû
Çerx û dewran dewrê gerdûn gunbedê mîna nebû

ʿErş û kursî hêj di mexfî bûn di kenza qudretê
Husnê heq bû istawayê lami ʿa ʿîşqê hebû

Nehtibûn hukmê şifatan ew ji zâtê lem-yezel
ʿAşiq û me ʿşûq-i yek bûn şem ʿ û hem perwane bû

Husn û hub zâtê qedîm in lê cida bûn ew ji yek
Lê niha ismê hudûşê hikmet û tefşîl we bû

Yek di zâtê surşirînan bû cemal û husn û sur
Yek di qelbê ehlê dil nar û celal û cezbe bû

ʿAşiq û me ʿşûq-i el-heq herdu mir ʿatê yek in
Lew di eşlê cem ʿê da eşlê qedîm ayîne bû

Cezbe û seyra sulûkê bêmehebbet nabitin
Cehdeya bê ʿîşq û hub çendî ko kir bêfeyde bû

Salikên ʿîşqê yeka yek hewce nînin ez bibêm
Cameya pîrê terîqê ser ji nik şehzade bû

Reng û reng ehlê meqamatê terîqê çûne seyr
Hin celal û hin cemal û sermeyan ev bade bû

Ê birî °eynê beqayê badenoşê °işqê bû
Ê bûyî meḥwi-fenayê °aşiqê bêçare bû

Êk ji wan perwane bû şoht û fiḫanek jê nehat
Êk ji wan teşbîhê goyîné bi ah û nale bû

Awirên eswed°uyûnan °aqilan sewda dikin
Gezmeya °aşiq vi dil keftî ji çehvên şehle bû

°Aşiq û me°şûq-i da waşil bi yek bin bêhicab
Meḥw-i bû bi-z-zati °aşiq lew di °işqê perde bû

Lew di °işqê da fena bû da bibit baqî bi dost
°Aşiqê fanî nebû waşil hetta baqî nebû

Nuqṭeyê °ilm û sewadê herf û neqşê °alemê
Ser didin me°nayekê eşlê sewadê nuqṭe bû

Her yek e û dê yek bimînit ewwel û axir yek e
La cerem nabî du bê, ê dê bimînit her hebû

Herçi de°wayê di °işqê da Melê şabit kirî
°Eynê de°wayê di nefsi l-emri dîsa şehde bû

Bab W (waw) 93. Kes ned'ye sehergeh ko çi nazikweres î tu

Kes ned'ye sehergeh ko çi nazikweres î tu
Me j' belgê gul û nêrgizê sermest-i bes î tu

Zanim ne tinê ko yedê beyda tu didêrî
Wer xweş ke şehîdên xwe ko îsanefes î tu

Rûh î tu ne cism î ji cemalê bi çi ismî
Reng-i reng-i tibî keşf û şuhûdê çi kes î tu

Roj î tu li şerq î bi cemala xwe we berq î
Bi l-lah ko ji ser çeşmeyê eqdes qebes î tu

Bi l-lah ji çi nûr î we tecella li çi Tor î
Geh geh li seraperdeyê can multemes î tu

Şemsa felek î ya melek î hê jî nizanim
Horî û perî ya bi xwe Rûhu l-qudus î tu

Cana ceres û rehberê îşqa te ez im qeş
Ageh bi fişan û herekatê ceresî tu

Ma yek nefesek min dibitin bê tu wucûdek
Dê bê te çi bim hem tu ruh î hem nefes î tu

Îşqa te me go zêrişifet zerd kirîn go
Iksîr e evîna me bi îcynî we mes î tu

Min go ji nigaran tu gul î bes bişukuh be
Zanim ne muhib her ne kes û xarûxes î tu

Ey horîsiriştê li me xweş meywe te ber kir
Cennat e di weşla te we atêşperes î tu

Min go di şevan şubhê nucûman bi tewaf î
Go îşwe dizanin bi çi qest û hewes î tu

Min go me bi tîxan vedê nakin ji derê te
Go em ji nebat î we li tebê meges î tu

Min go ji kemenda serê zulfa te verestim
Perwazê lebê le'le me go ger veresî tu

Yekdem venehiştî te di hamûnê firaqê
Bê hemdemê derdan ko çi firyadres î tu

Min go ji dilê şubhê bixûr xweş te bi ker kir
Ker kir bi du le'lên xwe şeker go edes î tu

Min go li rexan î neko kecrew weko ferzîn
Şah gote mi kiş mat-i li baz-i feres î tu

Min go te divê ser ji reqîbî bibirim ez
Go min diye zanim dibirî jê meqes î tu




Ta çend-i bixef bade binoşî we nefes da
Îca bi def û ney were mîrê eses î tu

Min go ji qedîm ez meyê îşqa te dinoşim
Go min ji îşqaqan ne tinê mey teles î tu

Min go di şevan şubhê şemalan we dişojin
Perwaneşifet ca here bê şewt û his î tu

Min go beşer û quwwetê sem^ca mi tu yî go
Zanîn te em î n rûh û mucerred qefes î tu

Te ji zulfê butan şihhet Mela reştir e tali^c
Yarê te seher bêt û biret pê nehesî tu



Bab L (lamelîf/elîflam)

Bab L (lamelîf) 94. Îro ji derba xencerê

Îro ji derba xencerê
Lazim biêşan î Mela
Teşbîhê zulfa dilberê
Zanim perîşan î Mela

Zanim perîşan î ji dil
Bêhed biêşan î ji dil
Teşbîhê biryan î ji dil
Bi l-lah ne insan î Mela

Bi l-lah çi teb^cet adem î
Yekser dibêm yek^calem î
Deryayê Qaf û Qulzum î
Yan çerx-i gerdan î Mela

Ya reb çi wê mişnetkeş î
Ser ta qedem têk ateş î
Mecrûhê qewsê tûzreş î
Lew dil bi peykan î Mela

Zanim ji îşqê dojah î
Beherk ji narê asih î
Îro li mahê xergeh î
Teşbîhê seywan î Mela

Ev sîneya wek nay û ney
Pir lê kişandin daḡ û key
Hê dil bi naehlan didey
Ya reb çî nadan î Mela

Durdaneya dêmgewher e
Ayîneya Eskender e
Bê murweê dil kir ker e
Mecrûhê xalan î Mela

Bê murweê dil herişand
Teşbîhê şîşê lê kişand
Ker kir ceger xwê lê reşand
Ateş li ser danî Mela

Narê ji rengê dojhê
Husn û cemala wê mehê
Me d'perdeya vê xergehê
Xef kir çî 'Umman î Mela

Îro li 'umrê xwey telef
Bê şahid û cama şedef
Bê çeng û saz û nay û def
Zanim peşîman î Mela

Zanim te kohê Tor e dil
Lew her bi nar û nûr e dil
Şehkaseya ferfûr e dil
Lew mest û sekran î Mela

Her sîne tabê natemam
Napuxte xam bê mihr û cam

Xerqên di xwîna dil medam
Le'la Bedexşan î Mela

Pir le'l û dur te j' kilkê 'îşq
Anîne nezma silkê 'îşq
Der berr û behrê mulkê 'îşq
Me'lûm e xaqan î Mela

Bêhed li qelb-i şubhê ney
Cewra te danîn daş û key
Lew bêhemel xweş nîne mey
Emma bi şîranî Mela

Minnet ji talî her ji bext
Aşif bi text û bext û rext
Belqîs ewî anî bi wext
Îro Suleyman î Mela

Ew herdu le'l û herdu weşm
Geh geh bi naz û geh bi xeşm
Ew bejn û bala hate çeşm
Me d'seyrê rûhanî Mela

Bab Y (yê)

Bab Y (yê) 95. Ey şahidê qudsî veke bendê ji niqabê

Ey şahidê qudsî veke bendê ji niqabê
Ta çend-i we sergeşte bimînin di hicabê

Biskên ji herîrê tu ji nû mawerê lê ke
Zulfên ji ʿebîrê şe ke bavê xem û tabê

Qıştên di xwe çîn çîn bide ber misk û zubadê
Tayên di ʿişabê bireşînin bi gulabê

Her yek bi hezar reng-i li bejna te sema tîn
Xemrî û lef û şitrî û tayên di ʿişabê

Min can yedê beyda ye ji ʿÎsa çi xeber dim
Min ateşê Mûsa diye gulnar-i şerabê

Minnet ko ji bextê xwe we ʿtaliʿ bi neşîb im
Husna te ye îro ji me ra çûye nişabê

ʿÎşqa me ji ber mewc û ʿecacê bûye derya
Wê zîr û zeber kit me bi dest hind û xurabê

Ne çerxê sipîhrê ji hewayaya te we mîhrê
Sergeşte ne ew tîk vi me ra şubhê hebabê

Wek ba dilezînî tu kimêdî dibezînî
Umrê me ezîzî bi xwidê bes ke şitabê

Ya pê bi ziyaret bi me de ya serê enguşt
Destê xwe me avêtiye bêçare rikabê

Min rê ji serabê bi şerabê bir û munkir
Hetta bi ebed teşne ceger ma di serabê

Serpoş û qibaba me ye tesbîh û muşella
Wer da bidirînîn li xwe vê perde û niqabê

Li l-lah were saqî bi du caman me ciwan ke
Muṭrib bi defê ra bide sêgah û şebabê

Wer guh bide nayê ko şirînqed di semayê
Pir hel kirine mes'ele vê feşlê xiṭabê

Cama ne şekerleb bi me dit eynê heram e
Fetwa we numa haşiyeya Şerha-lubabê

Muftî me ney û nay e we ney qewlê qedîm e
Bawer te nehin guh bide ber çeng û rebabê

Nerda me çi bazê binumîtin me ji sazê
Bendên di su'alê we kuşadên di cewabê

Ez çûme serayê ko şirînqed di semayê
Go ev ne Melayê me ye bêperde bila bê

Bab Y (yê) 96. Ey şehinşahê mu'ezzem heq nighdarê te bî

Ey şehinşahê mu'ezzem heq nighdarê te bî
Sûreyê »inna feteħna« dor û madarê te bî

Her kinarê pê ve wergêrî 'inanê himmetê
Zuhre bê peykê te û Kêwan rikêbdarê te bî

Dayima menzilgeha sûra te bit birca Şeref
Tali'ê fexunde û bextê se'îd yarê te bî

Seb'eyê seyyare û neh çerxê sergerdan bi vê
Gerdiş û dewrê 'eceb der xizmet û karê te bî

Mahitaba dewletê yek pertewek şem'a te bit
Afitaba ref'etê berqek ji enwarê te bî

Lami'-i fetħa ezel berqê ji ber tacê te dit
Kewkeba se'da ebed necmek ji seyyarê te bî

Berqê subbûhî ko işraqê li şed canan didit
Ew ko keşfa dil dikit remzek ji esrarê te bî

Rayeta fetħê ji neşra te ko her menşûr-i bû
Şehsiwarê ferrê subħanî 'elemdarê te bî

Ney tinê Tebrîz û Kurdistan li ber ħukmê te bin
Şed wekî şahê Xurasanê di ferwarê te bî

Gerçi der iqlîmê rabi^c hate textê seltenet
Padişahê heft-i iqlîman selamkarê te bî

Çîmena sulţaniyê yek laleyek baxê te bit
Gulşena xaqaniyê xarek ji gulzarê te bî

Ê ji emrê tey mukerrem serkeşî kit şubhê şem^c
Ber serê tîxê te û meqtûlê mûkarê te bî

Şahibaz er çend-i perwazê bi bala bêt û ret
Dê di nêv tora te bêt û şeydê şunqarê te bî

Şahê pirheybet didêrit lê bi sehmê zêde yî
Sa^ceta xeflet xwiya bî kûz di bin barê te bî

Her serê dewlet hebit dê her di nêv benda te bit
Her kesê ^caqil bitin dê her di çokarê te bî

Ê divêt azade bit dê çehvinêrê luţfa te bit
Herçi istixna di dil ber minnet û parê te bî

Her kesê qestek di dil dê qest-i dergahê te kit
Ê di xatir ercû kit dê her ricakarê te bî




Ê ne dewletxwahê heçret bit ji nêva can û dil
Şubhetê ehlê şeqa ber qehr û azarê te bî

Ma bi ^cêş û noş û şahî ew qeder ^cumrê te bit
Çendekê salik mucedded bêt û bêzarê te bî

Her kesê ne j^ccan du^cago û şenaxwanê te bit
Girtiyê qeyda te û amancê nûbarê te bî

Medrekê ilmê demîrê şemmayek weşfa te hat
Wer ne key ʿalem bi şe'nê qedr û miqdarê te bî

Qest û daxwaza Melê da'im ji can û dil ev e
Her di benda xizmetê pêşdestê dîdarê te bî



Bab Y (yê) 97. Xanê xanan lami^ê necma te her pirnûr-i bî

Xanê xanan lami^ê necma te her pirnûr-i bî
Keştiya bextê te ez bayê muxalif dûr-i bî

Kewkeba se^ê da Şeref tali^ê di nêv birca te bit
Da tinê j' çerxê bela şubhê mehê menzûr-i bî

Encûmê çerxê muheddeb her ji zatê tey şerîf
Kesbê enwarê bikin hetta ko nefxa şûr-i bî

Lew ziyaret asitanî tete şemsa dewletê
Da sehergahan ji dîdarê şerîf pirnûr-i bî

Extera te j' perdeya xeybê eger bêtin zuhûr
Dê bitin nişfi n-nehar e wer şebê deycor-i bî

»Ayetu l-kursî« û »En^ê am« heykela tûxê te bin
Bênihayet pir murad û bê^ê eded menşûr-i bî

Her kinarê wergerînî pê ve^ê ezm û himmetê
Rayeta fethe bi neşra »lem yezel« menşûr-i bî

Xeymeta nûrê inayet zillê memdûdê te bit
Sûreyê »Ummu l-kitab« madarê heqret sûr-i bî

Paş-i Newşîrwan dibêm dê hakimê adil tû yî
Mişlê Hatim dê bi danê der cihan meşhûr-i bî

Ma Cizîrê şubhê Darê textê heft iqlîm-i bit
Hem bi hukm û seltenet Eskender û Feḫfûr-i bî

Mişlê Cem cama zerîn xalî nebî te j^o badeyê
Da ji xemra şadimanî da^o imen mexmûr-i bî

Ma di baḫê^e eş û noşê her bi saz û erḫewan
Kamiran û kamibexş û dilxweş û mesrûr-i bî

Çendekê şîrînpuser derbendê dîwana te bin
Bendê şapûrê te bin ta Xusro û Şapûr-i bî

Hindekê roj û şev in têk^e id û leyli l-qedr-i bin
Cam medam pir bade bit lê ne j^o meya engûr-i bî

Şubhetê Rûhî l-qudus^e erdê tu pê lê daynî
Sebze û reyhan û nesrîn û gulê menqûr-i bî

Her derê ne^e lê feres şubhet Buraqê vê kevit
Çeşmeê heywan ji ew^e erdê mubarek fûr-i bî

Ma te^e umrê Xuḫr û Nûḫ û mulkê Zû l-qerneyn bitin
Gunbeda çerxê mulemmec^e her bi te me^e mûr-i bî

Xaşş-i teşrîfê te bin derya û derbendê^e ecem
Da xelatên her seher şed zerkeş û mexmûr-i bî




Gerçi der dîwanê heḫret pir heqîr in şubhê mûr
Çeşmê te çeşmê Suleyman-i bi ḫalê mûr-i bî

Ê ne wek goy bê ser û pa bêt di benda xidmetê
Ma di çewgana te her perkende û meqhûr-i bî

Ma lisanê min du^c agoyê li der heq weşfê xan
Mezherê sirra kelimê wek di rexta Tor-i bî

Her di medhê te û şenayê sine û qelbê Melê
Bê tefawut qulzema pir lû³ lûwê menşûr-i bî

Ji asitanê dewletê xayib nebî carek Mela
Da ji fermanê mukerrem dem bi dem me³ mûr-i bî



Texmîs-i Laḡer ber ḡezelê »Şêx Eḡmed«

Bab Y (yê) 98. Remzek ji nesîmê li çemin da û xwişî

Remzek ji nesîmê li çemin da û xwişî
Rabû ji xewê sebze û şebnem diweşî
Çendî xebitî dil ko bikit seyr û neşî
Nêrgiza mest û xeraman di seḡergeh ko meşî
Bişkift-i şifet ḡunçe ji çara Ereşî

Horên di bihiştê we perî cumle cema tên
Zuhre reqqîşî çeng û çexane bi ḡina tên
ḡulḡul dikevîtin çimenan têk bi newa tên
Şemşad-i bi meş sosin û sinbil bi sema tên
Ey serwê xeraman ko tu carek bimeşî

Çîn girtiye sirban ji seraser bi kef û kef
Xwînê we dirêjin ko li şîran cemidî kef
Dinya bûye leylan ji liḡavan diwerit kef
Rom û ecemê girtiye oxilme bi şef şef
Cohtê muḡulan hatine cengê ḡebeşî

Weşfê di cemala te bû ewwel ko sebeq da
Teḡsîn-i ji ustadê kalamê we bi ḡeq da
Bawer ne meha bedr-i bi enguştê du şeq da
Wek zerre herê sîne ji mihra te şefeq da
Bû şuhreê afaqê bi xwirşîd-i weş î

Xal û nuqte û enber û miskê te fişandî
Yek nuqte ne dî kes qelemê sehwe kişandî
Kafûre kirî şefḡe sewadê neqîşandî

Kê destê ji qudret we kişandî we reşandî
Qewsê du hilalan li beyaqê bi reşî

Hindî ko hebî xob û zerîf her di xemê ne
Der xwîne cegerpareyê derd û elemê ne
Wek şehde hebin da^î çi hacet qesemê ne
Çendî te but û latê nişarê qedemê ne
I^ccazê meke vê tu ji neslê qereşî

Gazindê ji derd û eleman qeç meke êdî
Ev talî^c û bextê we mubarek te li kê dî
Meşûlê muradê me ji tîra bi çepê dî
Ey dil ji kevanê helek exterme şehîd î
Minnet ko tu extermeyê qewsê biweşî

Her gezme û awir ko ji çehvên te bi kil hat
Min sîne hedef da ber û yek yek ne bi tîl hat
Ahek me nehişt şebr û sukûn bêtehemul hat
Derba cegerê bû ko me ev nale ji dil hat
Ma ah û fişanan dikirit kes ji xweşî

Bê keştî li ber behra firaqê erixîm ez
Xewfek me hebû lew bi wişalê perixîm ez
Bihnek ji wişalê me bihîst û kerixîm ez
Wek tole li pê mûçih li dorê çerixîm ez
Çix kir me hebîbî ko tu narî biqesî

»Laxer« di zemanê xwe û şî^c rê tu^c ela î
Çendî te hebin daş û birîn têk-i bela î
Rengîn-i ji derd û eleman şubhê Wela^î
El-lah çi tebî^c etbeşer î xwe ne Mela î
Vê cewr û cefayê tu peyapey dikeşî

Bab Y (yê) 99. Hêvî û tewqe dikim ez ji xwidana heşemê

Hêvî û tewqe dikim ez ji xwidana heşemê
Wê nigar û şenem û padişeh û muhteşemê

Carinan bendeyê dilşohtiyê mehcûr ve vinêr
Bi lebê le lê şekerbar û ji ceynê keremê

Pirsiyarê li me carek bike şîrîndehena min
Ko perêhtîne firaqa te li ser derd û xemê

Er ne hudhud ji Seba bêt û wekî bayê şeba
Dê ji hir kû bigehit dest-i vi peygê heremê

Pirsiyar-i li me bit wer ne xwe mehcûrê xerîb
Dê li kê erde bikim vê xem û derd û elemê

Haşa li l-lah ko bikim eşkere van xuşşe û derdan
Wer bişojim ji xemê işqê tu ser ta qedemê

Me bi şehrayê wişala xwe derîn tu ji xwidê ra
Wer ne weqt e ko bibîn xerqeê behra edemê

Ji gulistana cemala te gulek bête zuhûrê
Ji dinê dê biçitin navê bihişta Iremê

Şerha halê xema işqa te ji kû tete nivîsîn
Medhê ewşafê cemala te kuca tê reqemê

Wê mecalê ko cemala xwe tecella dikirî
Lazim e secde bibîn ber te di wê gav û demê

Secde bin ber te rewa ye di hemî mezheb û dînan
Kî dibit muşrik û kafir ji wê şêrîfemê

Ger bibim ber te sucûdê di dema keşf û şuhûdê
Mi li dil dê bidirit pertewê nûra qidemê

»Qibletî wechuke fî kullî şebaħin we-mesa^o«
Bi du ebrûyê te cana dixwirim ez qesemê

Mûyekê ez ji te nadim bi duşed Zîn û Şirînan
Çi dibit ger tu hesêb kî mi bi Ferhad û Memê

Te Firing û Erebiştan û Mecer têt-i standin
Celewê xweş veşerîn, hatiye newba Ecemê

Ma ji dîwanê seadet seh kirî şubhê Melayî
Tu bi navê mi gedayî bikişîne qelemê

Bab Y (yê) 100. Xema 'îşqê perêhtim ez

Xema 'îşqê perêhtim ez
Hebîba xemrevîn kanî
Seraser têk behêtim ez
Ji derdê ferq û hicranê

Firaqa dilbera rend e
Behêtim herwekî find e
Misilmanek dirê min de
Xeber bit balê sulţanê

Xeber bit bal şekerxayê
Şepal û xob û zîbayê
Ko mîr e belk-i bîr nayê
Esîrik wê di zindanê

Esîr im lerze û tavê
Mi taqet vê ne perwa vê
Di hebsa wê qe min navê
Bikim firyad û efşanê

Mi navêt ez bi firyad kim
Li zulma dilberê dad kim
Şehê dê şubhê Ferhad kim
Bidim rûhê ji kovanê

Ji kovana te şîrînê
Dinalim şubhê goyînê
Dirêjim hêstirên xwînê
Wekî tavê di baranê

Wekî berqa biharî ez
Ji dest çeşmên xumarî ez
Dikim firyad û zarî ez
Meger carek kî îhsanê

Tu pir îhsan û xweyrehm î
Li derwêşan abê xeşm î
Çi bîtin ger bi nêv çeşm î
Nezer kî tu li astanê

Li min pirsek bi dildarî
Dibit hempayê dîdarî
Vewesta yim di ferwarî
Li  ebdê xwe ke fermanê

Di fermanê vewesta yim
Di benda xidmetê da yim
Wekî goy bê ser û pa yim
Heman lê dî tu çewganê

Li ber çewgan û kaşoyan
Ji derba tirk û hindûyan
Dibazim herwekî goyan
Dema ew têne meydanê

Dema ew tên bi bazî tên
Digel qewsên şîrazî tên
Çi mûkarin di tazî tên
Bi de wa têne lêkdanê

Bi de wa tên me yexma kin
Di  amê şûr û xewxa kin

Suwaş û fitneyan rakin
Bi şîr ew tene talanê

Du talançî di meşhûr tê
Ji me^cden^c eynê kafûr tê
Di têkil zulmet û nûr tê
Me kufri^{dî} di îmanê

Me kufri^{dî} di islam bê
Ji şerqê zulmet û şam bê
Ji zulfan^c enberê xam bê
Kinarê xal û nîşanê

Du zulfê^c enberêşan in
Du le^{lê} şekkerestan in
Du çeşmê sihrifettan in
Dilê min wan xedeng danê

Dilê min wan xedeng lê da
Di birca roz û şeb tê da
Li selwa mar livîn pê da
Bi mestî hate seyranê

Li selwê mar bi lef hatin
Di bircan tîp bi şef hatin
Ji başin tîr bi xef hatin
Ji berbenda girîbanê

Ji berbenda niqaba wê
Li ber fetla^c işaba wê
Cemala mahitaba wê
Mi bedrek dî di seywanê

Heyîv bû ew di zulmatê
Dixwim şondê bi ayatê
Ko nûrê da semawatê
Esed hat rast-i mîzanê

Qemer hat rast-i perwînan
Ji bo xemlê şemal înan
Me nêrgiz dîn di nesrînan
Di nêv baxê gulistanê

Di baxê min medam dil tê
Cinesrî w sosin û gul tê
Binefş û terh û sinbil tê
Çevîn ser şubhê reyhanê

Li dêmê sinbilan ser dan
Çevîn ser sosin û werdan
Li mahê °eqreban ger dan
Di ser da ab-i heywanê

Ji °îşqê lew Mela xest e
Ji herfa badeyê mest e
Ji hoş û °aqilî rest e
Li der goşên di meyxanê

Bab Y (yê) 101. Bi husna ehseni t-teqwîm û zahir şoretê zat î

Bi husna ehseni t-teqwîm û zahir şoretê zat î
Nezer dî »elleme l-esma» we baṭin ʿeyn-i mirʿat î

Di pabûsa semen sayê mi nêrî bejn û balayê
»Le ʿellî ebluxu l-esbabe esbabe s-semewatî«

Ji vê teqwîm-i insanî nezer da sirrê subḥanî
»Fe-haze l-wechu min ecla berahînin we-ayatî«

Ko nûra ʿiştê lami ʿ det li Torê qelbê cami ʿ det
Di seyra berzexi l-esma ʿ nihayatu bidayatî

Nişanên turre tuxrayan di weşfê zuhre sîmayan
»Li- ʿinwani t-tecellî min bera ʿati l- ʿibaratî«

Dilo wer seyrê balayan di gulzara semensayan
»Bi-ha tehtezzu banatun lena min meysi qamatî«

Semaya cumle dêmdur tê bi i ʿcaz ehlê sur pir tê
»Bi-ha teşteffu qamatun bi- ʿîdanin we-nayatî«

Semayê rast û çep tînin şemalên xaşşe hiltînin
»Fe-ya li l-lahi fî meylatiha min ʿeṭfi banatî«

Bibêjin xemze elmasê bi zimzim bîne şehkasê
Ko hel kit me ʿnayên asê »fe-ya heyya lena hatî«

Dibînî neḫmeya çengê dema avêhte ahengê
Bi qanûn wê dixwînit me »li-mî^cadin we-mîqatî«

Ji remzên xemze çalakê bi dil dê bêne idrakê
»Me^canin lem yese^che l-lefzu min dîqi l-^cibaratî«

Ji nazik dilbera nazik di sehmê dî me i^ccazîk
»We-kem min xeşfi xizlanin ehabet leyşe xabatî«

Ne tenha pêşiber yar î n ji emrê »kun« xeberdar î n
»We-men ehwahu sarin fî mesarî kullî zerratî«

»Huwe l-ewwel huwe l-axir huwe z-zahir huwe l-baḫin
Huwe l-me^cbûdu we-l-meşhûdu fî kullî l-huwiyyatî«

Ji laşey^î ji me^cdûmî me nasî sîrrê qeyyûmî
»Sucûdî fî turabî l-meḫwi min e^cle l-meqamatî«

Bi heq rîndê xerabat im ji dêrê vê demê hatim
Çi hevî hon dîkin îro ji vî rîndê xerabatî

Di îşqê şeyxê şanî me, bi dil beḫrê me^canî me
»Li-zî ḫicrin we-zî qelbin şifa^{un} fî îşaratî«




Di iqlîmê suxen mîr im di şî^crê de cehangîr im
»We-ye^clu mewkibe l-^cuşşaqî e^clamî we-rayatî«

Çi xweş nûrek zelal î tu di qelbê min şemal î tu
»We-qelbî ḫeyşu fîhi l-ḫubu mişbahun bi-mişkatî«

Teqada weh dîkir ḫikmet ko çerx û lewleb û bab in
»Huwe l-fe^{cc}alu la teḫter bi-esbabin we-alatî«

Ezel ʿeynê ebed yek an di deyyûmî yû qeyyûmî
Tenezzul tête tefşîlê »bi-anatin we-ewqatî«

Te ʿale l-lah ji îşsanî bi dildarî bi dil danî
Mela îro te kir paşa li ser çehvên Melê hatî



Bab Y (yê) 102. Ey nesîmê seherê ma di mecala şibehê

Ey nesîmê seherê ma di mecala şibehê
Şed selaman bigehînî ji me wê padişehê

Erera qamet elif neyşekera şox û şepal
Nazika sîm-i ten û xwîr û zerrînkulehê

Di berê da tu bibûsî bi duşed zarî û luţf
Asitan û der û dîwar û şibakên qelehê

Nameya cewr û cefa û elem û derd û xeman
Dê bi destê zeriye muhteşemê serwishê

Belko dilber ji rûyê adilî û merhemetê
Rehmkê kit bi feqîran û bipirsit gilehê

Heq dizanit di şevan şubhetê avên di royan
Me bi dil zarî û kalîn e heta şubhegehê

Ma ji ber derb û firaqa te sukûnek me heye
Cerg û dil herdu bi nalîn e wekî çeng û jihê

Perdeya xelî û çarê tu ji ser dêmê hilîn
Da ji şewqa te bi xef bit şefeqa mihr û mehê

Dîn eger bête beha can didirim lê emma
Me hezar canê ezîzî dihilîtin di behê

Qeṭ dibit wek te şepalê ne di şam û ne di şerq
Kê nişan da di cehan mişlê te xwindkar û şehê

°Alemek şehdeyiya ḥusn û cemala te didit
Tu zuleyxayê zeman î we çî ḥacet medehê

Ḥeq nighdarê te bit padişeha serwiqedan
Bi kinarê me feqîran bike carek nighê

Xobî û dilberî û naz û teletṭuf bi te şên
Xusrûya padişehan î we xwidana cebehê

Ḥecer-eswed bidirit destê ziyaret bikirim
Nezrê min bit bigirim xwas-i ṭerîqa Mekehê

Ji ezel ḥeq bi Melê daye ji °iştê qedeḥek
Ta ebed mest û xerab î ji meya wê qedeḥê

Bab Y (yê) 103. Ey nesîmê şibehê ma di mecala seherê

Ey nesîmê şibehê ma di mecala seherê
Şed selaman bigehînî ji me wê lebşekerê

Nêrgiza nazik û ter neyşekera mest û xumar
Dêmdur û le'lileb û muhteşem û mu'teberê

Bisk û gîsû ji herîr in qeseb in turre û zulf
Ne ji kafûr e beden xal-i ji miskê teterê

Dêmibedr û aniyê zulfê li ser bûne helek
Erqeman helqe û ger dane li dewra qemerê

Asitanî û şibak û kulek û pencereyan
Da bi miskînî û zarî tu bibûsî di berê

Tozekê bîn bi xwe ra ta bikirîn kuhlê beşer
Li çerîqa qedema dilber-i wê rehguzerê

Da bibînî şenema min tu bikîn xwe bide xet
Bike telxîş-i cewabê me ji vê muxteşerê

Lew ko pir şefqe didêrit kerem û lutf û kemal
Ah ji dest remz û surên wê dur û gewherxeberê

Ma bi zehrê şekerî dost-i bixwînit carekê
Erđihala ko nivîsî me bi xwîna cegerê

Qederek şefqe ji lufta te temenna dikirîn
Da me mehrûm-i nedêrî tu ji luft û nezerê

Bi xwidê qeṭ te di dil da ji xwidê tirs-i nehin
Dikirî zulm û cefayê tu li min vê qederê

Ez bi wê qamet û bejnê li te şondê dixwirim
Bes ke ey padişeha min li esîran xederê

Ji ber ahên me dinê agir û dûd bit ne eceb
Me di dil da heye narek ko dişojit seqerê

Ne bûyîne ne dibin wek te şepalê di cehan
Kê dîn mişlê te sîmînten û zerrînkemerê

Paş-i wan gezmeyê çehvên te Mela pê kuştîyî
Ma xedeng in dikirin qeṭ li me êdî eşerê

Bab Y (yê) 104. Îro ji nû pir ateş im

Îro ji nû pir ateş im
Dîsa ji remza dilberê
Mecrûhê qewsê pirweş im
Tîr dane nêva ceğerê

Tîr dan ji qewsê eswed e
Şehzadeya şîrînqed e
Kuştî ne wek min çendşed e
Wê padişah û beglerê

Wê beglerê pir kuştine
Enguşt bi xwînê riştine
Ma ehlê dil qeş hiştine
Şohtîne mişlê mecmerê

Lê ez tinê ser ta qedem
Yekser dişojim dem bi dem
Weşfên di îşqê ez çî dem
Nayên hesab û defterê

Weşfên evîn û îşqehê
Husn û cemala wê şehê
Nayêne şerh û medehê
Ehsen ji neqşê beşerê

Ehsen ji husna dêmdurê
Şîrînî û guft û surê
Şed zahid êxistin ji rê
Wê nazik û lebşekerê

Şekker di nêv lêvan e wê
Reyhan li dor sêvan e wê
Meş^cel di nêv şêvan e wê
Tîsê ji rengê fenerê

Fener niye nûra heq e
Husn û cemala muşleq e
Berq e spêd e û şefeq e
Zuhre we şemsa xawerê

Zuhre we Mah û Muşterî
Min dîn li dêmê enwerî
Zulfa muselsel ^cenberî
Ser daye hewda kewşerê

Hewda ji kewşer çeşme tê
Ya cih di rewda qudretê
Herdem ji nû wê ser de tê
Xemrî we tayên ^cer^cerê

Xemrî di reş zulfa herîr
Werbûn li dor bedra munîr
Birca ko hakim lê du mîr
Min dîn li textê kişwerê

Textê di mîr û begleran
Meydanê coqa goygeran
Eşlan û cotê meyxwiran
Mey dan şeraba saxerê

Saxer bi dest serxweş we mest
Weqtê sehergeh dest bi dest

Ûeflet du begler meyperest
Kuřtim bi derba xencerê

Kuřtim bi derba keyberan
Gezme w xedenga awiran
Remz û îřarat û suran
Dan dil ji nêva pencerê

Dan dil ji ber ĥusna bi nûr
Berqa tecellaya řudûr
Lew řohtîyem wek kohê Tûr
Ĥubb û evîna enwerê

Ĥubba te ma xweř ĥiřtime
Her roj ji nû ez kuřtime
Yekser ji xwînê riřtime
Tîr û xedengên Mecerê

Gezmên di řîrîn nazikê
Derbên di wê rimbazikê
Çûyîne nêv dil gazikê
Min dad ji zulma dilberê

Dilber çi bêĥed zalim e
Carek nekir pirsî li me
Lazim bi ĥalê alim e
Lê pir didêrit xederê

Lazim bi qetla min divê
Ĥêj ev di dil marê řevê
Peykan di cergê da çevê
Bend kir bi řewka enberê

Bend kir kulab û penceyan
Dil ma di nêv îşkenceyan
Min ah ji dest wan xenceyan
Kok û kubarên dînberê

Remz û surên şîrînleban
Tîroj-i berqên kewkeban
Rêza muselsel °eqreban
Gerdan li dora qemerê

Min dîn li dor bedra tamam
Herfên di mektûb dal û lam
Wê pêşrewê baîtin revam
Yexma kirim sîmînberê

Sîmînbera neyşekerê
Ew horiya nisbet perê
Bejna şîrîn dêmê zerê
Bo ji gulab û mawerê

Bo mawer û şîrînlebê
Wê xob û nûrên xebxebê
Bedra di Birca °eqrebê
Kengê ji ber perdê derê

Bedra ji qudret lê du nûn
Ew qatila eswed°uyûn
Pir rakirin wê qetl û xûn
°Alem perêht yexmakerê

Herdem bi zulmê we d'şojî
Qelbê ji hubba tey tejî

Lazim dibêem min dê kujî
Kes nîne çîtin mehderê

Kes nîne ret mehder bikit
Bes girtiyan ebter bikit
Xemlê ji zêrê zer bikit
Şefqet li yekta biderê

Şefqê bi dîdarê xwe kit
Qesta birîndarê xwe kit
Şehîdê reşmarê xwe kit
Ê ser li fitla pêşterê

Fitlê siyah marê şevîn
Rêhan bi dor serwan çevîn
Axir bi selwê da revîn
Xef bûn di tayên çenberê

Xef bûn di nêv tora qizil
Îlan mişalê ser li mil
Kuştîn û jehr avête dil
Hêj kuştîyên remza berê

Kuştîne em şîrînlebê
Tehlîkeşên roz û şebê
Ger ez bibînim ew bi xwe bê
Nakim ji dil hêj bawerê

Ew nazika nisbet gulê
Camek ji kewşer da Melê
Mest im ji ber qalu belê
Hetta bi roja meşerê

Bab Y (yê) 105. Latê husn î û şehê xuban î

Latê husn î û şehê xuban î
Bi xwe hem xan î we hem xaqan î

Yûsifê şanî tu îro xanim
Ko bi husna xwe nedêrî şanî

Bi sur û heybet û sehmê xwe perî
Bi te şîn li butan sulţan î

Bi tebilxaneyê şah î were text
Ko tu îro şehê Kurdistan î

Kagulê berde bi ser xal û xetan
Ko muselsel binumêt rîhan î

Ismê e^czem te divê çil ism î
Ji du herfan bi mu^cemma zanî

Çi berat bû we bi ser da kagul-i
Çîn bi çîn mest bi tuxra ranî

Te çi hacet bi suleymaniyê husnê
Xatemek le^cle bi gewher anî

Çi xet eşkeste muselsel ya reb
Ko te pê nesix kirî dîwanî

Gerçî pîrxal û nişan î emma
Bi Nişanî ko tu bênîşan î

Ey perî ھorisiriştê herçend
Bi beşer adem î û insan î

Surrê subhan te ji ھusnê dinumît
Ehsene l-lah ji sura subhanî

Çi ھeddê °eql e qiyasê te kirit
Ev e burhan ko tu bêburhan î

Me temenna ji nesîm xakê rehê kir
Pê bikîn dîde û dil nûranî

Nefesek bê te me nayê bi l-lah
Ne tinê rûh î tu rûh û can î

Şed hezaran ji te peykan di dil in
Lê li serwê me tinê derman î

Te birînên me kewand dîsa
Ji nû agir te li daşan danî

Te Mela pîr di ceger gezme ne lew
We perîşan î we pîrêşan î

Bab Y (yê) 106.Vê firqetê ebter kirîn

Vê firqetê ebter kirîn
Feryad ji destê firqetê
Jar û de'îf û zer kirîn
Feryad ji destê firqetê

Pir zer kirîn wek zêr-i mam
Çehvên di luftê pîr-i mam
Daim li rê çavnêr-i mam
Feryad ji destê firqetê

Çavnêrê reftara te bûm
Muştaqê gulzara te bûm
Lew dûr ji dîdara te bûm
Feryad ji destê firqetê

Dûr bûm ji wê reft û çunê
Wan îşweyan guft û kenê
Nayê bi çehvan min dinê
Feryad ji destê firqetê

Dinya bi min mij bû û xemam
Xew jî li çehvanê min heram
Umrek bi vî halê he mam
Feryad ji destê firqetê

Sa'et li min têk sal-i bûn
Daim li ser dest fal-i bûn

Herfên dihatin dal-i bûn
Feryad ji destê firqetê

Îro tinê derhat elîf
Me^c ne diçû bejna şerîf
Ya xare lê kemxe û qedîf
Feryad ji destê firqetê

Vê firqetê pir dil şewand
Cerhên qedîm dîsa kewand
Şîşên di şor tê da tewand
Feryad ji destê firqetê

Daxên me dîsa reş kirin
Yek yek ji nû ateş kirin
Lê zêde penc û şeş kirin
Feryad ji destê firqetê

Sewda û sews û gêj kirim
Pir her di dil xwînrejê kirim
Çendan we bûm lê hêj kirim
Feryad ji destê firqetê

Bi l-lah ji nale w zariyan
Gezmên di wan xummariyan
Xew nakirîn şevtariyan
Feryad ji destê firqetê

Şev bû dinê çeşmê me da
Hetta beşîr mizgînî da
Dê bê seher şahê geda
Feryad ji destê firqetê

Mizgîn ko da min ev qeder
Rûhê şîrîn min hate ser
Xeylek li min ron bûn beşer
Feryad ji destê firqetê

Ron bû bi dîdara te dil
Bû xerqê enwarê te dil
Naret ji ferwarê te dil
Feryad ji destê firqetê

Minnet me dildarê xwe dî
Dîsa ji nû yarê xwe dî
Sulţan û xundkarê xwe dî
Feryad ji destê firqetê

Reşkagulê sinbil çevîn
Minnet me dîsa xem revîn
Nû bûn li dil hubb û evîn
Feryad ji destê firqetê

Derdê xedar bêm firqet e
Firqet ji can pir zehmet e
Ya sehl ko aşiq riş dite
Feryad ji destê firqetê

Narê firaq û şohtinê
Êşa xedengê nuhtinê
Pirs kin ji uşşaqan tinê
Feryad ji destê firqetê

°Aşiq ew in her dimirin
Çend yek di remzên dilber in

Keybir li dil min bihtir in
Feryad ji destê firqetê

Ya reb bi dîdara xwe kî
Min waşilê yarê xwe kî
Bes şohtiyê narê xwe kî
Feryad ji destê firqetê

Me j' dostê satek dûr nekî
Perkende û mehcûr nekî
Dîsa ji nû dil hûr nekî
Feryad ji destê firqetê

Xaka riya dilber Mela
Bikşîn di çehvan wek cila
Dîdarê qismet bû hela
Feryad ji destê firqetê

Bab Y (yê) 107. Der heq me bi şîrê xwe meke teqşîrê

Der heq me bi şîrê xwe meke teqşîrê
Ya bit di şuxla me bikî te'xîrê

Ṭuxrayê Humayûn ko dikin turreyê emr
Zulfa te ye anîn ji xeṭa tehrîrê

Husna te nizanim bi çi teşbîhê bikim
»Fî eḥseni teqwîm« lew hatiye tefsîrê

Surra te li dêm ayetê kubra ye neşêm
Lê d' neql û riwayet dikirim teḫsîrê

Ger qelbê heqîqet niye yek carê çira
'Işqa te kirîn zîr û zeber iksîrê

Ma qudreta def'ê heye wer şîrê 'Elî bit
Lami' ko bidit şa'iqeya teqdîrê

Bê qudretê tu, quwwetê mexlûqê çi kit
Memnû' e li nik 'eql ko bikit te'şîrê

Ney beşê ṭilismê me bi şed xane bîret
Qadir heye 'arif bikirit teqrîrê

Ber dilber û leb ber leb û endamê li yek
Xewna me bi yarê bidinê te'bîrê

Zatî ji wucûda me sebeb wê tu dizanî
Naête hesabê felekê tedwîrê

Ateşperesê wadiyê ʿışq in û ʿcecb
Dînarperes û wê dibirin tekfîrê

Mihraba du birhên te bibînit ʿarif
Niyyet çi bi cih têt dema tekbîrê

Zanim te çi mizraq-i vi dil keftiye lê
Carek tu goyê di derbên tîrê

Teqdîrê ko hukmê li Melê carî kit
Qeç kes heye mumkin bidetê teşyîrê

Bab Y (yê) 108. Mizgîn ji me ra bêt ji surşêrînê

Mizgîn ji me ra bêt ji surşêrînê
Canê xwe yê şêrîn didirim mizgînê

Şed Çîn di xwe da girtiye zulfa te bi çîn
Şi^c ra me û heq lew çû heta Maçînê

Neqşên felekan guh didirin vê nezmê
Tenha ne beşer her dikirin tehsînê

Îşqê ji xwidê da tu bixwazî jê ra
Ger dê li neyarek xwe bikî nefrînê

Yek secde tinê ferq e di dînê îşqê
Bin berqedê yarê di mecalê dînê

°Aşiq ko bi dil fatihêya îşqê xwand
Ayatê yeka yek dikirin amînê

Me ji le^lê lebê yarê xwe vexwar ava heyat
Eşyar-i bila têk-i biçin darînê

Lazim bi xwe ayîneyê Rûhi l-qudus î tu
Lew kes nedîn horî bi vê ayîneyê

Caiz bi te min »heşu l-beşer« nisbet dan
Bihn û şefeq û nazikiya nistrînê

Ev rengê feşahet ji beşer sihrê helal
I'cazê beyan aniye ber tedwînê

Da nale û ahên me ji dil şeh bikirî
Wer guh bide hindavê serê balînê

Ferhad-i dizanit tu ji Perwîz-i mepirs
Ertwarê xema 'îşq û sura Şêrînê

Bê nuqte nehin daîre îhsan ke Mela
Dewwarê çi kit daîreya tekwînê

Bab Y (yê) 109. Ji mabeyna du ebrûyan dibînîm qabê qewseynî

Ji mabeyna du ebrûyan dibînîm qabê qewseynî
Te^cale l-lah binê remzê çî reng avête mabeynî

Binê nûnên li ser şadan ko katib guşe lê badan
Seraser qaf-i ta qafe rumûza hikmeti l-^ceynî

Beqa nînin li bo tiştî heta kengê bikîn piştî
Di ^cişqa wan perîrûyan werin dinyayê da deynî

Bi berqa şîr û elmasan bi tîrêjên di şhkasan
Seraser ehlê dinyayê dişojî terfeti l-^ceynî

Mela bi l-lah di vî dewrî bi vî rengî bi vî tewrî
Nişan da wek Nişanî kes deranîn dûr ji beħreynî

Bab Y (yê) **110.Şebaḥu l-xeyri xanê min**

Şebaḥu l-xeyri xanê min
Şehê şêrîn-zebanê min
Tu yî rûḥ û rewanê min
Bibit qurban te canê min
Te'ale l-lah çî zât î tu
Çi wê şêrînşifat î tu
Ne wek qend û nebat î tu
Yeqîn rûḥ û heyat î tu
Heyat û raḥeta can im
»Şebaḥu l-xeyri ya xanim«
Were bînahiya çehvan
Bibînim bejn û balayê

Şebaḥu l-xeyri mesta min
Leṭîfa cam bi desta min
Xumar û meyperesta min
Tu yî meqşûd û qesta min
Ji meqşûdan tu yî bes min
Bibin ber çerxê eṭleş min
Ji xeyrê te nevêt kes min
Bi reştûzên muqewwes min
Di benda zulfê çewgan im
»Şebaḥu l-xeyri ya xanim«
Were bînahiya çehvan
Bibînim bejn û balayê

Ji wê zulfê ji wê bendê
Reha bim lê ji peywendê
Siyehçêsmê spîzendê
Te şohim şubhetê findê
Şubhê şem^c û şemal im ez
Ji ber hubba te lal im ez
De^cif im wek hilal im ez
Şifet goyîn dikalim ez
Vi bilbil ra bi evxan im
»Şebaħu l-xeyri ya xanim«
Were bînahiya çehvan
Bibînim bejn û balayê

Vi bilbil ra şev û rojê
Li ser wê terħ û bişkojê
Enîmahê şefeq rojê
Te şohim şubhetê dojê
Ko dîr im ez ji wê ħorê
Tinê carek li ser sûrê
Ji Wadî-eymena Torê
Tecella kir di nêv nûrê
Ji wê şohî dil û canim
»Şebaħu l-xeyri ya xanim«
Were bînahiya çehvan
Bibînim bejn û balayê

Ji ħusna wê tecellayê
Yedê beyda û balayê
Çi weşfan bêm xeber nayê
Welê dil cezbeşdayê
Ne hişyar im ji wê berqê
Ji zertacê li ser ferqê

Spêde da heta şerqê
Belê naêximê ferqê
Ji derbê ʿışqê nalan im
»Şebaḥu l-xeyri ya xanim«
Were bînahiya çehvan
Bibînim bejn û balayê

Zerîf î nazik î şeng î
Şifethor î perîreng î
Bi rojê ra tu hevdeng î
Du reştûzên siyehyeng î
Kişandin lê ne wek caran
Xedengên qewsê nûbaran
Ji rengê şîr û mûkaran
Reşandin sîne wek baran
Ji wê derbê pir eşan im
»Şebaḥu l-xeyri ya xanim«
Were bînahiya çehvan
Bibînim bejn û balayê

Veke carek xeṭ û xalan
Li ser wan mesned û palan
Bixwîne lê me ʿebdalan
Bibînin ʿîd û sersalan
Îcazet dî me destûrê
Perîrengê şifethorê
Ji nêva zulmet û nûrê
Binoşîn mey di ferfûrê
Ji dil talanê xalan im
»Şebaḥu l-xeyri ya xan im«
Were bînahiya çehvan
Bibînim bejn û balayê

Ji şehkasa ko qerqef tê
Meya nûrîn muşerref tê
Nişanek dilberê keftê
Ji bo min her seher xef tê
Ji wê camê dinoşim ez
Seher lew ney li hoş im ez
Ji camê lê dipoşim ez
Bi can her lê dikoşim ez
Ko xalib mest û sekran im
»Şebaħu l-xeyri ya xanim«
Were bînahiya çehvan
Bibînim bejn û balayê

Were pêşber Melayê xwe
Şehîd û mubtelayê xwe
Bi şefqet ke liqayê xwe
Mela nemrit bi dayê xwe
Mesîhayê li bîmaran
Kesên geztî du reşmaran
Şehîdên şîr û mûkaran
Kirî amancê nûbaran
Li dîdara te heyran im
»Şebaħu l-xeyri ya xanim«
Were bînahiya çehvan
Bibînim bejn û balayê

Bab Y (yê) 111. Şenema sur ji şemed şewqê ji heq daye wucûdê

Şenema sur ji şemed şewqê ji heq daye wucûdê
Ger ʿezazîl-i bidîta nedibir xeyri sucûdê

Xerq-i bûm ez di xema ʿişqê di weqtê seherî bû
Ko tecellayê cemalê li mişalê beşerî bû
Ne ji lewnê beşeran min diye lê dêmê zerî bû
Ez dibêm Rûhê qudus bû bi xwe ya hor û perî bû
Lew bi husn û nezerê remzek ji sirra qederî bû
Xemriyên seyr-i li dêm helqe li dora qemerî bû
Şed xedeng dane ceger sîne ji derbê bi kerî bû
Li me êş û eleman zêde ji tîra qeçerî bû
Dil ji me bûye pelek can û cesed têk seqerî bû
Lew me şeb ta bi seher naliye wek muşnî û ʿûdê
Şenema sur ji şemed şewqê ji heq daye wucûdê
Ger ʿezazîl-i bidîta nedibir xeyri sucûdê




Nezerek wê beşerê lebşekerê horîsiriştê
Nadirim ez bi mey û kewşer û horên di bihiştê
Ê dîyî ew bi xwe carek di ʿecîbim ko bi hiş tê
Te ji wan qews û kevanan çi xedeng in di bi weş tê
Ew e min şafî derdan, me çi hacet bi nivîştê
Ger bikit husn û cemala xwe tecella di kiniştê
Dibitin Beytê qudus ehlê ziyarat ji Hebeş tê
Sîne putxane ye îro me ji dêm û qed û qîştê
Bi dilê sade çi kim ez ko tecella negihiştê
Ew e min qibleyê cebhet di qiyam û di qu ʿûdê
Şenema sur ji şemed şewqê ji heq daye wucûdê
Ger ʿezazîl-i bidîta nedibir xeyri sucûdê

Qibleya ehlê dilan ger bikitin keşfê cemalê
 Ya tecella ke ji ber tac û peran qewsê hilalê
 Kî bi dil kafir e ê sicde nebit cebhet û xalê
 Ya nedit şehde bi ayatê di wê weqt û mecalê
 Leyletu l-qedr e bi min ew se'et û 'îd e di salê
 Şefqe kir perde hilanî seherê şox û şepalê
 Eyisandîm û ji enwar û surê şubhê şemalê
 Meşiha mest û şekerleb bi me da mey ji peyalê
 Negiham secde bibim pir xecilîm ez ji wişalê
 Hadirê berqê li dil da ji tecella we şuhûdê
 Şenema sur ji şemed şewqê ji heq daye wucûdê
 Ger 'ezazîl-i bidîta nedibir xeyri sucûdê

Rohniya çeşm û çiraya me nizam hêj-i di bîr im
 Ko di zindan û hebisxaneyê wê bend û esîr im
 Ji xedengên qeçerî sine tejî gezme û tîr im
 Dil di nêv helqeyê zulfa siyeha bû ji 'ebîr im
 Têk perîşan lef û şitrîyû we tayên ji herîr im
 Tu heyî min di dinê lew di dinê begler û mîr im
 Zêr û mal er çi nedêrim te didêrim ne feqîr im
 Ji evîna te şepalê di şevan şubhê nedîr im
 Ji lebê le'le şekerbarê te wek şekker û şîr im
 Me ji ser ta bi qedem şohtine wek ateş û 'ûdê
 Şenema sur ji şemed şewqê ji heq daye wucûdê
 Ger 'ezazîl-i bidîta nedibir xeyri sucûdê

Bêhisab şox û şepalê li Melê qehr û xeder kir
 Ne em anîne xiyalê ne li halê me nezer kir
 Qeç nekir şefqe libasê xedebê zêde di ber kir
 'Illeta cewr û cefa û elemê cih bi ceger kir
 'Elilandîn di firaqê sitemê sine bi ker kir
 Ah-i hetta mirinê ev ji me ra daş û keser kir

Sefera Şam û ʿIraqê li me xweş lazim û fer kir
Bi me da jehr û reqîban di devê şehd û şeker kir
Em bûyîn pêt û pereng lew ji wişalê me hezêr kir
Nazik û neyşeker û xob û şirîn qedd û hudûdê
Şenema sur ji şemed şewqê ji heq daye wucûdê
Ger ʿezazîl-i bidîta nedibir xeyri sucûdê



Bab Y (yê) 112. Şenema sur ji şemed neyşekera leb ji nebat

Şenema sur ji şemed neyşekera leb ji nebat
»Ehsene l-lah û tebarek« ji sura wê şenemê

Enwera rengifirişte beşera horîsirişt
Ya ji miska Xetenê xal û xeş û kagul û qişt
Ger xwe nîşan seqerê dit dikirit hor-i bihişt
Ke^çbeya tê ne put ew putkede ye û dêr û kinişt
Ko neşîb da ji ezel heq ji me ra^çîşq-i newişt
Feyde nakin li me ism û ne tîlism û ne niwişt
Zahirî da me^ç ezabek we ko başin ve bihişt
Şohtinê daye hinavan û ceger têk-i birişt
Qeşd-i weşlê me bi can kir ko vedayîn û ne hişt
Dest nehilîn ji teşeb ger me di rê çit ser û tişt
Pişt-i nadîn du hezar xencer û tîr û rim û xişt
Me serî daniye rê û bi Xwidê bestiye pişt
Ew e min rûh û heyat û ew e min qibleyê zat
Şenema sur ji şemed neyşekera leb ji nebat
»Ehsene l-lah û tebarek« ji sura wê şenemê

Zeriya dêmidur û lebşekera^ç îşweperî
Ya ji ser ta bi qedem têk-i ji^ç eybane berî
Ji sera perdeyê Lahût-i bi şed şêwe kirî
Bête ber^ç eynê şuhûdê di libasê beşerî
Haşî li-l-lah tu kesan dîbitin ev rengê zerî
Daye ber qend û nebatê ji du le^çlên şekerî
Bê tu, ya lebşeker î, ya tu nebata bi ter î

Ellah ellah çi tecella ye ji sirra qederî
 Hacıyan silsile bestîne li dora qemerî
 Dor-i beytê ji Şefa têne semaya seherî
 Bê muruwwet ko du mêran ji surê mey di serî
 Ew nehêlin çîn tewafê we ziyaret hecerî
 Zemzem û xulxule û umre û id û erefat
 Şenema sur ji şemed neyşekera leb ji nebat
 »Ehsene l-lah û tebarek« ji sura wê şenemê

Min bi dil şûretê can dî ji butan ew bi tenê
 Ew tinê serwa rewan dî ji zerîfên çimenê
 Sosin û sinbil û gul çerx e li dora semenê
 Xemriyan helqe û çîn dane ji miska Xetenê
 Ser didin çeşmeyê heywan û bi zimzim direnê
 Lê çi şîranî ye Ellah te ji wê kift û çenê
 Ez dibêm bedr e bi dêm lê dikitin guft û kenê
 Ya yeqîn roj e li şerqê we şefeq daye dinê
 Xeliyim Rûhê qudus hatiye nêv wê bedenê
 Dikit îhyayê mewatan bi sur û reft û çunê
 Te nehin bawer û îman nezerê dê û binê
 Çi tecella ye bûyî qible melek rû didinê
 Azerî ger bidiya hûr dikirin Lat û Menat
 Şenema sur ji şemed neyşekera leb ji nebat
 »Ehsene l-lah û tebarek« ji sura wê şenemê

Nêrgiza mest û şîrîn û gul û nîsrîn e ji reng
 Şeker û lû'luwê menşûr û bi dil ahen û seng
 Me ji ber derbê evînê bûye dil pêt û pereng
 Lew me şeb ta bi seher nale ye wek muxnî û çeng
 Da me şed reng-i ezabê we nehat der ji me deng
 Hestiyan girtiye naşûr û mejî da heye jeng
 Lew ne hişyar û xumar in me nexwarî mey û beng

Li me îro du kemandarê hebeş hatine ceng
Têne qetla me di destan du siyehqewsê ji Yeng
Direşînin me û tèn me du hezar tîr û xedeng
Cegerê kun dikin û tê dibeyin mişlê tifeng
Mişlê wê kafir û zalim qe diyin kes di Fireng
Nazik û xob û şekerxende û şêrînhêrekate
Şenema sur ji şemed neyşekera leb ji nebat
»Ehsene l-lah û tebarek« ji sura wê şenemê

Di riya dostê Mela yekcihet û sadedil î
Me hetta can heye haşa ji teheb dest bihilîn
Ya di rê ser bidirîn ya bi muradê weşilîn
Me çî perwayê rimên ber weşê şêrînqizil î
Ta ebed mest û hilak î ji şeraba ezel î
Ji cefa û sitema wê ji ceger pir di kul î
Perdeya guşeqeşeb bê tu ji ser dêmê hilîn
Ko di şerqê Meh û Xurşîd-i ji şewqê beşîlîn
Lew ji sur surme didêrîn we ne muhtacê kil î
Mest di nêv tor û lefan marê li selwê fittilîn
Surmedarên ji surê mest-i, ji qudret kemmilîn
Me ji xeflet du jiha dîn û ji sehmê xeccilîn
Îşweker şêwe numa ya me ji wê rûh û heyat
Şenema sur ji şemed neyşekera leb ji nebat
»Ehsene l-lah û tebarek« ji sura wê şenemê

Bab Y (yê) 113. Îro mi dî weqtê seher

Îro mi dî weqtê seher
Ew dilbera sundus di ber
Dîsa di lebsê şor û zer
Nûrek munezzeh bû beşer
Biskên siyah xalên di qer
Reşkagulê zulf çûne ser
Eswed bû da'im secde ber
Min bestî 'eqda niyyetê
Xeflet bi sir da min nezer
Mîran bi qetlê kir xeder
Tîr dane dil şahê Mecer
Bêmurwe amanc kir ceger
Feryad û efşan şed keser
Weşfan neşêm lê ev qeder
Zanim ko roj bû hate der
Subhan ji şahê qudretê

Subhan ji te şahê celal
Hostayê pir qudret li bal
Xaşa te dayî ev cemal
Dêmê ji qudret xetî û xal
Kifş bû di qewsê da hilal
Vê ra mi dî bedra kemal
Lê bûn niqab çewgan û dal
Wan yek bi mestî daye pal
Lê seyyirî bayê şimal
Pêçane ser nûra zelal
Qeş kes-i dîn ev reng mişal
Muṭrib were weqt e û mecal
Zaza bi nayê ra binal

Saqî werîn xemra helal
Carek ji ser dêmê vimal
Zulfên li dora cebhetê

Zulfên mu^cenber kagulîn
Biskên siyahreng sinbilîn
Ta ta bi dav dav fittilîn
Çinçîn bi mestî silsilîn
Dayê nesîm têk meyyilîn
Wê qest e xala filfilîn
Ebleq ji qudret xemmilîn
Wê buxçeyê gul kemmilîn
Tê^cendelîb û bilbilîn
Roj hate birca sinbilîn
Xeflet me dî lew xeccilîn
Mehrûm û mehcûr dilkul î
Mecrûhê tîrên qizil î
Rehmê ke pir şohtîdil î
Vê perdeyê carek hilîn
Bavê niqaba zulmetê

Pirsê l' mihirdarê xwe ke
Li meczûb û haldarê xwe ke
Bes qehr û azarê xwe ke
Qesta birîndarê xwe ke
Şefqê bi dîdarê xwe ke
Têk xerqê enwarê xwe ke
Lê emr û ferwarê xwe ke
Şehîdê nûbarê xwe ke
Gestiyê reşmarê xwe ke
Le^lê şekerbarê xwe ke
Bi lefz û guftarê xwe ke

Dermanê kuldarê xwe ke
Lê keşfê esrarê xwe ke
Mexmûrê xemmarê xwe ke
Heyranê reftarê xwe ke
Kuştîne tîra muhbetê

Wer ser de carek kuştiyan
Extermeyên xwe b' yengiyan
Berde bi mil da xemriyan
Badet seher reyhaniyan
Daşên şehîd û şohtiyan
Danîne lê wan tiliyan
Ko j' mu'ciza xummariyan
Rûh bête dîsa ser giyan
Hêj nabirim qeş hêviyan
Ji wan şefqe û dildariyan
Bi l-lah ji nal û zariyan
Derba firaq û bihriyan
Teşbihê tûtakên çiyân
Xew nakirîn şevtariyan
Lê hêj dixwazîn şukriyan
Çendî ko rû dîn qibletê

Çendî dinê bit her hebî
'Alem di ber hukmê te bî
Herçî divê te her we bî
Lebsê te kêmxe û xare bî
Da'im bi remz û 'işwe bî
Şubhet gula her xunçe bî
Wê buxçeyê xar tê nebî
Ageh ji 'uşşaqên xwe bî
Çeşmek li eḫwalê me bî

Derheq me lê bêperde bî
Saẓer medam pir bade bî
Pir şefqe û xweşme^c de bî
Bihtir bi rehm û şefqe bî
Bi şîrê te da perwane bî
Mexmûrê çehvên şehle bî
Şotîne narê firqetê

Derdê ẓedar bêm firqet e
Firqet ji can pir zehmet e
Aşiq mirin her sa^cet e
Ya sehl-i aşiq rûh dite
Lê dilber evreng^c adet e
Herçî di bendê da kete
Ewwel didit pê ulfet e
Zewq û şefa û şuhbet e
Gavek ko ew vê ra rete
Anca ji nageh ẓeflet e
Şîrê cefayê lê dite
Ellah çi wê bêmurwe e
Rehmê bi aşiq nabite
Wê qest e can yexma kite
Hetta ko dil qenc jê bite
Inşaf ji mehrûyan ne tê

Yar qest e can yexma kirit
Da mu^cizê peyda kirit
Remzek ji reng Îsa kirit
Ya sihr-i Bû-Sîna kirit
Ji ew le^l-i şekkerxa kirit
Dîsa şehîdan rakirit
Van koleyan aza kirit

Carek xerîban şa kirit
Rastê yedê beyda kirit
Miskê di cerhan dagirit
Da xweş bikit îhya kirit
Şefqê ke ya reb da kirit
Reşkagulan ta ta kirit
Şed helqe çîn çîn ba kirit
Hemyan li dêm tuxra kirit
Emrê humayûn ser me tê

°Aşiq divê dil sade bit
Xaka riya yarê xwe bit
Şed dax di dil wek lale bit
Xwînê bixwit rengxunçe bit
Wî can fida şubhet me bit
Lê j' emrê yar xafil nebit
Da'im bi se'y û cehde bit
Teb'ê ko yar lê, ew we bit
Yar jî digel bêperde bit
Vê ra bi rehm û şefqe bit
Wek xunçe °aşiq dil vebit
Dil şubhetê ayîne bit
°İşq û cemal jêk zêde bit
Xal eswed û dêm qible bit
Pêş herdu nûnan secde bit
Vêk ra biwêrin şubhetê

Ê goyê meydanê te bit
Wek min di zindanê te bit
Serbendê çewganê te bit
Mecrûhê peykanê te bit
Yeşma û talanê te bit

Her roj jî qurbanê te bit
Bîmarê mujganê te bit
Da'im di fermanê te bit
Hêbsî di zindanê te bit
Muştâq û heyranê te bit
Şohtî ji hicranê te bit
Dê mestê fincanê te bit
Wî behr di nîşanê te bit
Mûçî ji ber xwanê te bit
Lê luţf û ihsanê te bit
Herdem bixwînî heqretê

Caman bi eşyaran nedî
Xemrê bi xwînxwaran nedî
Werdan bi murdaran nedî
Wan rê di gulzaran nedî
Reyhan û gulnaran nedî
Bo wan ji jeyn xaran nedî
Tu remz û esraran nedî
Koran tu enwaran nedî
Azarê mihrdaran nedî
Lê destê bedkaran nedî
Bi nûnekê yaran nedî
Nêv me û xwe estaran nedî
Tîran ji nû baran nedî
Derdan bi bîmaran nedî
Ji xeyr-i sê caran nedî
Rîşin nedêrin taqetê

Bes aşiqan mehcûr bikî
Şubhet Melê rencûr bikî
Qelbê şikestî hûr bikî

Şûna birînan kûr bikî
Şem^ˆa me jê pir nûr bikî
Bi zehrê xwe me me^ˆmûr bikî
Tenha me bêdestûr bikî
Meħrem serayê ħor bikî
Bi weşla xwe da fexfûr bikî
Ji wê badeyê mexmûr bikî
Nêv kaseya ferfûr bikî
Feydê li dil da fûr bikî
Dêmê ji reng kafûr bikî
Dalan ji xalan dûr bikî
Pê^ˆalemê meqhûr bikî
Weqtê seħergeh bade tê

Bab Y (yê) 114. Me bi dil nêrgizên xaşşe divên

Me bi dil nêrgizên xaşşe divên
Semen û yasemînê taze divên
Nazik û neyşekerên tuhfe divên
Sosinên nazik û terwende divên
Dilberên dêmdur û durdane divên
Kewkebên şewq û şefeq zuhre divên
Naz-i perwerde û şehzade divên
Sayeperwerde me bêperde divên
Serwiqed dêmgul û lebğunçe divên
Ayetu l-lahî şerîf-nusxe divên
Lê bi i^c rab û xeş û cezme divên
Dilrubayan ne tinê xemze divên
Bi mesîhaşifetê işwe divên
Samirî sihrîşifet şêwe divên
Şenemên sur ji şemed her me divên
Ji me eswedheceraan secde divên
Bi ziyaret me ji wan bûse divên
Turreya şeng-i dil-aşûfte divên
Mihridarên xwe di pijmurde divên
Pêşkişa te me duşed nafe divên
Şed hezar eyles û hem xare divên
Her li bo zînet û xemla te divên
Textebend û şifetên qeyseriyê
Dînberê horîmişalê zeriye
Nazikê neyşekerê surperiyê

Pir ji dîna te xerîb im xanim
 Ji te ser ta bi qedem heyran im
 Her bi can teşnelebê le'lan im
 Dil di benda giriha zulfan im
 Yûsifê cur'ekeşê hicran im
 Nuqteyê da'ireyê zindan im
 Lew şubê da'ire sergerdan im
 Badenoşê qedeşê hirman im
 Bi dil ateş ji ceger buryan im
 Lew perîşan im we pir êşan im
 Aşiqê nazik û mehbûban im
 Tu mebîn bêser û bêsaman im
 Gulê baxê Iremê Bohtan im
 Şebçiraşê şebê Kurdistan im
 Çi tebî'et beşer û insan im
 Li l-lahi l-ğemd çi 'alîşan im
 Di riya yar li rêza şan im
 Lew di iqlîmê suxen xaqan im
 Şibehê 'îd e û ez pê zan im
 Ko bi kêra te seher qurban im
 Xweşbirîndarekê bêderman im
 Carekê şefqe ke rûhim canim
 Ji xwidê ra veke benda beriyê
 Dînbirê horîmişalê zeriye
 Nazikê neyşekerê surperiyê

Sosinên taze û mişkên walan
 Bes perîşan ke li ser sermalan
 Veke carek tu ji dora xalan
 Ji dil em dayîne ber çingalan
 Xencer û şîr û rimên qettalan
 Nezerê wer bide şahibhalan

Ko çî êsîr îin di dest heyyalan
 Lew elif tîn me di herfên falan
 Ko li şeklê reqemê sersalan
 Tu y' murada me ji ʿerʿerbalan
 Zimzim û deng û zimihna lalan
 Cezbe da me bi hezar ehwalan
 Lew dinalîn ji neseq ʿebdalan
 Ko bi mestî didirin yek palan
 ʿEnberên xemrî û sosinalan
 Şohr û zer şitrî û çiçek alan
 Mişriyên wan ji me kir kalan
 Te ji qews û qezehên xilxalan
 Ko bûyîn da ʿire şubhet halan
 Xemriyên xemzede nisbet dalan
 Ko çevandîne ji reng gopalan
 Mişriyan wer bide ber sîqalan
 Zuhre rengê we şefeqmuşteriyê
 Dînbirê horîmişalê zeriye
 Nazikê neyşekerê surperiyê

Sinbilan taze muşenna nekirî
 Turreya şeng-i muţerra nekirî
 Xemriyan şêfite tuşra nekirî
 ʿErʿerê xare û dîba nekirî
 Dil û dîn xaret û yeşma nekirî
 Serê sewdazede sewda nekirî
 Guhriyê nêrgisê şehla nekirî
 Kuştiyê xencerê birra nekirî
 Saʿetê vê seʿetê ranekirî
 Me ji qeyda xwe tesella nekirî
 Lê xeramê li me mestane kirî
 Ji me dil Keʿbe û butxane kirî

De^cweyê dilberîyê dane kirî
 Celweyek mîrî û şahane kirî
 Pêş-i şem^ca xwe me perwane kirî
 Dilê xemdîdeyê ma şa nekirî
 Li me bêperde tecella nekirî
 Wihe carek me tewella nekirî
 Xencekê qenc-i li Mella nekirî
 Cegerê rîş-i mudawa nekirî
 Bikujî aşiq û perwane kirî
 Li şehîdê xwe temaşa nekirî
 Ma we dilber dikirin dilberiyê
 Dînbirê horîmişalê zeriye
 Nazikê neyşekerê surperiyê

Herdu qewsên te ji qudret ne ji Yeng
 Jê bi mîzan bireşînin me xedeng
 Biderin sîne bi ser pence peleng
 Rom-i pişt dit^cecemê bête fireng
 Lê ne wek waqî^ceya Gî û Peşeng
 Hilbitin qenc ji nêv ateşê ceng
 Tê suwaşê hebeş û nûbî û zeng
 Tu dizanî çi neheng in çi neheng
 Veke le^clan tu ji ser şekkerê teng
 Ko j' murada te bûyîn pêt û pereng
 Mestê cewra te me bê bade û beng
 Bê te cana li me^calem bûye teng
 Ji cefaya te nema qeç li me reng
 Tu dizanî çi dibêjit ney û çeng
 Ji çi peyweste dinalin seradeng
 Me dixwînin qed û bejna te yî şeng
 Nêrgizên mest-i bi naz û neyireng
 Lê tu tûba we ezê xesteyê leng




Çi bikim feyde ko êvar e dereng
 Muṭriban da nekevin çeng-i ji çeng
 Da nedit perdeyê ayîneyê zeng
 Ko ji çenga me binalit xerçeng
 Wek Melayî bi hezar reng û aheng
 Bi fiṭan bêt û ji ber şed ferseng
 Çi xeber dim ji dilê tey wekî seng
 Dikuji aşiqê miskîn bi tifeng
 Nekirî terk-i tu vê kafiriyê
 Dînbirê ḥorîmişalê zeriye
 Nazikê neyşekerê surperiyê

Bi qedê nêrgiza Bohtan î
 Nazikek şeng-i şubê reyḥan î
 Çi xet işkeste şirîn reyḥan î
 Ko te pê nesx-i kirî dîwanî
 Ellah ellah ji çî reng insan î
 Yûsifê lebşekerê ibrânî
 Bes e ger wek te bidêrit şanî
 Ḥoriyên rûhişifet rûḥanî
 Wek te ser ta bi qedem nûranî
 Wek te ḥaşa hebitin şîranî
 »Eḥsene l-lah« ji sira subḥanî
 Ko cemalek we munezzeh anî
 Di mişalek beşerî da danî
 Me bi ilham-i ilahî zanî
 Bi nişan-i qudret bê nişan î
 Çi nişanzulmetê nûrefşan î
 Li cemala şemedî burhan î
 Tu li derḥeq me çira erzan î
 Ko seḥergeh bimeşî seyranî
 Te Melayê xwe qe carek nanî

Bi serefrazî û 'alîşanî
Secde bit ber qedema sulţanî
Ne tinê rûh î tu rûh û can î
Zînet a ھusn û sura xoban î
Tac-i ferq-i serê meھbûban î
Tu bi şîranî û lebşekkeriyê
Dînbirê ھorîmişalê zeriye
Nazikê neyşekerê surperiyê

– DAWÎ –

Ferhengok



Ferhengok

Ev ferhengok ji hinek bêjeyên »Dîwanê« yên bijare pêk têt. Selam Ni^cmanî bêje li gor me^cneyên wan yên di »Dîwana« Melayê Cizîrî de rave kirine û lewra jî dibe ko hinek ji van bêjeyan me^cneyên di jî hebin.

A.

‘ac	hestiyên spî yên qîlên filan
afitab	roj
ahûsifet	rengxezal
‘aliyat	bilind, hirûfên bilind
‘alî	bilind
amirzigar	bimexfîret
‘aride	hinarikên rûyî
asan	hêsanî
asih	ji bêjeya »as-ê«: dareka agirê wê gur e
asitan	şîpane, şîpik, binderî, paçîne
aşofte	nearam (di hişê xwe de); dil-aşofte: dildar
axoş(eş)	hembêz
azar	êşkence

B.

bab	derî
bac	vêrgî, zikat
bade	mey, şerab
badexwir	meyxwir
bah	eşkere kirin
bala	cihê bilind, bejna bilind
balîn	balgeh, balingî
baxwey	xwedê
bazîsifet	wekî teyrê baz

bazû	ji milan ta enîşkê
be'îd	dûr
bednam	navxirab
Bedexşan	memleketek di nêvbera Hindistanê û Xurasanê de ye, bi berê le'lê yê sor û giranbiha meşhûr e
bedkar	kesê xirab, nebaş
bedxwah	wijdanxirab, bêwijdan
behêtim	hilandim
belazîz	kulîlkeka çiyayî ye, biharan şîn dibe, rengê wê şînê vekirî ye
bellix	bigihîne
beqa	mayîn
berah	la berah: bêguman
berahîn	pirejimara »burhan-ê« ye. burhan: spartek, îsbat
beranî	ji »randinê« ye, yanî dûrkin, berdane, siktirkirin
berat	fermana siltanî ya efwê, ji bêjeya erebî »bera'et-ê«: bêsuçî şeva beratê: şeva nivê şe'banê, meha berî remezanê
berîd	poste
berq	birûsk
berzex	astenga di nêvbera du tiştan de; bihnok li gorî »Qur'anê«: dema ji mirinê ta roja qiyametê
best	ji »bestin-ê«: girêdan
beyaban	sehra, qûmistan
beyad	spîyîtî, tersê reşîtiyê
bezm	meclisa sihbetê
bêdax	kesê bê dax û bê birîn
bêgav	bê dem, mebest jê herdem e.
bêsaman	bêmal, bêserwet
bêwer	cihê lê bêwer î tu: cihê tu lê dimînî, dijî
bêweter	qewsê bêweter: kevana bêta, bêtêl
bêxar	xar: strî, dirî; bêxar: bêstirî
bêxwab	bêxew
bêzar	hejar, mihtac, reben,
bêzê	dibe ko bi mana »dibeze« be; bêzê dicit: dibeze
bi-midrâc	midrac: rê, mebest: dema stêrik diçe rojavayê
bi-mişkat(î)	bi: di; mişkat: kulek
bi-terfet	bi-terfeti l'-eyn: bi girtin û vekirina çavan
bidayet	destpêk
bidêrit	jê (wî, Yûsif) re
bilor	şûşe, zicac, cam
binumêt	diyar bibe, xwiya bike

biqeşî	biqeşit, siktir bibe
Birca-hemel	Yek ji bircên felekê ye. hemel: berxik
biret	bêt û biret: tê û diçe (mebest: jê dike)
biryan	goştê biraştî
biwar	borandin, derbas kirin
bîmar	nexweş
bînahî	bînahiya çehvan: bîbika çavan, hêza dîtinê ya çavan
bîvêr	nexweşê bêhal û li ber mirinê
bîz	dikit bîz: xwe dûr dixe
bor	di hin devokan de hesp e, di farisî de hespê kimêd e
buryan	li »biryan-ê« binêre
bused	dispêre
but	senem, heykel
butxane	me'bed, heykelxane
bûsezen	yê maç dike

C.

cadû	1. sihirbaz, 2. çav û birhên yarê
cam	qedeh
camid	yê bêhest û can
canfeza	yê canan vedijîne
cangiramî	canê xweşewîst
cangudaz	canhelîn
ce'd	xelek-xelekiya porê
cebeh	firehî û bedewiya eniyê
cebel	çiya
ceberûtî	mezin, ceberût: di sofitiyê de dereceyek e
cehan	1. cihan, dinya, 'alem, 2. laşê mirovî
cehde	kar û hewldan
cela	1. diyar bû, xuya bû, kifş bû, 2. şayikbûn, cela girtin
celîd	qeşa
celîl	1. mezin, 2. navekê Xwedê ye
cellab	1. cellabê du'a: yê du'ayan dike 2. dibe ko mebest jê kewê celab be
cema	cema kir: civiya
cer'e	qurta avê
cerde	1. siyahcerde: rengreş 2. Gihan min rast û çep cerde: mebest jê pîrbûna tîran e.
cerem	la cerem: bê guman
ceres	zengil

cerîd	şaxê dara xurmeyê, bê pel û qaşil e
cewlan	ger, seyran, sivikkirina bêjeya »cewelan-ê« ye
cewr	zordarî, stemkarî
cewşen	silehek yê şerî ye, gumlekekê ji hêsinî ye
ceyb	bêrik
cilwenuma	xuya, diyar
cinesrî	nesrîn
cirah	pirejimara »curh-ê«: birîn
coşîş	kelandin, fûrandin
cullab	gulav, ava gulan digel şeker yan hingiviyî
cur^fekeş	mevexwer: yê di binê cama xwe de bang dide
cûd	comerdî, merdî
Ç.	
ça	çem, cobar
çaha	çaha zeqenê: bîra erzinkê
çaker	xulam, garson
çaşitî	ji bêjeya tirkî »çaşit-ê« ye, bi manaya »hemta«
çelîpa	xaç
çeng	enstrumenteka muzîkê ye
çespan	pêvekirin, girêdan
çeşim	çeşm: çav
çetr	kon
çewgan	1. kaşo: çelakê lehîstoka kaşoyanê 2. sewlecan, darê padîşahan e
çexane	enstrumenteka mûzîkê ye
çîn-çîn	1. xelek-xelekî (por), 2. di qesîda 26-ê de Çîn: welatê Çînê
çokar	1. xizmet, 2. xulam
D.	
daberistin	beziyan û êrişkirin
dac	tarî
dadires	dad-res: dadevan, qazî
damen	1. çepûn, 2. tîk
dared	mîdared: demê niho ji »standinê«
darîn	navê îmanekê li Behreynê ye, misk ji Hindistanê dihate wir
darû	derman
dawer	ji »dadwer-ê«, Xwedê
dehan	dev
delq	xirqe, kirasê derwêşan

demsaz	hevalê suhbetê
dengiz	derya, behr
deraxoş	di hembêzê de
dergerdiş	di zivirîna ...
derrak	têgihîştî, pirzana
dewletxwah	şadîxwaz, xweşîxwaz
deycor	tarî, reş
deyr	dêr, xaniyê rahiban
deyyûmî	pirbûna dewamiyê
dêrîn	kevin, kevnar
diderin	1. dikevin, 2. pala xwe didin
didêrim	min heye
dihen	li »dehan-ê« binêre
dikoşim	hewl didim, cehdê dikim
dil fesan	fesan: efsane, çîrok
dilgeşte	geşte: ji »geştên-ê« = zivirîn
dilawîz	bêhnxweş; dilruba
dilruba	yê/ya dilan direvîne
dipoşim	vedîşêrim
diram	pêketina agirî
dirayet	zanîn
dîba	dîbac: qumaşê bi qeseb û zêr
dîbac	li »dîba« binêre
dîdar	dên, dîtin, çav
dîm	lêkera dema borî ji »dîtinê«
dînber	ya/yê ko dînê mirovî dibe, mirovî dike kafir
doguş	sivikbûya »dogoşê«: pevçûn
dojeh	cehennem
dox	çovek e ko bi serê wî ve guhikeka ji qîrê yan textekê bi bismaran deqandî heye
dozexê	cehnime
duldul	navê hêstira 'Elî bin ebî Talib, ko pêxemberî bi diyarî dabûyê
durc	qutiya gewher û berên giranbiha
durdane	liba durê; dur: ji berên giranbiha
durrac	teyrek ji kewî mezintir û wekî kewî ye
duşmen	dijmin
duşnam	dijûn, xeber, sixêf
dûd	dûman
dûredest	bêçare, bêhêz
ebarîq	pirejimara »ibrîqê« = misîn

E.

‘ebes	‘ebes: bi »ş« ê, bêhûde ‘ebes: di qesîda 39-ê de »ş« kiriye »s« ji bo qafiyê.
ebîq	bihna wê difûre
ebîr	bihna gulan
ebleh	ehmeq, bêhiş
ebleq	reş û spî, mebest jê çavên yarê ne
ebsar	pirejimara »beser-ê«: dên, çav, dîdar
ebter	kurûkem, perîşan, hejar
ebyed	navê şeytanekî ye
ebyedweswas	li »ebyed-ê« binêre
‘ecac	bablesûtik, Di qesîda 26-ê de »‘ucac« heye, her ew e. Rastiya wê »‘ecac« e.
‘edem	nebûn
‘edes	nîsk, gotina yarê »‘edes î tu« li vir pirs e, yanî »ma tu ‘edes î ez te ker bikim?«
‘edn(in)	cennatu ‘ednin: bihiştên mirov lê dimînin, tê de dijîn
efel	efel: çû ava; lemma efel: dema çû ava mebest: dema ko yar diçe tikes nikare di heqê wê de bi xirabî biaxive
eflak	pirejimara »felek-ê«: dinya, esman
Efrasiyab	navê şahek ji şahên farisan e
ehabe(t)	tirsandin
Ehremen	xwedayê xirabiyê, şeytan
ehwahu	ehwa: hez dikim, We-men ehwahu: û yê ez jê hez dikim
‘elaî	ji mana malik û qesîdeyê dixwiye ko navê şa’îrekî ye. Dibe ko ‘ecem be û dibe ko şa’îrê ereba Ebu ‘l-‘Ela` be. Dibe jî ko bi mana bilindbûnê be, û hingê wê bi vî awayî »‘ela î« bête nivîsîn.
‘elemdar	beyreqdar, yê alayê hildigre.
elest	Dema Xwedê Adem çêdike ji firîşteyan re dibêje: »elestu bi-rebbikum« yanî »ma ez ne Xwedayê we me«? sehergaha elest: sibeha »elestu bi-rebbikum«
‘elilandîn	em nexweş kirin
‘emîq	kûr, bêbinî
emwac	pirejimara »mewc-ê«: pêl
‘enber	Bêhneka xweş e, ji hinavên gamasiyekî derdixin.
‘enberamîz	tev-li-‘enber-bûyî
‘enberefşan	‘enberrêj, yê ‘enberê direşîne
‘enberşiken	zîlfên ‘enberîn

endaze	hendese
endelib	teyrekê dengxweş e
engîz	yê/ya gur dike
enguşt	penc, tilî
engûr	tirî; ji tirî
engûri	li »engûr-ê« binêre
eqreb	dûvpiştik
er'er	dareka ji familyeya sinoberê ye
erdihala	nameya ko mirov rewş û giliya xwe tê de dinvîsîne
Ereş	navê bajarekî ye
erixîm	gihiştin; ji »erixandin-ê«: gihiştin; rexa behrê
Erjeng	1. xaniyê Manî, resam û pêxemberê faris; pirtûka wî ya wêneyan, 2. putxaneyeka çînî
ermah	pirejimara »rumh«: rim
erzen	erzing, çene
estar	pirejimara »sitr-ê«: perde
estuqus	kok, esil, element
eşbah	pirejimara »şebah-ê«: laş, kes, tişt
eşk	hêstir, rondik, hêsir
etaya	daneyên
etf(i)	xwarbûn, meyl
etwar	pirejimara »tewr-ê«: dem, awa, rewş, hal
evistin	ji »ev« û »estin-ê«: ev heye
ewrad	pirejimara »wird-ê«: cuz'ek ji »Qur'anê«
ewsaf	pirejimara »wesf« û »sifet-ê«: regdêr, sifet
ewtar	pirejimara »weter-ê«: têla sazê yan kevan
exter	kewkeb, planet
exterme	dîl, êxsîr
Eyaz	navê xulamê siltan Mehmûdê Xeznewî ye, xweşewîst û yarê wî bû
ezazil	firîşteyê gunehkar, iblîs
ezfer	bêhnxweş
Ê.	
êlan	mar, mebest ji »maran« guliyên yarê ne
êlî	'alî, bilind
F.	
fah	bêhna wê/wî ya xweş belav bû, fûriya
ferec	firehî

fereq	belavbûyî
feres	hesp
ferrar	pir direve
ferre	reviya
ferseng	fersex, pîvanek e, dor 4 mîlan e
ferwar	xaniyê havînî Melayî di sê qesîdeyan de bi mana »ferman« bi kar aniye.
ferxunde	kamiran, kêfxweş, oxur
fexfûr	1. navê giştî yê imperatorê Çînê 2. Li Çînê cihek e ko bi ferfûriyên xwe meşhûr e. 3. ferfûrî
feyd	xêr û bereket
fireşte	milyaket
firyadres	arîkar
fişandî	ji »fişandin«: reşandin
fitrak	benên bi dawiya kurtanî ve tên girêdan, siwar tiştên xwe pê ve girêdide.
fu'ad	dil
G.	
gerdiş	ger, zivirandin
gerdûn	dolab, asman, kureya asimanan
gerem	gerem bî: ger mira bibî
gezim	tîr
gêra	geriyan
gil	herî
gileh	gilî, gazind
girih	girêk; girihdar: bi girêk
girişme	xwe delalî kirin, çav dan, nerîna teji eşq û hezkirin
girîban	bêrîk, vekirina qemîsî
gîsû	bisk, gulî
goygeran	yên guhikê digerînin, pê dilîzin
goyîn	teyrekî çiyayî ye, bi şevê bang dike
gudaz	dihilîne, dişewitîne
guftar	gotin
guhî	qurban
gul'izar	dêmgul, hinarikên wek gulan
gulgûn	rengê xwînê
gulşen	gulistan, bîstanê gulan
gunbed	qube

H.

hadir	amade, yekser
hamûn	beyaban, sehra
hatif	1. yê/ya ko bilind diqîre 2. dengê ji asmanan yan ji xeybê 3. milyaketê parêzer
hatike	ha ji te re
hebbeza	xwezî, xweziya
hecer	ber, kevir; mebest jê »Berê-reş« yê hecê ye
hecir	hecra yarê: dûrketina wê
hedret	1. baneşana ko xelk pê gazî mezinan dike 2. hizûr, mezinahî, hêz
hela	1. dên/bal kişandin, 2. dawî: di dawiyê de
helahil	zehra helahil: jehra mirinê
hemail	şîran pê ve dadileqînin, barhilgira şîran mebest: dixwaze ko herdu destên wî wekî hemailan rahêjin bejna yarê ya ko wekî şîrî ye
hemamat	hemamatê 'ecacê: dengê bablesûtikê
hemaxoş	di hambêza hevûdu de
hemda	pesindan, şikir ji xwedê re
hemqeran	hevalên hev, girêdayên hevûdu
herêm	1. kesên ko dîtina yarê ji wan re ne qedexe ye 2. herêmên xidmetê: xulam, nêvmalî
herîfan	hemkar, kesên di yek karî de mijûl in
herîr	ermûş
heşem	1. mezinahî, 2. xulam, kole û berdest
hezer	me hezer kir: em tirsiyan
hicab	perde, perdeya ko dikeve nêvbeyna du kesan
hicran	dûrbûna ji dost û yaran
hilêtin	weqtê hilêtin: dema pêdikeve
hisar	hawîrdor girtin
hîret	matmayîn, bêçarebûn
hub	hezkirin
hudûs	dinya, bûyîn, nû, nuhtî, bûyer
huma	huma: teyrê fîniq (phoenix) yê efsaneyî
huqqebaz	hîlebaz, xapînok

I.

i'caz	bêçaretî, matmayî kirin, ecêb
i'rab	vekîr û hevoksazî

i'zaz	mezinahiya nefsê, 'izzet
idafat	lêzêdekirin
iksîr	kevîrê feylesofan, iksîr elemetek e ko sifirî dike zêr
imsak	girtin, dûrketin, imsaki rûh: dûrketina rûhî ji xweşiyên dinyayê
inşa	1. peyda kirin, avakirin, 2. avahî
intixab	bijartin, hilbijartin
iqab	ceza
isabe	şivak, paçê li eniyê girêdidin
istiwa	misêwabûn, rastbûn
istixna	istixna dike: xwe mihtac nabîne istixna ji xelkê dike: xwe mihtacê xelkê nabîne.
işkeste	şikestî
işraq	ronahî
işwe	xwe-delalî-kirin, çavdan, xwe-li-ba-kirin
izar	nêvbera hinarikên rû û zilfan

Î.

îlan	mar, mebest jê »gulî« ye
îsand	agir yan rohnî pêxistin

J.

jeng	zingar
jeyn	ji bilî
jih	têla enstrumentên muzîkê, benê kevanê
jiha	marê mezin
ji	jiyan

K.

kafûr	bêhneka xweş e, mûma spî
kagul	kakûl, gulî
kame	dev, zimanê kiçik
kamibexş	kam: dilbijandin; kamibexş: yê/ya dilbijandinê dide
kan	kana madenan; cihê ko keviran jê dertêxin
kaşo	çewgan, çelakê lehîstoka kaşoyanê
kebed	mîlak, ceger
kebk	kew
kebûter	kevok
keckuleh	kimxwar, kulaxwar
kecrew	rêveçûna bi xwarî û tewandin
kehîl	çavên kilkirî

kemend	dava nêçîrê; di şerî de li ber neyaran vedidin
kemxe	kemxe: ermûşê demesqî yê ji rengê kimxe: ermûşê demesqî yê pirreng
kenz	gencîne, xezîne
ker	ker kirin: parçe kirin
kerixîm	bêhest bûn, zuha bûn, hişk bûn, dilnebijan
kerker	parçe-parçe
Kerx	Taxeka Bexdayê, Me'rûf 'l- Kerxî: şêxê sofî yê ji Kerxê
kesret	gelikahî, pirîtî
kewakib	pirejimara »kewkebê«; stêr; planet
kewkeb	stêr; planet
kewser	robarek yê biheştê ye, hemî robarên dî ava xwe jê distînin
keyb	xem
keyber	rimeka dirêj e, ji bo niçêrê ye
keyl	mîr, eslê bêjeyê »qeyl« e qeyl: padişahê erebên Yemenê yê berî islamê
kilk	qelem
kilox	qafê serî
kişwer	memleket, herêm
kîmxe	ermûşê qesebkirî û terizandî
kuca	çawa; kûder
kuhl	kuhlê beser: kilê çavan
kuşa'î	ji »kuşaden-ê«: vekirin
kûz	tewayî, xwarbûyî
kûze	kûzê avê, denê avê
L.	
lah	xuya bû
lahût	xwedahî
lami'	bi ronî, dibiriq
Lat	senemekê ereban yê berî islamê
le'lileb	lêvyaqût, lêvsor
ledunî	xwedahî, yên ji bal Xwedê ve
lef	şelpeya ko jin didin serê xwe
leng	seqet; Teymûrileng: Teymûrê seqet
leyse	nîne; leyse lena: ji me re nîne
Lubab	Pirtûka el-Fadil el-Isferaînî li ser rêzimana zimanê erebî, ew hingê pir belav bû û gelek kitêbên ravekirinê li ser wê hatine nivîsandin.
lucec	hemî ava deryayê

M.

madar	hawîrdor
mahirû	heyîvrû; rûvekirî
mawer	mawerd, gulav, ava gulan, mawer ke: ava gulan lê ke
Mecer	Meceristan, Hungariya
medeh	medh, pesindan
meges	mêş
mehfilha	mehfil: cihê civînê, ha: di farisî de nîşana pirejimarê ye
mehmilha	mehmil: bar
	doşeka li ser pişta deveyê ko tenê kesek li serê rûdine
mensûr	1. lû'lû'-i mensûr: lû'lû'ê reşandî 2. Mensûr: Mensûrê Hellac 3. mensûr: biserketî
menşûri	menşûr-i bî: bilind bî, belav bî
menzûri	menzûr-i bî: lê bê nêrîn, bibe temaşageh
meşreb	vexwarin; meyxane
meşşate	1. ya şeh dike, 2. ya xemla bûkê lê dike, 3. bi mebesta: Xwedê
mexfî	mexfî bûn: veşartî bûn
mexmûr	serxweş, sekran, meyvexwarî
meykede	meyxane
micmer	legena bizotiyên agirî ko bixûr û bêhnên xweş tê de dişewitînin
mihek	kevirê ko pê paqijî û iyara zêrî tê nas kirin
mirwet	mirovatî, bêmirwet: hov, nedilovan
misbah	lempe
mizac	1. karakter xoy, 2. tevlihevkin, têkilêkkirin
mîared	ji »awerden-ê«: hênan, anîn
mîbered	ji »burden-ê«: birin, birdin, mîbered: dibe
mîdared	dest pê dike
mufa	derman
mufessel	1. mufessel kirin: veqetandin 2. Ayeta husnê mufessel ke: hûrûkûr bike, diyar bike
mufesser	ravekirî, diyarkirî
multemes	ya/yê tê xwestin, lê tê pirsîn
muna	daxwaz
muqessir	yê ko kêmasiyê/teqşîriyê dike
murde	mirî
murx	teyr
musella	sicadeya nimêjê
muşk	misk, bêhneka xweş e
muşkîneş	muşkîne: ya misk bi xwe da kiriye

	ş: yarê dinimîne (vedigere ser yarê)
muterra	şahîkirî, biriqandî; bêhna xweş pê da kirî
muwalî	arîkar, yawer
muxan	meyxane
muxbeçe	kurê pîrê muxan, sebîyê li meyxaneyê meyê digerîne
muxnî	sivikkirina »muxennî-yê«: stranbêj
muxremîn	muxrem: yê/ya pir ji kesekî/tiştêkî hez dike
mûkar	mikare, haceteka wek xencerê ye

N.

nabûd	nebûn
nadan	nezan, cahil
nadêritin	li nik wan nîne
nafe	1. kîsê miskê, 2. zik yan çermê zikê heywanan
nageh	ji nageh: ji nişka ve
nagehan	ji nişka ve
napedîd	nayête dîtin, veşartî
napuxte	negihîştî, nepijayî; nezan, cahil
nasufte	nekunkirî, formnegirtî
nazik weres	weres: ze'feran, safran
nazikqed	bejintenek, bejinzirav
necd	herêmek e li Se'ûdî Erebistanê
necm	steyr stêr
nedêrî	nîne, meke
nefx	pif, nefxa sûr: roja qiyametê, demê ko Israfil pif zirna xwe dike
neheng	timsah, şêrê behrê, mebest jê: belaya mezin
nehr	robar, çem
nemûd	diyar kir, xuya kir, xuya bû, ji »nemûden-ê«: xuyabûn, diyarkirin
nerd	zehr, lehîstoka tawleyê
nerx	biha, heq
neseq	cûre, wek, awa, nimûne, şekil
nesteren	nêrgiz
neşac	girî
neşwa	serxweş in
newa	deng, awaz, stran
newaziş	dilovanî, dilxweşkirin
newişt	nivîsî, li ser eniya ... nivîsî
nigar	neqş, wêne, heykelê bedewiyê, yar
nihen	ji »nihandin-ê«: danîn, lêxistin
niqab	serçavik, çarçeva rû, ya ko jin davêje ser rûyê xwe

nisab	tixûbê dana zekatê
nisar	şabaş: pereyên ko di şahî û dawetan de davêjin ser serê reqas û kesên di
nişab	tîr
nîmbismil	nîvserjêkirî
nucûm	necm: steyr, stêr
nuht	lê da, lê ket, kun kir
numa	diyar bû, xuya bû
numandin	diyar kirin, dan xuya kirin
numûçek	nimûne
nûbar	nûbare: berê nû, fêkiyê nû Kirî amancê nûbaran: tîran Xedengên qewsê nûbaran: nû
nûbî	xelqên Nûbeyê, herêmeka Misrê ye.
nûrefşan	ya/yê ronahiyê direşîne, belav dike

P.

payan	dawî
pend-i gîr	pend: şîret, gîr: bigire, bistîne
perdenişîn	kesê li pişt perdeyê rûniştî
pereng	bizotî
perêht	birasht, soht, şewitand
pergar	haceta resimandina daireyan
perixîn	ji »perixandin-ê«: herişandin
pertew	tîrên ronahiyê, ronahî
perwaz	perwaza teyran: fira teyran
Perwîn	yek ji heft keçên »Atlas« ko li gorî efsaneya yûnanî bûn heft stêr
Peşeng	navê şahekê faris yê kevin e
peygê	posteqî, namegêr
peykan	tîr; rim
peyrew	şagirt, şopgir, lidûvçuyî
peywend	girêdana xurt ya bi kesan an bi tiştan re
peyweste	bi dû hev, berdewam, bê rawestan
peyxam	nûçe, xeber; name; şîret
pêc	alandin, ji »pêcan-ê«: alandin, badan
pijmurde	xemgîn, dilşikestî, jar
pilox	piloxên agirî, pelên mezin yên agirî
pîrane	pîrane yim: em pîr in
pîşe	xweza, teb'
polad	pola, hesinê xwerû

putkede	xaniyê seneman; senemxane, putxane
Q.	
qasir	kêm, ne kamil, kesê bi kêmasî
qeba	qimaş; qemîs
qebes	1. pelek yê agirî; bizotî, 2. qebesîn: em distînin, digirin
qebo	dengê kewan
Qelzum	Deryayê Qulzum: Deryaya Sor
qereşî	ji 'eşîra qureyşîyan ya ko pêxember Mihemed jê ye
qerqef	meya ko lertzê diêxe laşê mirovî
qesaret	qesaret kir: kurt û paqij kir
qetre	dilop
qezeh	Qews û qezeh: keskesor
qidem	ji mêj ve, ezel, ji qidem: ji destpêkê ve
qinîn	pirejimara »qinîn-ê«: şûşeya cam
qiran	1. bi hev re, bi hevûdu ve girêdayî, du tîrên wek hev 2. benê ko du gayên cotî bi hevûdu ve girêdide 3. hemqiran: wekhev, hempa
qîşt	gulî; bisk
quyûd	pirejimara »qeyd-ê«: bend
R.	
ram	xweşî, aramî, kêfxweşî, kamiranî
rav	nêçîr
raz	1. sir, 2. rezê tirî
re'd	req-reqa taviyan, gurîniya ewran
re'na	re'n: bedew, nazik, spehî
rebab	enstrûmenteka muzîkê ye, wek kemençeyê ye
reftar	meş, çûn
rehguzer	duriyan, sêriyan, çariyan: cihê ko gelek rê lê digihîn ser hev
rehîq	meya herî xweş, xwerû, zelal
rehrew	rêwî, şagirt, mirîd
remed	nexweşiyeka çavan e, kulbûna çavan
rencûr	nexweş, xemgîn, bi azar
rewanbexş	Rûhê Qudus (Cebraîl)
rewneq	bedewî, spehîtayî
rikêbdar	yê bi rişma hespî digire, xulam
rimbaz	xweyê rimê
riştî	boyaxkirî
ruba	pirejimara »rebwe-yê«: evraz, berjor

rûd	enstrûmenteka muzîkê ye
rûxfener	rûgeş, rûvekirî: yê/ya ko rûyê wî/wê wekî çirayê geş e
S.	
sa'îd	dest (ji milan ta tiliyan)
sa'îqe	birûsk
salik	rêwî, mirîd, şagirt
Samir	Sihirbazekê hemdemê pêxember Mûsayî bû. Li gorî efsaneyê wî golikekê dipeyivî çêkir.
saqî	meygêr
saxer	cam, qedeh, kas
sayeban	sîwan , mebest: guliyên ko bûne wek sîwanê
sayeperwerde	têr, halxweş, bêxem; yê/ya li ber sihê xwedibûyî, betal
sebeq	ders
sebîl	rê
sebzîpûş	milyaket, cilkesk, pûşîkesk, mebest: zeriyan bedew û nazik
sehîqed	bejinrast
sekara	pirejimara »sekran-ê«: serxweş, mest
sekerat	keseên mirinê
sekran	serxweş, mest
seksirişt	kesê ko xoyê wî wekî yê san e
sela	xweragirtina li ber germa agirî
selab	selibandin, hilawistin
selek	dikeve ser rê, bi rê ve diçe
selem	pêşinat; destebe'î
selîb	xaç
selsebîl	zelal, xweş, mebest: ava xweş
sema	seh kirin, guhdarî kirin; stran; reqsa derwêşan; musîqa
semed	navekê Xwedê ye
semek	masî, mebest: binê deryayê ko masî tê de dijîn
semen	yasemîn; nefel
semensa	wek yasemînan, bedew, spehî
seng	ber, kevir
seqer	1. dogeh, cehnime, 2. navê çiyayekê nêzîkê Mekehê ye
serapa	1. ji serapa: ji serî ta pê, 2. serapa: bi giştî, hemî
sergerdan	matmayî, heyirî; yê ko dizivire
sergeşte	matmayî, heyirî, gêj
sermedî	ebedî, hermayî; nûra sermedî: ronahiya nemir, nûra ebedî
sermeşq	kopî ji bo nivîsînê, rêbazên destnivîsînê
serwiqed	bejinrast, bejna wek dara serwê

serwiseh	bi bejna xwe wek dara serwê
setwet	hêz, mezinahî, domînans
sewt	deng
seyqel	şahîk; haceta şahîkkirinê, zimpere
seyyad	nêçîrvan
sêgah	enstrûmenteka muzîkê ye
sêrab	têrav
sidre	texlîtek yê daran e, Sidre'ê munteha: navê dareka li biheştê ye
sikkîn	kêr
silkê	silik: ta, ben, têt
sipah	hêzeka leşkerî
sipahr	esman, felek, dinya
sirac	çira
sirayet	derbasbûn, ji sera: ji tiştê derbas dibe nik tiştêka dî
sirşirîn	bedew, spehî
siyahcerde	esmer
siyehyeng	siyeh: reş, yengî: tîr û kevanên Yengê
sîmab	zîbeq; rûşûştî, kîndar, di qesîdê de: rûşûştî, yê bê şerm û fihêt
sîmînber	singspî, ya ko sing û berê wê spî ne
sîqal	tiştê ko şahîk dîke
sîret	jiyanname
subbûhî	1. milyaketên ko pesnê Xwedê didin, 2. sifetek yê Xwedê
sudûr	pirejimara »sedr-ê«: sing, sîne
suftin	kunkirin
sulûk	bi rê ve çûn
sundus	dîbaceyê tenik, qimaşê bi zêrî xemilandî
surcemîl	bedew, spehî
surmedar	çavên kilkirî
surperî	horiya gelek spehî
surûd	stran, stran û reqs (bi hev re)
suxen	guftin, gotin, bêje
suxte	1. sohtî, yê/ya bi agirê dojhê şewitî, 2. şagirt (telebe)
suxtî	zehmetî
Ş.	
şadimanî	xweşî, kêfxweşî, kamiranî
şatir	jîr, zîrek, jêhatî
şebçirax	çiraya şevê
şebkagul	kagul: kakûl, gulî, pêşenîk, şebkagul: guliya wekî şevê
şebnem	avî, jale

şefeşse'd	şefeş: gizing, ronahî se'd: bextê baş, stêrka bextê baş şefeşse'dê: ya ko bextê wê wek ronahiya gizingê ye
şefqexûy	şefqe: dilovanî, merhemet xûy: teb', karakter şefqexûy: teb'ê dilovaniyê
şehkase	qedeha padişahan, qedeha mezin
şehle	çehvên şehle: çavên reş yên bi ser sore ve, nêrîna wan mirovî dixapîne
şehper	perê herî dirêj di baskan de
şekeramêz	şekeramêz e gulab: gulava bi şekirî
şekerbar	pir şîrîn, şekirî dibarîne
şekerrîz	pir şîrîn, şekirî direşîne
şekerxa	ya ko şekirî dixwe/dikirigîne
şekexende	kenşîrîn, şîrînkêlam, şîrîn
şeng	bedew, spehî
şeqa	bedbextî, belengazî, zehmetkêşî, hejarî
Şerha Lubabê	Şerha Lubaba el-Fadil el-Isferaînî li ser rêzimana erebiyê
şexef	hezkirina zêde
şezahu	şeza: bêhna xweş, şezahu: bêhna wî
şêwe	şêwe: adet, teb', hiner, şêwe numa: adeta xwe diyar kir
şigar	nêçîr; tiştê tê girtin/xwarin
şihab	zimanê agirî, stêrka agirî
şimşad	dara ko bejna wê rast e, metafor di şîrê de: yara bedew
şîrîndehen	devşîrîn
şîrînpuser	lawikên şîrîn/spehî
şox	bedew, spehî
şukoh	mezinahî; bi şukoh: bi mezinahî
şunqarê	baz, falkon
T.	
te'ne	kêmasî, qerf, te'ne da: qerf pê kir, kêmasî jê re dîtin
tebêt	tebat, sekn û qerar, aram
tebilxane	musîqaya cengê, musîqaya daholan tebilxaneyê şahî: musîqaya qraliyetê
tecella	tecella kir: xwe diyar kir
tehtezzu	diheje
tehwa	tu hez dikî; men tehwa: yê/ya ko tu jê hez dikî
telettuf	nazikî, dilovanî
telx	tehl, neşîrîn

telxîs	kurtî, bi kurtî
temîdu	ditewe, li ber bayê xwar dibe
teqdîs	mezinahî
terazin	darên tenûbê, wek serw û kajê ne
terwende	nûgihîşî, taze
tesamet	bilind bûn
tesella	tesella kirin: aram kirin, rehet kirin
teşne	têhn, tî
teşneleb	lêvên ko ji têhnan ziwa bûne
teteq	perde
tewwizandin	1. reşandin, 2. spehî kirin
teyxûn	dibe ko xerakirina »tûxan-ê« be, bazê padişahan
tîzirewan	lezok
totî	bexbexa, teyrê dipeyive, papaxan
tox	ala, nîşanên ji dûvê hespan hatîn çêkirin
turre	gulî
tuxra	imza padişahan, mora siltanan
tûtiya	dermanekê çavan e

U.

‘ubab	hemî ava deryayê, bi mebesta pîrbûnê. Dibe navê kitêba »El-'Ubab« ya El-Saxanî be.
‘ucac	li »‘ecacê« binêre
’uftadi	bû, çêbû, herikî, ket
’ulf	evîn, hezkirin
‘uqab	teyrekê baskdirêj e
‘urwet	qulpika pişkojê, destikê dewlê
‘Utarid	planeta Merkûry
‘uyûn(i)	çavên min
‘Uzza	navê senemek yê ereban yê berî islamê ye

V.

vbestin	girêdan, li xwe kirin, danîn
veresî	felitî, hatî berdan, benda te vebû
vewesta	rawestiya, sekinî, li se piyan ma

W.

wajigûn	vajî, ters, bi şûn de, bermeqlûb
wala	bilind, mezin
weh	1. wisa, wiha, 2. wax




wesl	gihan, gihana yarê û rûniştina pê re
weş	reşandin, avêtin; perweş: reşandina tîran
weşm	deq, nîşan
wifq	li wifqa : li gorî
wisaleş	wisaleş: gihana wî
wudû	destmêj girtin
wusqa	xurt
X.	
xasse	taybet
xatem	1. gustîlk, hingulîsk, 2. gustîlka Silêman pêxember
xawer	rojawa, di şîrê de: rojhilat
xebxeb	gelpik, goştê qirikê yê di bin erzinkê de
xeccilîn	me şerm kir, me fehêt kir
xecil	şermizar, fehêtkar
xecle	ji xecle: ji fedîya, ji şerma
xedeng	tîr
xenc	xwe delalî kirin, çav dan, salûsî
xennac	ya/yê xwe delalî dike, çavan dide
xerabat	meyxane
xerçeng	kêvjal, birca kêvjalî
xergeh	konê mezin, esman, hala li dora heyîvê
xexm	hêrs, xezeb, heqaret
xêlî	perda li ser rûyî
xiram	paye
xirbal	bêjing, moxil
xob	bedew, spehî, nazik, baş, xurt
xuld	bihişt, cennet
xulxul	şîrîn xulxul e: dengê kevokê çerxê xulxul e: qelebalix xulxule: qelebalixa heciyan ya li dora kevirê reş
xumar	serxweş, mest
xunçe	bişkoja gulê
xurem	cihê pir xweş
xurrem	kêfxweşî, şadimanî, kamiranî
xusse	kela girî û xemê ya dikeve qirikê, xem, derd
xwab	xew, razan
xwimarî	serxweş, mest
xwindkar	xunkar: imperetor
xwird	xwarin

Y.

yeksan	wekhev
yelmûm	çira
Yeng	navê bajarekî ye
yengî	kevanên Yengê
yeqeq	1. pir spî, 2. pembû
yol	rê
yox	nîne

Z.

zax	cûreyek kevokan e; qijik
zabad	miska ji kitika (pisîka) zabadê
zehr	jehr
zenexdan	erzink
zeng	1. perdeya zeng: zingar, 2. nûbî û zeng: reşik, zencî
zeqen	erzink
zerbaf	terizandî, qimaşê bi qeseb
zerfişan	yên zêr direşînin
zerkeş	zêrîn, xemilandî, bi zêrî xemilandî
zêrab	ava zêr
zêwer	zînetî ji berên giranbiha û zêr û zîvî
zimêhn	gum-gum, dengê xurt û bilind wek dengê topan
zinde	sax, nemirî
zindegî	jiyan
zinhar	ne we be, hay ji xwe hebe
zîba	bedew, spehî
zîwer	xeml, zînet
zucac	qizêz, cam
Zuhel	planeta Satûrnê
Zuhre	planeta Venûsê
zuhreçing	zuhreya reqisvanan
zumurrud	berê giranbiha, rengê wî kesk e





ديوان



دهزگای چاپ و بلاوکردنهوهی



زنجیرهی پوښبیری

*

خاوهنی ئیمتياز: شهوگهت شیخ به زدين

سهرنووسيار: به دران ته همد ههیب

ناونیشان: دهزگای چاپ و بلاوکردنهوهی ئاراس، شهقامی گولان، ههولیر



مه لایئ جزیری

دیوان



ترانسکرپسیۆن
عارف زیره قان





ناوی کتیب: دیوانی مه‌لایج جزیری
ترانسکریسییۆن: عارف زیڤه‌قان
بلاوکراوه‌ی ئاراس - ژماره: 580
ده‌هینانی هونه‌ریی ناوه‌وه و به‌رگ: نه‌فهل
سه‌رپه‌رشتیی چاپ: ئاوپه‌حمان حاجی مه‌حموود
چاپی یه‌که‌م، هه‌ولیر - 2007
له کتیبخانه‌ی گشتیی هه‌ولیر ژماره (497) ی سالی 2007 ی دراوه‌تی

هیچ که‌س به‌بی نوسراوی ره‌زامه‌ندی بۆی نییه
ئه‌م کتیبه دووباره چاپ بکاته‌وه یان کۆپی بکات
یان له مالپه‌ری ئه‌نته‌رنیته‌دا بلاوی بکاته‌وه.





(دیوان)ی مه لایئ جزیری

میری کرمانجیی مؤدیرن میر جه لادته ئالی به درخان سه بارهت به ته حمه دی خانی دهلی، تهو نه تنیا پیغه مبه ره، به لکو خاوهن کتیبیشه. پیغه مبه ری ئاینی نه ته وهیی و نه ژادیی کورده و خاوهنی کتیبیی (مه موزین)ه. تهوه په سه ندانیکیی به رزه و کورد (مه موزین) وهک قورئانیکیی کورده واری له ژیر سه ری خوئی داده نی.

(دیوان)ی مه لایئ جزیری (1570-1640) قورئانیکیی دیکه ی کوردانه، که پیش (مه موزین) نووسراوه. وهک میراتی ته ده بی کوردی ته گهر ئیمه (دیوان)ی مه لایئ جزیری له نیو لیتره توری کوردی لابه دین، یه کسه ر ده بینین که لاقه کانمان له هه وادا ده میننه وه و ههست به بوشاییه کی بی هاوتا ده که یین.

له بهرئه وهش به ئاسانی ده توانین بلیین که مه لایئ جزیریش پیغه مبه ره. پیغه مبه ری ته ده ب و هونه ری کوردی و له هه مان کاتدا خاوهن کتیبیشه. (دیوان)ی تهو قورئانیکیی ته ده بی و هونه رییه.

مه لایئ جزیری به نازناوی (مه لایئ جزیری) ده ناسری. ناوه ته سللیه که ی (ته حمه د)ه و وهک شیخ ته حمه دی جزیریش ناوده بری. پاشناوه که ی (جزیری) ههروهک شیوه زاری خه لکی شاری جزیری وهک (جزه ری) به کاری ده هینن و خه لکی بوتان پیی ده لئین (مه لایئ جزه ری). جه لادته ئالی به درخانیش له کو قاری (هاوار)دا پاشناوه که ی وهک (جزه ری) نووسیوه. بنه چه ی وشه ی (جزیره)ه. له بهر تهوه ته زیش ناوه که ی به مه لایئ جزیری ده نووسم.

مه لایئ جزیری له هه لبه سته کانیدا نازناوی (مه لا) به ته وانگه جیاوازه کانی و نازناوی (نیشانی)ی به کارهیناوه. له هه ندیک هه لبه سته کانیشیدا ناوه ته سللیه که ی خوئی (ته حمه د)ی به کارهیناوه.

به رهه می نیوداری مه لایئ جزیری (دیوان)ه، که بنچینه که ی له 114 هه لبه ست پیک دی. جگه له (دیوان) هه ندی هه لبه سته ی مه لایئ جزیری له گه ل (دیوان)دا بلاوکرانه ته وه. هه ق دوویژه که ی له گه ل فه قیی ته یران و له گه ل میری جزیری دوو هه لبه سته دریزن. هه لبه سته ی دیکه ی دریز که به دیری "ئه للاه سه حه رگه ها ته زه ل" ده ست پیی ده کا و چهند هه لبه سته ی دیکه له گه ل (دیوان)دا بلاوکرانه ته وه و وهکو به رهه مه کانی مه لایئ جزیری داده نرین.





ترانسكريبسيونى نوي

جەلادەت ئالى بەدرخان لەژمارە 35ى كۆقارى (ھاوار)دا بەشىكى (ديوان)ى مەلایى جىزىرى كە لەلایەن قەدرى جەمىل پاشاوە بەلاتىنى ئامادەكراوە، بۆلاوكردوووتەو، بەلام ئەو كارەى بەنيوچلى مایەو. ئىمە دەتوانىن بلىين تا ئىستا تەنيا جارىك (ديوان)ى مەلایى جىزىرى ھاتۆتە ترانسكريبەكردن بۆ ئەلفەباى كوردىي لاتىنى كە ئەویش لەلایەن محەمەد ئەمىن نارۆزى و زەينەلعبەدين كايا ئامادەكراوە و لە سالى 1987 لە ستۆكھۆلم بۆلاوكرایەو.

بەو ترانسكريبسيونە نوپىيە وىستم، ئەوئەندەى پىم دەكرى، بەھاوكارى مەلایە بۆتییەكان(مەلایەكانى خەلكى دەقەرى بۆتان) و كەسە عەرەبىزانەكان، ترانسكريبسيونىكى راست بە ئەلفەباى لاتىنى ئامادە بكەم بۆ ئەوئەى كاتىك خوينەران ھەلبەستەكانى مەلایى جىزىرى دەخويننەو راست تىي بگەن ياخود بەلای كەمەو راست بىخويننەو.

بۆ راست خويندەوئەى (ديوان)ى مەلایى جىزىرى قەناعەتەى لای من دروست بوو كە ئەو ئەلفەبا كوردىيانەى ئەمرو ھەن بەشى راست خويندەوئەى (ديوان) ناكەن. لەبەرئەوئەش من بىجگە لە پىتە ئاسايىيەكانى ئەلفەباى كوردى - لاتىنى ھەندىك پىتى ترانسكريبسيونى عەرەبىشەم بەكارھىناون. لەژىر ناوئىشانىكى سەربەخودا ئەز ھەندىك فراوانتر باسى كىشەكانى ئەلفەباى كوردى دەكەم. من مەتنى ئەو ترانسكريبسيونە نوپىيەى (ديوان)م لەسەر بنچىنەى نيوپروكى مەتنى شەرحى مەلا ئەحمەدى زفنگى موفتى قامشلو بنیات ناو. مەلا ئەحمەدى زفنگى سالى 1959 شەرحى (ديوان)ى بە دوو بەرگ ئامادەكرد و بۆلاوكردەو. كارى مەلا ئەحمەدى زفنگى لەسەر بنچىنەى كارىكى پىشووى مەلا عەبدولسەلام (ناجى)ى خەلكى جىزىرى بۆتان ئاواكراوە. تەنانەت ھەندىك كەس دەلین ئەسلى شەرحەكە ھى مەلا عەبدولسەلامە و دواتر مەلا ئەحمەدى زفنگى ئەوى بە ھەندىك گۆران و لى زيادكردنەو بەناوى خۆيەو چاپ كرددو.

جەلادەت ئالى بەدرخان سالى 1941 لە ژمارە 35ى كۆقارى (ھاوار)دا باسى دەستنووسەكانى مەلا عەبدولسەلام دەكا و دەلى:

"ئەو نووسىنەى لای منە مەلا عەبدولسەلام لە سالى 1322ى كۆچى نووسىووە. مەلا عەبدولسەلام جىزىرىيە و عالمەكى لى ھاتوو. مەلا عەبدولسەلام زۆر خەرىكى ديوانى مەلا بوو و زۆر نووسىنى لەسەر نووسىوون. دەلین كە عەبدولسەلام باش دەزانى مەلا راقە بكات، لەبەر ئەوئەو ئەو نووسىنانەى ئەو نووسىوونى زۆر بەنرخ و موختەبەرن."

مەلا عەبدولكەرىمى جىزىرى، كە ئىستا تەمەنى 76 سالە و لە جىزىرى دەژى، پىي گۆتم كاتى خۆى لە جىزىرى دوو كەس ھەبوون كە زۆرباش (ديوان)ى مەلایى جىزىرى





تی ده گه‌یشتن و شه‌رحیان ده‌کرد. یه‌ک له‌وان مه‌لا عه‌بدولسه‌لام بوو، ئه‌ویدیکه‌شیان مه‌لا مه‌حمودی، موفتی جزیری (مه‌حمود بلگه) بوو. مه‌لا عه‌بدولسه‌لام له‌ جزیری باری کرد و چوو‌ه بنخه‌تی (کوردستانی سووری) و دواتر له‌ قامشلۆ بووه مه‌لای مزگه‌وتی گه‌وره.

مه‌لا عه‌بدولسه‌لامی کورپی مه‌لا مراد، که به‌ ئه‌سل خه‌لکی گوندی ئه‌مارای سه‌ر به‌ میدیاده، له‌ جزیری نیشته‌جی بوو و له‌ مه‌دره‌سه‌ی سو‌ریش وان‌ه‌ی ده‌گوتنه‌وه. مه‌لا عه‌بدولسه‌لام نازناوی (ناجی) به‌کارده‌هیئا و وه‌ک عه‌بدولسه‌لامی ناجیش ده‌ناسرا. دوا‌ی چوونی بو‌ بنخه‌تی چه‌ند نوس‌خه‌ی (دیوان)ی نووس‌یوون و هه‌مووی شه‌رح کردوو‌ه.

کورپی مه‌لا عه‌بدولسه‌لامی زه‌ینه‌لعاب‌دین و عیزه‌دینی نه‌وه‌ی ده‌لین مه‌لا ئه‌حمه‌دی زفنگی ده‌ست‌نووسی شه‌رحی (دیوان) که مه‌لا عه‌بدولسه‌لام نووس‌یووی دوا‌ی مردنی ئه‌و له‌ (1952) نزیکه‌ی 7-8 مانگ برده‌لای خو‌ی بو‌ ئه‌وه‌ی ئاماده‌ی بکا و به‌ناوی ئه‌وه‌وه چاپ بکری. زفنگی نیازی وابوو سالی 1958 شه‌رحی (دیوان) به‌ناوی خو‌یه‌وه بلا‌وبکاته‌وه و باسی مه‌لا عه‌بدولسه‌لامیش نه‌ده‌کرد. دوا‌ی موداخه‌له‌ی زه‌ینه‌لعاب‌دین، زفنگی سالی‌ک بلا‌و‌کردنه‌وه‌که‌ی راگرت، به‌لام جاریکی دیکه‌ له‌ سالی 1959 دا شه‌رحی (دیوان)ی مه‌لای جزیری به‌ناوی خو‌یه‌وه بلا‌و‌کرده‌وه. زفنگی له‌ پێشه‌کیه‌که‌شیدا به‌ هیچ شی‌وه‌یه‌ک باسی مه‌لا عه‌بدولسه‌لام ناکات، به‌لام له‌ دیوانی کتیبه‌که‌دا ده‌لی که ئه‌و زۆر زه‌حمه‌تی به‌و شه‌رحه‌وه کیشاوه و هیچ که‌س پیش ئه‌و کاره‌ی نه‌کردوو‌ه. هه‌روه‌ها زفنگی ده‌لی مه‌لا عه‌بدولسه‌لام له‌ سه‌ره‌تای کاری ئه‌ودا بو‌ راست تیگه‌یشتنی ده‌سته‌واژه‌کانی ده‌قهری بو‌تان هاو‌کاری ئه‌وی کردوو‌ه، به‌لام به‌داخه‌وه پیش ئه‌وه‌ی زفنگی شه‌رحه‌که‌ ته‌واو بکات مه‌لا عه‌بدولسه‌لام مرد. هیچ به‌لگه‌یه‌ک نییه‌ که مه‌لا ئه‌حمه‌دی زفنگی پیش مه‌لا عه‌بدولسه‌لام ده‌ستی به‌ شه‌رحی (دیوان) کردبێ. ده‌ست‌نووسی مه‌لا عه‌بدولسه‌لام که ئه‌سه‌له‌که‌ی ئیستا لای عیزه‌دینی نه‌وه‌یه‌تی ئه‌وه ده‌سه‌لمینی که ئه‌و شه‌رحه‌که‌ی ته‌واو کردوو‌ه. وادیاره‌ که زفنگی ئاگاداری تیبینیه 18 سال پیشتری جه‌لاده‌ت ئالی به‌درخانیس نه‌بووه یاخود خو‌ی لی نه‌بان کردوو‌ه.

منیش ده‌ست‌نووسه‌که‌ی مه‌لا عه‌بدولسه‌لام که شه‌رحی (دیوان)ی مه‌لای جزیرییه بینیه‌وه. ده‌ست‌نووسی شه‌رحی مه‌لا عه‌بدولسه‌لام که مه‌لا ئه‌حمه‌د زفنگی چاپی کردوو‌ه ته‌واو وه‌ک یه‌ک نین. زفنگی فارسی نه‌ده‌زانی. له‌ راقه‌کردنی عه‌ره‌بیدا گو‌رین و لی زیاد‌کردنی کردوو‌ه و له‌رووی فۆرم و شی‌کردنه‌وه ته‌عدیلی تیدا‌کردوو‌ه. زفنگی به‌نیو‌نیشانی (تفصیل المعنی) واتای هه‌ندی‌ک له‌ به‌یته‌کانی به‌عه‌ره‌بی نووس‌یووه. هه‌رچه‌ند ئه‌و شه‌رحه‌ی که زفنگی ئاماده‌ی کردوو‌ه له‌سه‌ر ئه‌وه‌ی مه‌لا عه‌بدولسه‌لامیش بنیات نرابێ، سه‌ره‌رای ئه‌وه‌ش مرۆف ده‌توانی بلی ئه‌وه‌ی زفنگی





تا رادیهك بهرهمیکی جیاوازه، له بهر ئه وهی گۆرانکارییه کانی شهرحه که ی ئه وی له شهرحی مه لا عه بدولسه لام دوورخستۆ ته وهو سه ربه خۆییه کی نوێی پی داوه. هه مدیس نیوه پۆکی شهرحی مه لا ئه حمه دی زفنگی یانیش هی مه لا عه بدولسه لام وهك شهرحی هه ره راستی (دیوان) ی مه لایێ جزیری داده نری و مه لا ئه حمه دی زفنگی باسی (چاپی جزیری) ده کا که له بنچینه دا له 114 هه لبه ست و قه سیده یه کی بۆ زیاد کراو (یا رامیه قه لبی) پیک دیت. به وشیه یه دیاره که (دیوان) وهك کتیب له 114 هه لبه ست پیک دی، به لام دوا ی ئه وه هه ندیک هه لبه ستی دیکه ش له گه ل (دیوان) وهك پاشکۆ له گه لیدا بلا وکراونه ته وه.

من یه که مجار نیوه پۆکی (دیوان) م له ئه لفه با ی عه ره بیه وه ترانس کریبه کرد بۆ ئه لفه با ی لاتینی. پاشانیش من و سه لام نوعمان، مامۆستای زمانی عه ره بی، جارێکی دیکه پێیدا چووینه وه و راستمان کردوه. سالی 1998 ئه ز چوومه کوردستان و پرسیارم کرد کام مه لا هه یه که (دیوان) ی مه لایێ جزیری تی بگات و بزانی راست بیخوینیته وه.

دوا ی پرسیار کردنیکی زۆر مه لا عه بدولکه ریم جزیریم دۆزییه وه. ئه وه هه م فارسی ده زانی و هه میش عه ره بی و ئۆسمانیی ده زانی. مه لا عه بدولکه ریم ئیستا ته مه نی 76 ساله، شیخه کانی مالی شیخ سه یداش گوتیان که س له مه لا عه بدولکه ریم با شتر نازانی (دیوان) به دروستی تی بگات و بخوینیته وه.

ئه ز و مه لا عه بدولکه ریم ریک که وتین و پیم گوت ده بی هه موو (دیوان) به دهنگی بهرز بۆ من بخوینیته وه بۆ ئه وه ی ئه ز کۆنترۆل بکه م و بزانی ئایا من ئه وم به بی هه له کردووته لاتینی یان نا. مه لا عه بدولکه ریم نه خۆشیی چاویکی هه بوو و تازه له لای دکتۆر هاتبووه وه. من به شیکی (دیوان) م به ئه لفه با ی لاتینی بۆ ئه وه خوینده وه و لیم پرسی ئایا رای ئه وه چیه. ئه ویش له چاکه ی خۆی گوتی، تۆ زۆر راست ده یخوینیته وه له کاتی که دا زۆر مه لای کورد هه ن ناتوانن (دیوان) راست و دروست بخویننه وه.

وازم له خویندنه وه که ی خۆم هی نا و پیم گوت ئینجا نۆره ی ئه وه یه من ته نیا گو ی بده مه تۆ و ده بی تۆ بیخوینیته وه ئه زیش هه م دهنگت تۆ مار ده که م و هه میش له گه ل ئه وه دا ده قه لاتینییه که م کۆنترۆل ده که م. مه لا عه بدولکه ریم (دیوان) ی خوینده وه و منیش تۆ مارم کرد، تا وه کو هه موومان ته واو کرد.

مامۆستا مه لا عه بدولکه ریمی جزیری به خۆشیی فه قی مه لا محه ممه دی مو فتی پێشووی جزیری (مه حمود بلگه) یه. مه لا عه بدولکه ریم پێی گوتم که ئه سلێ (دیوان) له 114 هه لبه ست پیک دی و به پێی پیته کانی ئه لفه با ی عه ره بی ریزه ند (ته سنیفکرا) وه به (ی) ته واو ده بی.

مه لا عه بدولکه ریمی جزیری نه پتی ئه وه ریزه ند کردنه و 114 ژماره یی هه لبه سته کانی به (قورئان) وه به سته وهو گوتی مه لایێ جزیری ویستویه تی که ژماره ی





ههلبهسته کانی (دیوان) هیندهی ژمارهی سورهته کانی (قورئان) بی. (قورئان) یش له 114 سورهت پیک دی و (دیوان) یش له 114 ههلبهسته پیک دی. لهو چاپهی (دیوان) دا ئەز ته نیا 114 ههلبهسته که بلاوده که مه وه. له (دیوان) دا ههلبهسته بی نیونیشان و هه مووشیان به "وهله هو ئه یضه ن قودیسه سیروهو" یانیش به "وهقاله ئه یضه ن قودیسه سیروهو" دهست پی ده که ن. من دیری به که مم له هه ههلبهسته کانی هه لئار دو کردمه نیونیشان بویان.

رافه کردنی ئیزافه

مه لایه جزیری له (دیوان) دا بو کیش (وزن) ی (ئیزافه) ی به کارهیناوه و ئه ویش له ئه لفه بای عه ره بیدا نانووسری. (ئیزافه) به گوهری زمانی کوردی هه ندیک جار له جیاتی (ئیزافه) فه قه تانده ک و هه ندیک جاریش له جیگه ی ته وانگدا به کارهیندراوه. مه لایه کانی کورد کاتیک (دیوان) ده خویننه وه (ئیزافه) به پیی زمانی کوردی راست ده خویننه وه و ئه و کاته ی ئیزافه که (فه قه تانده ک) بی ده یکه نه (ئا) یان (ی) و کاتیک ته وانگیش بی ده یکه نه (ی) یان (ی).

راست ترانس کریب کردنی (ئیزافه) به لایه کی گه وره یه و له بهر ئه وه ی مه لایه جزیری له ژیا ندا نه ماوه و مرو ف هیچ کات ناتوانی سه ت له سه ت دلنیا بی که چون ئه و ئیزافه یه ترانس کریبه بکات. ئه گه ر زایه ندی (جنس) ناویک می بی ده بی (ئیزافه) که ی بیته (ئا) و ئه گه ر زایه ندی ناویک نیر بی ده بیته ئیزافه که ی بیته (ی). ئینجا هه ندیک ناو هه ن که کورد زایه ندی جیاواز بو ئه وان به کار دینن. مه لایه جزیری، بو تی بو و منیش زایه ندی ئه و ناوانه م به پیی شیوه زاری بو تانی حساب کردوه و ئیزافه کان و ته وانگه کانیشیانم به و شیوه یه نووسین. له و شوینانه ی (ئیزافه) ته نیا بو کیش به کارهینرابی و جیگری فه قه تانده ک یان ته وانگ بی من (ئیزافه) به (i) نووسیه و داشیک (به ندیک) م (-) له پیشه وه ی داناوه، له بهر ئه وه ی (ئیزافه) جیگه ی (i) ده گری. بو نمونه:

Ismê te ye mektûb-i di dîwanê qidem da

یانیش:

Lew selb-i kir jê ixtiyar

بۆچی به ئه لفه بای ترانس کریب سیۆن

ئه لفه بای کوردی لاتینی له 31 پیت پیک دی و له و خشته ی خواره ودا به رامبه ره کانیان به ئه لفه بای کوردی - عه ره بی نووسراون. ئه و پیته عه ره بیانه که له ئه لفه بای لاتینیشدا نین به پیتی ترانس کریب سیۆن نووسراون.





	kurdî	erebî		kurdî	erebî		kurdî	erebî
	a	ا		î	ى		s	س
	b	ب		j	ژ		ş	ش
	c	ج		k	ک		t	ت
	ç	چ		l	ل		u	و
	d	د		m	م		û	و
	e	ه		n	ن		v	ف
	ê	ئ		o	ۆ		w	و
	f	ف		p	پ		x	خ
	g	گ		q	ق		y	ى
	h	ه		r	ر		z	ز
	i	-						
	Ekstra							
	ء	ء						
	ş	ث		ş	ص		z	ظ
	h	ح		đ	ض		ء	ع
	ç	ذ		ţ	ط		x	غ

(دیوان) ی مه‌لایێ جزیری تا ئیستا به ئه‌لفه‌با و فه‌کیتی (برگه) راست نه‌نووسراوه‌ته‌وه و ئه‌و ئه‌لفه‌بایانه‌ی که کورد به‌کاریان ده‌هێنن به‌شی راست نووسینی (دیوان) ناکه‌ن. ئه‌لفه‌بای عه‌ره‌بی کیشه‌ی زۆر گه‌وره له فه‌کیتدا (برگه‌کردن) دروست ده‌کا و هیه‌چ جارێک رینادات که مروف کوردی به‌گویره‌ی بنه‌ما ریزمانیه‌کانی کوردی راست بنووسی. به ئه‌لفه‌بای عه‌ره‌بی کار(فرمان)، ئاوه‌لئاو و ئامرازه‌کانی کوردی راست نانوسرین و ئه‌وه‌ش سه‌قه‌تییه‌کی زۆر گه‌وره‌یه. زۆر ده‌نگی جیاواز له ئه‌لفه‌بای عه‌ره‌بیدا نینه یانیش دوو-سی ده‌نگ به یه‌ک پیت ده‌نووسرین. نه‌بوونی گرده‌ک و هورده‌که‌کان (کاپیتهل و سمۆل) واده‌کات که مروف به ئه‌لفه‌بای عه‌ره‌بی یان کوردی- عه‌ره‌بی نه‌توانی ناوه تایبه‌ته‌کان و ناوی جیگه و ولاته‌کان له وشه ئاساییه‌کان جیاکاته‌وه له‌به‌ر ئه‌وه‌ی هه‌ردووکیان وه‌کو یه‌ک ده‌نووسرین. بۆ نمونه ئه‌گه‌ر بنووسین (ئه‌و ئازاده) ئایا ئیمه چون ده‌زانین که مه‌به‌ستمان که‌سیکه که ناوی ئازاده یانیش مه‌به‌ستمان که‌سیکه که ئه‌و به‌خۆی (ئازاده)، واته سه‌ربه‌سته. بۆ ده‌ستنی‌شانکردنی کیشه‌ی فه‌کیت لێرده‌ا ته‌نیا هه‌ندیک نمونه ده‌هێنمه‌وه. ئه‌ز





پیش هه موو شتیك به پیی فه کیتی (تقطیع) لاتینی راست دهیاننوسم و پاشان جاریکی
دیکه به ئەلفه‌بای لاتینی، به لام به پیی فه کیتی عه‌ره‌بی دهیاننوسم:

نمونه‌ی یه‌که‌م:

فه کیتی راست به پیی ئەلفه‌بای لاتینی:

Ṭor im bi dil û peyrewê Mûsa yim ez
Ateşperes û nûra tecella yim ez

فه کیتی هه‌له به پیی ئەلفه‌بای عه‌ره‌بی:

ṭorim bidil û peyrewê mûsayim ez
ateş peres û nûra tecellayim ez

نمونه‌ی دووهم:

فه کیتی راست به پیی ئەلفه‌بای لاتینی:

Îd e û herkes ji dîdara te lê pîroz e îd
Ez tinê mehrûmê dîdar im bi şed menzil be îd

فه کیتی هه‌له به پیی ئەلفه‌بای عه‌ره‌بی:

îde û herkes jidîdarate lê pîroze îd
eztinê mehrûmê dîdarim bişed menzil be îd

له زمانى كوردیدا دهسته‌واژه‌ی (طۆرم)، (بدل) و (موسایم) نییه و فه کیتی ئەلفه‌بای
عه‌ره‌بی ئەو دهسته‌واژانه له كوردیدا به‌شـیـوهـیهـك چـیـ ده‌كا و كه هیچ بنچینه‌ی
ریژمانیی نییه. دهسته‌واژه‌ی (ئاته‌ش په‌ره‌س) ئاو‌ه‌ل‌ناوه و پیوسته پیکه‌وه بنووسریت،
به‌لام ئەلفه‌بای عه‌ره‌بی ئەوی کردووته ناویك و ئاو‌ه‌ل‌ناو، واته دوو برگه و لی‌ره‌دا
به‌پیی واتای خۆی نییه.

له نمونه‌ی دووهمدا (ji dîdara te) به‌پیی فه کیتی عه‌ره‌بی بووته (jidîdarate)
و ئیدی مرووف نازانی ئامراز چیییه، کار (فرمان) چیییه و جیناو چیییه. هه‌رسیکیان
پیکه‌وه بوونه‌ته یه‌ك و دهسته‌واژه‌یه‌ك كه هیچ واتایه‌کی نییه.

له ئەلفه‌بای عه‌ره‌بییدا 12 پیتی کوردییی (ç, e, ê, g, î, j, o, p, u, û, v) نین.
واته سی له سه‌تای ده‌نگه کوردیییه‌کان به ئەلفه‌بای عه‌ره‌بی ئاساییدا ناتوانری





بنووسریڻ. فارسه کان هندیك پیتیان بۆ نووسینی زمانی خوڤان له ئه لفه بای عه ره بی زیاد کردوون که دیسان ئه وانیش به شی کوردی ناکه ن.

له باشوور و روژه لاتی کوردستان کورد ئه لفه بای عه ره بی ده ستکاری کراویان ئاماده کردوو، به لام له ئه لفه بای کوردی-عه ره بیدا شه ش پیتی عه ره بی (ث، ذ، ص، ض، ط، ظ) نینه له بهر ئه وه مروّف ناتوانی (دیوان) ته نیا به ئه لفه بای کوردی-عه ره بیش بنووسیته وه. کیشه ی هه ره گه وه ی ئه لفه بای کوردی-عه ره بی ئه وه یه که پیتی (i) تیدا نییه و ههروه ها له ئه لفه بای کوردی-عه ره بیدا سی پیتی کوردی (u, ũ, w) به یه ک پیتی عه ره بی ده نووسریڻ. واته به (و) ده نووسریڻ، دوو پیتی دیکه ش (î, y) به یه ک پیتی عه ره بی ده نووسریڻ واته به (ی).

مروّف ناتوانی کوردی به فه کیتی راست، به ئه لفه بای کوردی-عه ره بی بنووسی، له بهر ئه وه ی ئه لفه بای عه ره بی یان کوردی-عه ره بی ری ناداته مروّف که ده سته واژه کان به پیی بنه ماکانی ریژمانی کوردی بر گه بکات.

له وانه ی له بهر ده سستی ئیمه دان ئه لفه بای کوردی-لاتینی ئه لفه بای هه ره دروست و ته واوه بۆ زمانی کوردی. به لام له بهر ئه وه ی له (دیوان) دا زور وشه ی عه ره بی به کاره یندراون و ئه و وشانه پیوسته به پیی فۆنه تیک و ده نگانی زمانی عه ره بی بنووسریڻ، ئه و کاتیش پیوستیمان به هندیك پیتی عه ره بیش هه یه و ئیمه ده توانین ئه و پیتانه به پیته لاتینییه ترانس کریپسیۆنه کان بنووسین. پیته ترانس کریپسیۆنه کانیش به دانانی هندیك نیشانه له ژیره وه ی هندیك پیتی لاتینی ئاسایی چی ده بن.

ئینجا ئه گه ر ئیمه (دیوان) به ئه لفه بای کوردی-لاتینی و به هاو کاریی ئه و پیته ترانس کریپسیۆنه بنووسین، ئه و کات هه م ده توانین هه موو ده نگه کانی ئه لفه بای کوردی و هه موو ده نگه کانی ئه لفه بای عه ره بی راست بنووسین و هه میش ده توانین فه کیتی راست به کارینین و ده سته واژه راسته کان له یه ک جیا یان پیکه وه بنووسین. لی ره دا ئامانجی من ئه وه نییه که ئیمه هندیك پیتی نوی له ئه لفه بای کوردی لاتینی زیاد بکه یین و بیکه یه ستانداردیک. ئه ز ئه و به کاره ی نانه ته نیا بۆ راست کردنه وه ی کلاسیکه کوردییه کان به پیوست ده زانم.

ستۆکھۆلم 15 ی گولانی 2007



عارف زیره قان

